
# Albert Camus

# BIYANÎ



NÛDEM



Pirtûka **Biyanî** li dora ramana absurdê digere. Ew beşê pêşî ji dîtinên **Albert Camus** li ser mirov û li ser bêmaneyiya dunyayê bi gewde dike. Qehremanê pirtûkê, bêyî ku bizanibe, jiyaneke bêmane dijî. Lê rojekê, gava pirsa "çima?" ji xwe dipirse, ew bi rastiya vê bêmaneyiyê jî dihese. Bersiva vê pirsê rastiyeke mezin di rûyê wî de vedike û wilo jî valahiyeke mezin di nava wî de peyda dibe. Lê ev mirovê han ji qedera xwe nareve û bi ser de jî ew bêtir ji jiyana pûç hez dike. Ji ber ku ew bi ser rastiya tiştan ve dibe, ew dibe mirovekî biyanî. Di mala xwe de, di bajarê xwe de ew xwe kesekî biyanî û bêpêwendî dibîne.

Weşanxaneya me vê romana ku beşê wê yê pêşî di kovara **NÛDEM**ê de hatibû weşandin, bi serbilindî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

**Albert Camus**

# BIYANÎ

**Weşanên NÛDEM**

**Albert Camus**

# BIYANÎ

**Roman**

Wergera ji firansî: **Dr. Fawaz Husên**

**Weşanên NÛDEM**

Weşanên NÛDEM: 13
Biyanî
Navê orjînal: L'Etranger
Çapa Yekem: Stockholm 1995

© Editions Gallimard, 1942
© Wergera kurdî: Weşanên NÛDEM 1995
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Magritte
ISBN: 91 88592-13 8

Mafê vê wergera kurdî ji aliyê Weşanên Nûdemê ve ji Weşanxaneya Gallimardê hatiye kirîn.

Ev werger bi destûra weşanxaneya Gallimardê hatiye çapkirin

# Albert Camus
## (1913-1960)

Camus demeke kurt li ser rûyê erdê dijî. Lê di vê jiyana kurt de, ew pirsên herî girîng û serekîn li ser meneya mirov û çîhanê ji xwe dike. Di çarçefa van pirsên giring û jiyana xwe ya zehmet de, Camus berhemên xwe ava dike û nêrînên xwe bi nav dike.

Albert Camus li Cezayirê li bajarê Modoviyê li herêma Konstantînê ji diya xwe dibe. Bavê wî di sala 1914an de dimire û Albert biçûkaniyeke pir perîşan li taxeke zîvar û gelêrî ji taxên serbajarê Cezayirê bi diya xwe re derbas dike. Di şanzdehsaliya xwe de ew bi nexweşiya jana zirav dikeve. Lê li gel zîvarî û nexweşiyê ew xwendina xwe ya navîn û paşê jî ya bilind bi serbilindî derbas dike. Camus dixwaze bijî, bizanibe ka doza mirov di cîhanê de çi ye, çi giring e, çi pûç û bêmene ye. Hemû şêweyên hizrê bala wî dikişînin û ew dikeve nava jiyana rewşenbîrî, bi karê şanoyê radibe, dest bi rojnamevaniyê dike, dibe endamê partiya komnîst û ji bo azadbûyîna gelê musilman xebatê dike. Camus piştî salên xizaniyê bi taya jiyanê dikeve û dixwaze zincîra zîvarî û neçariyê bişikîne, dilê xwe bide ber roka havînê û pêlên perava deryayê û xweşiyê. Ew ê derengtir bêje ku ew gotina azadiyê ne ji Marks hîn bûye lê ji tengasiyên jiyana xwe. Di van salên pêşîn de ew *Rû û Pişt* (1937) û *Şadiyên Zewacê* (1938) dinivîsîne. Piştî zarotîtiyeke zehmet, ew bi van herdu pirtûkan evîna xwe ji jiyanê re diyar dike.

Gava Cenga Duwemîn dest pê dike, Camus dixwaze şer bike, bibe leşker, lê ji ber nexweşiya wî, daxwaza wî bi cîh nabe. Di sala 1940î de, ew Cezayirê û Afrîqa Bakur li dû xwe dihêle û berê xwe dide Parîsê.

Albert Camus her gav li ser zehmetiyên jiyanê dirame, bi dirêjayî difikire. Li Parîsa şikestî, ew aloziyên serdemeke pir têkel û dijwar dibîne. Wilo jî, nêrînên wî li ser pûçiya jiyanê hin bi hin xurtir dibin û ciyekî mezin di nav ramanên wî ên felsefî de digirin. Ew di Parîsa bindest de bi valabûna jiyanê dihese û *Biyanî* dinivîse. Fikira vê romanê bi xwe ji mêj ve di serê wî de ye; Camus ji sala 1937an de dixwaze tiştekî wilo binivîse. Li Parîsa di bin destê faşîstên Hitler de, ev pirtûk di sala 1940î de bi gewde dibe û di 1942an de çap dibe. Camus esseyekê bi navê Afsaneya Sisyphe bi vê pirtûkê re çap dike, weke ku dixwaze ku ew tiştekî bi tiştekî din bide rohnak û xuyakirin. Ew paşê du şanoyan: *Şaştêgihaştin* (1944) û *Caligula* (1945) dinivîsîne. Hemû berhemên vê demê li dora mîlê pûçiyê digerin.

Piştî pûçiyê rêyeke din li ber Camus vedibe û tevger û berxwedana mirovan di rûyê aloziyên jiyanê de meneke din di serê wî de distînin. Camus di nav jiyana xwe ya rewşenbîrî de rê dide serdemeke nû : serdema mirovê ku serê xwe bilind dike. Ew anuha dibîne ku giring e ku mirov meneyekê bidin hebûna xwe li ser rûyê erdê. Mirov gerek destên xwe bidin hev û di rûyê napakiyê de rawestin. Di rûyê bêdengiya Xwedê û dunyayê de, qehrmanên pirtûka *Weba* (1957) di rûyê rencê û bayê hovitiyê de xwe dikin yek û dawiya dawîn bi ser dikevin. Camus pesnê berxwedanê, tevgera civakî di Mirovê serîhilda (1951) de jî dide.

Lê pêwendiyên di navbera mirovan de herdem pewendiyine zehmet in, Camus di vê yekê de xweş digihêje û pê dêşe. Rewşenbîr nikare bi jiyanê re bingehên danûstandinên xurt saz bike. Hîsa gunehkarî û naçariyê roj bi roj mezintir dibe. Hunermend dunya dora xwe fêm nake û bêgav dibe bar bike, bide ser rêya surguna hundirînî. Camus di sala 1957an de Xelata Nobelê li Stockholmê digire û di gotara xwe de dîsa li ser pirsa şaşîtiyê, li ser surgun û tenhayiya mirovê rewşenbîr diaxife. Ew nivîsên xwe li ser Cezayirê di *Nûçeyên Teze* de berhev dike lê ev pirtûk gelekî deng nade û di

nav sersariya mirovan de zû tê ji bîr kirin. Camus xwe ji bo romaneke nû amede dike dema trumbêla wî ji ser rêya xwe derdikeve, dide ser rêya mirinê. Gelo ev rêya nû bi dilê Camus ye? Bersiva vê pirsê zehmet e ji ber ku Camus gelekî di nivîsên xwe de behsa pûçiya dunyayê dike û pesnê xwekuştinê dide. Ew bi dirêjayî li ser vê pirsê ramiyaye, nexasim di *Efsaneya Sisyphe* de, di xuşka cêwî ya pirtûka *Biyanî* de. Camus di sala 1960î de di çel û heftsaliya xwe de mîna çirakê vedimire.

Mirov dikare anuha ji xwe bipirse çima ev pirtûka biçûk wiqasî deng da û bi sed caran hat çap kirin û wergerandin? Bêtirî pêncî salî piştî derketina wê li weşanxaneya Gallimardê, ev pirtûka hêna bala rewşenbîr û hemû xwendevanan bi xurtî dikişîne û hêna tê wergerandin. Çima? Çi di vê pirtûkê de heye ta ku ew bibe berhemek di nav bernameyên xwendegehên biçûk û bilind de? Çima ew bûye berhemeke cihanî, geytî? Bersiv bêguman e dirêj be lê mirov dikare bi kurtî bibêje ku berdewama vê pirtûkê bêguman bi hunermendiya Camus û bi nêrînên wî li ser pirsa pûçiyê girêdayî ye. Her yek jî dikare rojekê ji rojan xwe di Meursault de bibîne. Her yek ji me dibe ku rojekê xwe biyanî di nav kesên biyanî de û di çîhaneke biyanî de bibîne. Kî dizane, belkî her yek ji me gelek caran di temenê xwe de wek Meursault dixwaze xwe di nava “Sersariya dilovan ya çîhanê de” ji bîr bike.

**Dr. Fawaz Husên**

Ez vê wergerê diyarî Hêwa M. û Hesenê Metê dikim.

*Fawaz Husên*

# Beşê Yekê

## I

Îro dayê mir. Belkî jî do bû. Ez nizanim. Ji mala pîran ji min re telegrafek hat: "Dayikê wefat kiriye. Veşartin sibe ye. Silavên bijartî". Maneya vê yekê tune. Ew belkî do bû.

Mala pîran li Marengoyê ye, heyştê kîlomitrî dûrî serbajarê Cezayirê ye. Ez ê saet dudyan li otobusê siwar bim û piştî nîvro bigihêm wê. Ez ê wilo jî bikaribim li ber laşê diya xwe şevê bimînim û sibehê êvarê vegerim malê. Min du rojên bêkarî ji xwedanê karê xwe xwestin û ji ber behaneyek wilo mezin wî nikarîbû bigota na lêbelê ew ne bikêf xuyabû. Min jê re jî got: "Ev ne sucê min e." Wî dengê xwe nekir. Ez piştre fikirîm ku ne gerek bû ku min ew yek di rûyê wî de bigota. Lê bi çend gotinên kurt, ne li min bû min bexşîn û buhurîn jê bixwestana. Gerek wî ji ber xwe ve di ber dilê min de bida, bigota bera serê te sax be. Lê bêguman ew ê van tiştan dusibe ji min re bêje dema ê bi çavên serê xwe bibîne ku ez şîniyê dikişînim. Anuha mirov dikare hinekî bêje wek ku dayê hêna ne mirî ye. Piştî veşartina wê, ev yek bi giştî ê bê guhertin. Mirina dayê wek serhatiyekê ê ciyê xwe bigire û her tişt ê têkeve qalikekî bêtir resmî û bi rêk û pêk.

Ez saet duduyan li otobûsê siwar bûm. Dunya gelekî germ bû. Min li aşxanê li bal Céleste wek her carê fravîna xwe xwar. Li wê derê hemû li ber min diketin, dilê xwe bi min şewitandin û Céleste ji min re got: "Deh diyên mirov tunene, tenê yek heye". Dema ez rabûm ser xwe herim, ew hemû bi min re ta ber devê derî hatin. Min xwe hinekî gêj kiribû û gerek ez hilkişyama bal Emmanuel û

min ê grafêtek reş û bazûbenda şîniyê ji wî deyn bikirana. Apê wî berî çend mehan miribû.

Ta ku otobûs li min neçûya, min ta îstegeha wê bazda. Bêguman ji ber vê bezê û bi ser de jî ji ber hejandina otobûsê li ser rê, bêhna benzînê û şewqa li ser rê û li asmanan, ez xulmaş bûm û nêzîkî hemû dirêjayiya rê ez razam. Dema min çavên xwe vekirin, min dît ku ez bi ser xwe de li kêleka leşkerekî hatibûm guvaştin. Yê leşker bi min re keniya û ji min pirsî ka ez ji dûr ve dihatim. Min got "erê" ta ku min rê ji axiftinê re vekirî nehişta.

Mala pîran du kîlomitran ji gund dûr e. Min da ser rê û ez peya çûmê. Dema ez gihaştim wê derê min seraser xwest diya xwe bidîta. Lêbelê yê dergevan ji min re got ku pêşî gerek min serdebîr ango berpirsiyarê navendê bidîta. Ew wê gavê ne vala bû û min hinekî xwe li hêviya wî ragirt. Dergevan di wê wextê gişî de devê xwe vekir û nema girt û di serê min de kir pitepit û piştre min serdebîr dît. Ew li nivîsgeha xwe hat pêşiya min. Ew kalekî hûrik e bi Nîşana Civaka şerefî ye. Wî bi çavên xwe ên zelal li min nêrî. Piştre wî destê min di nav destê xwe de demeke dirêj hişt û guvaşt û min nema dizanîbû çawa ew ji nav destê wî bikişanda. Wî li dossiereke, li kirasekî kaxez û belgehan mêze kir û ji min re got:"Ev heyê sê sal ku xanima Meursault ketiye vê derê. Ji te pêve tu negehdar û tu piştine din ji wê re tunebûn". Min bawer kir ku wî bi wan gotinan gazina tiştinan ji min dikir û min dest pê kir jê re rave û rohnak kir lê wî gotina min birrî û got: "Lawê min ê delal, ne giring e tu ji min re bibêjî çima. Min dossiera diya te xwend. Te nikarîbû ew xwedî bikira. Ji wê re nexweşnêrek, hemşîreyek divat û tu bi xwe tu perên wilo pir nastînî ta te ev yek bikira. Paşê, eger bê ya dawî, çawa be ew li vê derê bêtir bikêf bû. Min ji wî re got: "Erê ezbenî". Wî gotina xwe bêtir ajot: "Tu dizanî, ew li vê derê ne bê heval bû, ez dixwazim bêjim hevalên di salên wê de. Wê dikarîbû bi wan re li ser gelek tiştan li hev bikira, li ser tiştine ji çax û demine din. Tu genc î û ew bi te re bêguman aciz û dilteng dibû."

Ew yek rast bû. Dema dayê bi min re li malê dijiya, wê tiştek nedikir hema bi çavên xwe bi bêdengî ez bi kuderê diçûm dida dû min. Dema ew ket mala pîran, di rojên pêşîn de ew gelek caran digiriya. Lêbelê ew tenê ji ber xwîbûyînê digiriya, tenê ji ber ku ew hêna hînî wê derê nebûbû. Piştî çend mehan, eger ew ji mala pîran bihata derxistin, ew ê dîsa bigiriya, herdem ji ber adetê, ji ber xwîbûyînê. Hinekî ji ber vî tiştî jî di sala dawîn de pir kêm caran nigên min bi wê derê ketin. Ji ber xwîbûyînê û ji ber tiştekî din jî ez pir kêm çûm wê derê. Erê, her ku ez diçûm dîtina wê hemû yekşema min li erdê diket.- ez hesab nakim ew zora ku min li xwe dikir diçûm ta otobûsê, bilêtên ku min dikirîn û ew herdu saetên xwe ku min bi rê winda dikirin.

Yê serdebîr hinekî din bi min re deng kir lê ji sedî min carekê li wî guhdarî dikir an nedikir. Wî piştre ji min re got: "Ez guman dikim tu dixwazî diya xwe bibînî." Bê ku min tiştek bigota ez rabûm ser xwe û wî li pêşiya min berê xwe da derî. Wî Li ser pêlikan ji min re rave kir: "Ta em li kal û pîrên din kêr nekin û wan netirsînin, me diya te biriye oda me ya biçûk ya ji bo cendekan. Her cara ku yek ji nav wan li bal me dimire, ên din du an sê rojan bêhnteng dimînin. Ev tiştê hanê karûbarên me zehmet dike." Em di hewşekê re derbas bûn û li wê derê pir kal û pîr hebûn. Komek biçûk li vir, komek biçûk li wir, ew kal û pîr li hev civiya bûn û wan bêhedan dikirin pitepit. Dema em di ber wan re dibuhurîn, wan nema dengê xwe kirin. Lêbelê hema me pişta xwe dida wan, wê birrebirrê dîsa dest pê dikir, li ber guhên min dibû wekte qajiqajek zîzbûyî ya refêk tûtûyên mê. Li ber devê deriyê avahiyekê, berpirsiyar dev ji min qeriya: "Axayê Meursault, ez te tenê li vê derê dihêlim. Ez li nivîsgeha xwe ji bo hemû daxwaziyên te amede me. Di saet dehan de me biryara binaxkirinê daniye. Me ji xwe re got ku wilo jî tê bikaribî şevê gişî li ber serê rehmetiyê şevînî bibî. Ha! Ta ez xwe ji bîr nekim: xuya ye diya te gelek caran ji hevalên xwe re diyar kiriye ku wê dixwest li gora dîn û ola me bê veşartin. Min rabûna bi vî karî avêt ser milên

xwe, lê dixwest vê agahiyê bigihînime te ta hayê te jê hebe." Min jê re got mala wî ava. Lêbelê dayê di saxiya xwe de bê ku inkara hebûna Xwedê bikira tu carî bîra ol û mezheban nebiribû.

Ez derbas bûm. Ew odeke pir rohnî bû, bi kilsê spîkirî bû û bi camekê rapêçandî bû. Ew bi sendeliyan û bi hespikine textînî di şiklê tîpa X de hatibû raxistin. Du ji wan hespikan di navenda odê de bûn û tabûtek devnuxumandî li ser wan bû. Depên tabûtê bi boyaxa qalikê gwîzan hatibû rengkirin û tiştê ji wan depan dihat xuyakirin tenê ew mîxên pêç ên pir hindik çûbûn xwarê dihatin xuya kirin, dibiriqandin û awirên mirov dikişandin. Nexweşnêrek ereb li ber tabûtê bû, berdilkek spî lê bû û destmalek bi rengekî xurt li dora serê wê girêdayî bû.

Dergevan di wê gavê de di paş min re buhurî hundirê odê. Wî bêguman bazdabû. Devê wî hinekî ket hev û got: "Devê tabûtê hatiyê girtin, lê gerek ez wê ji bo te vekim ta ku tu bikaribî wê bibînî." Ew nêzîkî tabûtê dibû dema min bi wî girt. Wî ji min pirsî: "Ma tu naxwazî?" Min vegerand û got: "Na". Ew di ciyê xwe de ma û ez aciz bûm ji ber ku min dizanîbû ku gerek min ew yek negota. Piştî bêhnikekê, wî li min nêrî û ji min pirsî: "çima?" lê wî gazin bi wê pirsê ji min nedikir û tenê dixwest bizanîbûya çima min nedixwest". Min got: "Ez nizanim." Wilo jî, wî simbêlên xwe ên spî li hev badan û bêyî ku li min bineriya got: "Ez têdigihêjim." Min bala xwe dayê ku çavên wî xweşik bûn, rengê wan şînekî vekirî bû û pûsta rûyê wî hinekî sorik bû. Wî sendeliyek ber bi min ve dirêj kir û ew bi xwe hinekî ji min bi paş ve rûnişt. Ya nexweşnêr rabû ser xwe û berê xwe da derî. Wê xwest derketa û di wê gavê de dergevan ji min re got: " Ew kurmanxwarî ye." Ez tênegihîştim wî çi dixwest bigota û wilo jî min li hemşîreyê nêrî. Min dît ku wê paçek li dora serê xwe di bin çavên xwe re girêdabû. Paç li rasta bêvilê pehn bû. Di wî rûyê hanê de tenê paçik spî dikir.

Dema ew derket, dergevan axifî: "Ez ê te bi tenê bihêlim." Ez nizanim min çi kir lê ew li paş min şipya ma û hebûyîna wî wilo li pişt

min bi min ne xweş bû. Ronahiya xweşik ya dawiya rojê derbasî hundir dibû û li her derên odê belav dibû. Du mozqirtan, du mozên sor li hember camê dikirin vinevin û hayê min jê hebû ku xewê zora min dibir û dida ser çavên min. Min ji yê dergevan pirsî bêyî ku min xwe bi aliyê wî de bizîviranda: "Ma tu ji zû de li vê derê yî?" Wî bersiva min di cî de da û got: "pênc sal"- weke ku wî hemû temenê xwe derbas kirbû tenê li hêviya min û vê pirsê mabû.

Paşê wî di serê min de kir pitepit, got, çi ye ne çi ye ku eger berê rojekê jê re bihata gotin ku dawî emir ew ê bibûya dergevanê wargeha Morengoyê, ew ê beheti bimaya. Ew şêst û çar salî bû û ji Parîsê bû. Di wê navê de, min gotina wî birrî: " Ha, naxwe tu ne ji vê derê yî?" lê piştî pirsê hat bîra min ku berî ku wî ez bibirama bal berpirsiyar, ew ji min re li ser diya min axifîbû. Wî ji min re gotibû ku ji ber germa li ser vê erda rast û nemaze li vê navçeya hanê, gerek ew deqe berî deqê bihata veşartin. Wî hingê ji min re gotibû ku ew li Parîsê jiyabû û ku wî dikir nedikir ew ji bîra wî nediçû. Li Parîsê, mirov dikarin sê rojan û carinan jî çar rojan li ber laşê yê mirî bimînin. Li vê derê, wextê mirovan ji bo tiştekî wilo tune û hema têdigihêjin ku laşek li ser erdê dirêjkirî ye, ew gerek li dû navgîna darbendan ber bi goristanê bazdin. Jina wî jê re gotibû: "Huş be, mirov tiştên wilo ji Mêrik re nabêje." Dema mirovê kal ji min re behsa vê yekê kiribû wî şerm kiribû, rûyê wî sor bûbû û buhurîn û bexşîn ji min xwestibû. Min wê gavê dengê xwe kiribû û jê re gotibû: "Na, ez tika dikim, tiştê rast rast e û ne gerek e tu bexşînê ji min bixwazî". Min didît ku tiştên wî digotin di ciyê xwe de û balkêş bûn.

Di oda biçûk ya cendekan de wî ji min re rave û rohnak kir ku ji ber naçarî û destengiyê, ew ketibû wê wargeha pîran. Lêbelê ji ber ku wî xwe li ser xwe didît, wî xwe pêşkêş kiribû û xwestibû ciyê dergevanê wargehê bigirta. Min ji wî re got ku çawa bûya ew jî yekî wek wan pîrên hanê bû. Wî ji min re got naxêr ne rast e. Wî berê bala min kişandibû çawa behsa nişênên mala pîran dikir; wî ew bi

nav nedikirin û tenê digot: "wan", "yên din", û pir kêm caran digot " yên pîr", tevî ku hin ji nav wan bi salên xwe ji wî ne mezintir bûn. Lêbelê tişt helbet ji hev cihê bûn: ew dergevan bû û bi hawakî mafê wî hebû xwe di ser serê wan re bidîta û emir li wan bikira.

Nexweşnêra goyinger di wê gavê de buhurî hundir. Êvar ji nişkê ve ketibû û şevreşê xwe li ser wan caman perixandibû. Dergevan destikê eketrîkê bada û ronahî bi wê yekê pijiqî û çavên min kwîr kir. Wî destê xwe ji bo şîvê ji min re ber bi sifrexanê ve kir lê ez ne birçî bûm. Ji ber ku dilê min nediçû xwarinê wî xwest ji min re qehwak bi şîr bianiya. Ez bi xwe gelekî ji qehwa bi şîr hez dikim û min pêşniyariya wî pejirand û got erê. Ew piştî demekê bi berkêşokekê vegeriya. Min qehweşîra xwe vexwar û bi vexwarina wê re dilê min bijiya kişandina cixarekê. Ez dudilîbûm, dilekî min got çima na û dilekî min got na nabe, nabe ez li ber dayê vî tiştî bikim. Ez ramiyam û min ev tişt yekcar bêmane dît. Min cixarek dirêjî dergevan jî kir û me herduyan cixarên xwe kişandin.

Wî paşê ji min re got: "Hevalên Xanima diya te wê bên ew jî li ber serê wê şevê bimînin. Ev tişt li vê derê adet e. Gerek ez rabim herim sendeliyan bînim û qehwa reş amede bikim. şewqa xurt li ser dîwarên spî ez diwestandim û min ji wî pirsî ka wî dikarîbû yek ji wan lempan vemiranda. Wî li min vegerand ku ew yek yekcar ne mumkin bû. Lempe wilo hatibûn kişandin, an giş bi hev re pêdiketin, an jî giş bi hev re vemirî diman. Min nema pir guh li dergevan kir. Ew çû û dema vegeriya wî dest pê kir sendelî rêz kirin. Li ser sendeliyekê ji nav wan sendeliyan, wî fincanên qehwê li kêleka cizwa ser eletrîkê danîn ser hev. Piştre ew li hember min li aliyê din yê dayê rûnişt. Nexweşnêra goyinger jî di zikê odê de rûniştibû û pişta xwe dabû me. Min nedidît wê çi dikir lêbelê ji livandina bend û pazûyên destên wê, min dikarîbû bigota ku wê bi sîxên tentenan tiştek dihûna. Dunya hênik û xweş bû, qehwê canê min germ kir û di deriyê vekirî re bêhna şevê û bêhna gulan dihatin. Ez bawer im ez hinekî xulmaş bûm.

Ez li ser dengekî sivik wek dengê kirasekî ku bilive hişiyar bûm. Min çavên xwe girtibûn û wilo jî gava min ew vekirin, ew ode ji min re spîtir hat xuyakirin. Li ber min, siyek çi ye ji bo dermanan jî peyda nedibû. Her tişt, her kûşe, her derên kec wiqas bi diqet xuyakirin ku wan awirên mirovan dibirrîn. Di eynî wê gavê de hevalên dayê derbas bûn. Ew bi giştî deh kesek hebûn û di nava ronahiya awirbirr de bêdeng buhurîn. Ew rûniştin bê ku wan qirçîniyeke çi ye ji sendeliyekê bianîna. Min ew didîtin wek ku ew cara pêşîn bû di temenê min de min bi çavên serê xwe kes didîtin. Tiştekî biçûk çi ye ne ji rû ne ji kirasên wan ji min nefilitî lê dengên wan yekcarî nedigaştin guhên min û min nizanîbû çawa min ê ji çavên xwe bawer bikira ku ew kes bi rastî hebûn, li wê derê li hember min rûniştî bûn. Piraniya pir ya jinên pîr bi pêşmalik bûn û benê ku wan pîrejinan li nava xwe gerandibûn bêtir zikên wan yê tilêrî dida xuyakirin. Berê, wê ziktilêriyê tu carî bala min nekişandibû û min nizanîbû ku zikê jinên pîr wiqasî mezin dibû. Kalên li wê derê piraniya wan î pir hizhizî bûn û bi gopalan dimeşiyan. Tiştê ku di rûyên wan de pir bala min kişand ew bû ku min ji binî ve çavên wan nedidît û di nava hêlînek qermîçok de, min tenê rohniyek pîsik didît. Dema ew rûniştin, piraniya wan li min nêrîn û bi acizbûnekê serên xwe hejandin. Lêvên wan di korta devên bêdiran de çûbûn xwarê û ez tênegihîştim çima wan wilo serê xwe ji min re hejandin, gelo wan silav li min dikirin an jî serên wan ji ber xwe, ji ber pîrbûyînê bêyî dilên wan dihejiyan. Ez bêtir bawer dikim ku wan silav li min dikirin. Di wê gavê de min bala xwe dayê ku ew hemû li hember min li hawîrdora dergevên rûniştibûn û serê xwe hêdîka dihejandin. Di kêlîkekê de, tiştekî seyr, tiştekî nediket aqilan ket serê min: ew pîr û kal di dadigehekê de li min civiya bûn ta hukmek di derheqa min de bibirrîna.

Hinekî derengtir, ji nav wan pîrejinan yekê dest bi girî kir. Ew di rêza duduyan de bû û ji ber hevaleke wê min xweş ew nedidît. Wê di ber xwe de bêwestan bi dengekî nizim dikir hîskehîsk. Min ba-

wer kir ku wê tu carî nema dev ji wî giriyê xwe berda. Pîr û kalên din li wir bûn wek ku wan dengê wê nedibihîstin. Ew jihevketî, rûtirş, bêdeng bûn. Wan li tabûtê, li gopalên xwe, li çi bûya dinêrîn. Pîrejin di ber xwe de digiriya û ez gelekî mat bûm ji ber ku min ew nas nedikir. Min dixwest bes dengê wê bibihîsta lêbelê min ceger nedikir ew tişt jê re bigota. Dergevan xwe bi aliyê wê xwar kir, bi wê re peyivî, lê wê serê xwe bi neyî hejand, tiştek di ber xwe de got û giriyê xwe bi wê berdewamiyê dirêj kir. Dergevan xwe nêzîkî min kir û li kêleka min rûnişt. Piştî demeke baş dirêj, wî bê ku li min bineriya ew yek ji min re rave kir: "Di navbera wê û Xanima diya te de pêwendiyeke pir xurt hebû. Ew dibêje ku ji bilî diya te tu hevalên wê li vê derê tunebûn û anuha jî tu kesî wê nemaye."

Em demeke dirêj wilo man. Axîn û giriyê wê pîrejinê hin bi hin kêm bûn. Wê bi difna xwe pir dikir finefin û dawiya dawî ew temirî. Xewa min nema dihat lê ez westiya bûm û êş ketibû pişta min. Anuha bêdengiya wan mirovan bi min pir naxwoş bû û bêhna min teng dikir. Car carna, tenê dengekî taybetî dihat guhê min û pêşî min nizanîbû ew yê çi bû. Dawî min têderxist ku hinekan ji nav wan pîr û kalan goştê gepên xwe dimijandin û bi wê mijandinê wan ew mirçemirça naxwoş û seyr derdixistin. Wan wiqasî xwe di nav hizr û ramanên xwe de winda kiribûn ku hayê wan ji wan û ji wê mirçemirçê tunebûn. Di wê navberê de gumanek di serê min de bi gewde bû û min bawer kir ku ew miriya li wê derê ramidandî di çavên wan kesan de tiştekî bêrûmet bû. Lê anuha ez bawer im ku ez şaş bûm.

Dergevan qehwe li me gerand û me gişa qehwa xwe vexwar. Paşê ez nema dizanim çawa şev derbas bû. Tê bîra min ku di demekê de min çavên xwe vekirin û min dît ku hemû kal û pîr di xew re çûbûn û bi ser hev de ketibûn. Tenê yekî ji wan kalan çena xwe danî ser destên xwe ên bi darê gopal girtibûn û wî hema ziq li min dinêrî, wek ku ew tenê li hêviya min bû ku ez ji xewê rabûma. Paşê ez dîsa razam. Êşa pişta min xurtir dibû û ez ji ber wê ji xew rabûm. Rona-

hiya rojê derbas bûbû û di ser caman re dişemiti. Hinekî paşê, kalek hişyar bû û gelekî kuxiya. Wî di desmalek damikî de tif dikir û her ku ew dikuxuya te digot perçak ji kezeba wî bi wê kuxukê re derdiket. Wî pîr û kalên din ji xew rakirin û dergevan ji wan re got gerek bû ew rabûna ser xwe û derketana. şevek bi wê zehmetiyê rûyê wan gişan bi rengê xweliyê seyinandibû. Dema ew derketin, wan gişan destên xwe dane min. Vê yekê hişt ez gelekî ecêbmayî bibûma. Di wê şevê gişî de me gotinek çi ye ji hev re negotibû lê wê şevê te digot belkî bêtir me nêzîkî hev kiribû û pêwendiyên di navbera me de xurtir kiribûn.

Ez westiyabûm û yê dergevan min bir bal xwe û li wê derê min hinekî serçavê xwe şûşt û çek-mekên xwe rast kirin. Min dîsa qehwa bi şîr vexwar û ew gelekî xweş bû. Dema ez derketim roj bi giştî derketibû û ber bi zikê asmanan ve bilind dibû. Di ser girên di navbera Marengo û deryayê de, sorayiyê xwe li asmanan pêçandibû û bayê ku di ser wan giran re dihat bêhna xwê bi xwe re dianî. Bêguman rojeke xweş dest pê dikir û min ji mêj ve li dervî bajêr, di nava gund û erdan de xwe nedîtibû. Min dizanîbû kêfa min ê çiqasî mezin bûya eger ez ji xwe re bi kêfa serê xwe li wan deran bigeriyama, eger ne ji ber dayê bûya.

Ez ji xwe re negeriyam û di hewşê de, di bin darek çînarê de, bendewar mam. Min sînga xwe tije bêhna axa hênik dikir û xewa min nema dihat. Kesên bi min re kar dikirin wê gavê hatin bîra min. Ew di wê saetê de ji xew radibûn diçûn kar û ji bo min di rojê gişî de ew saet ya herî zehmet bû. Ez hinekî din bi van tiştan daketim, lê zingilekî di nav xaniyan de lêdixist û dengê wî zingilî bala min ji cî bir. Li paş penceran xirecirekê dest pê kir lê piştî demeke kurt dîsa her tişt bêdeng bû. Roka rojê hinekî din ber bi zikê asmanan hilkişiyabû û dest pê kir bi tîna xwe nigên min germ dikir. Dergevan di hewşê re buhurî û ji min re got ku serdebîr li min digeriya. Ez çûm nivîsgeha wî û li wê derê wî çend kaxezên resmî bi min da imzekirin. Min bala xwe dayê ku wî bi ser şerwalekî xetxetî çekên

reş li xwe kiribûn. Wî rahişt destikê telefonê û bi hişkayî ji min re got: "Ev heye demeke ku karkerên kefenkirin û veşartinê amede ne. Ez ê ji wan bixwazim ku bên devê tabûtê bigirin. Tu dixwazî ji bo cara dawîn berî girtina tabûtê li diya xwe binêrî?" Min got na. Wî di telefonê de dengê xwe nizim kir û bi fermandarî got: " Figeaç, ji zilaman re bêje ku ew dikarin dest pê bikin".

Paşê wî ji min re got ku ew ê hazirî veşartinê bibûya û min jê re got mala wî ava. Ew li paş nivîsgeha xwe rûnişt û wî çîmên xwe yên kinik avêtin ser hev. Wî got ku ji bo binaxkirinê ez û wî em ê bi tenê bûna, tev li nexweşnêra newbedar. Ew bi xwe nedibû ku rûniştevanên mala pîran hazir bibûna. Wî tenê destûr dida û dihişt ku şeva dawî ew li ber laşê yê mirî şevînî bibûna. Wî ev yek ji min re rave kir û got: "Ev pirs pirseke mirovantiyê ye". Lêbelê, vê carê, tenê vê carê, wî hiştibû ku hevalekî kevn yê dayê bi navê xwe Thomasê Pérez tev li kesên li dû cenazê bibûya. Serdebîr li vê derê hinekî di ber xwe de keniya û berdomand:" Ev hîsa hanê wek tu dibînî bi xwe hinek zaroktî tê de heye. Lê Pérez û diya te, bêje hema tu carî ji hev qut nedibûn. Li vê derê her kesî ji xwe re bi henekî ji Pérez re digot: "Ev dergîstiya te ye" û Pérez bi vê yekê hema dikeniya. Vî tiştî dilê wan xweş dikir û bi rastî jî mirina Xanima Meursault gelekî lê kêr kiriye. Wî xwest bi me re bê û min giring nedît ku min daxwaziya wî bavêta. Lê li gor şîreta textorê ku tê dîtina xanînişînên me min nehişt ku do ew jî beşdarî şevîniya li ber laş bibûya".

Wexteke baş dirêj di wê navberê de buhurî bêyî ku deng ji yekî ji me herduyan derketa. Serdebîr paşê rabû ser xwe û di pencereya nivîsgeha xwe re nêrî û got: "Va ye keşê Marengoyê. Ew berî wextê hatiye." Wî xwest ku hayê min jê hebûya ku bi kêmanî sê çarîk meş li pêşiya me hebûn ta me xwe peya bigihanda dêra di gund de. Em daketin. Keşe bi du zarokên sirûdxwendeyên dêrê li ber avahiyê bû. Bixurdan di destê yekî ji wan zarokan de bû û keşe xwe daqûl kiribû dirêjbûna zincîra zîvînî dûzan dikir. Dema em gihaştin ber wan, keşe rabû ser xwe. Wî got " Lawê min " û çend gotin ji min re ki-

rin. Piştre ew buhurî hundir û min da dû.

Min seraser dît ku mîxpêçên tabûtê di depên wê de çûbûn xwarê û çar mirovên bi çekên reş di hundirê odê de bûn. Di eynî vê gavê de dengê serdebîr gihaşt guhê min û wî ji min re got ku ereba darbendkêşê li ser rê li bendî me bû û wilo jî keşe dest bi xwendina xwe kir. Ji vê gavê û vir de, tiştan bi lez dan dû hev û derbas bûn. Her çar mirovan rahiştin çerşefekê û ber bi tabûtê çûn. Keşe, herdu berdestên wî, serdebîr û ez jî em derketin. Jinek li ber devê derî bû. Min ew nas nedikir. Serdebîr ez bi wê dam nas kirin û got: "Ev e axayê Meursault". Wî navê wê jî ji min re got lê ew nav negihaşt guhên min, tenê min nas kir ku ew jina hanê nexweşnêra nemayende, hemşîreya çavdêr bû. Bê rûkenî wê bi serê xwe silav li min kir û rûyê xwe yê dirêjokî û giş hestî ber bi jêr ve xwar kir. Paşê me gişa xwe da alî û me ji bo derbasbûna laş rê vekir. Me da dû wan çar kesên tabût hilgirtibûn û em ji seraya pîran derketin. Ereba tabûtkêş li ber devê derî rawestiya bû. Ew lekkirî, dirêjokî û şewqdar bû û wê bi şikilê xwe qelemdanik anî bîra min. Berpirsiyarê kefenkirin û veşartinê li kêleka wê bû. Ew qamqutikî bû û kenê mirovan bi çekên wî dihat. Miroveki kal jî bi tevgerine ne xwezayî li kêlekê bû û min nas kir ku ew Pérez bû. Wî kumekî ji kulavê nerm, kumekî girover bi hawîdorên pehn xistibû serê xwe (Wî ew ji serê xwe kir dema tabût ji derî derket). Wî taximek li xwe kiribû û şerwalê wî yê pir dirêj li ser solên wî xwe li hev badida û glofîtik çê dikirin. Girêka qirika wî ji caweki reş bû û ew girêk gelekî biçûk bû li gor gerdena mezin ya gumlikê spî. Lêvên wî di bin pozek tije pitikên reş de dilerziyan. Du guhên biecêb di nav porê wî yê spî û nermokî de dadilqiyan û kerînokên wan ne lihevhatî bûn. Guhên wî wek xwînê sor bûn û wan guhan di wî rûyê zuha de gelekî bala min kişandin. Berpirsiyarê kefenkirin û binaxkirinê ciyê her yekî nîşanî me da. Keşe li pêşiyê û li dû wî ereba tabûtkêş. Li kêleka erebê, ew çar barhilgirên hanê. Li paş erebê, ez û serdebîr û li dawiya me gişan, nexweşnêra çavdêr û axayê Pérez.

Rok baş hilkişiyabû û asmanê sinciri anuha hemû giranî û wexma xwe bi ser rûyê erdê berdida. Germa rojê hema xurt dibû û ez nizanim çima em wiqasî man berî me bida ser rê. Min di nav wan çekên reşî tarî de pir germ bû. Kalê hûrik yê serê xwe nuxumandibû dîsa kumê xwe ji serê xwe kir. Ez hinekî bi aliyê wî mirovî de zîvirîbûm û min lê mêze dikir, gava serdebîr ji min re behsa wî kir. Wî got ku gelek caran ew û diya min êvaran bi hev re derdiketin û bêyî ku nexweşnêrek ji wan qut biba an dûr biketa ew ta wî gundî ji xwe re dimeşiyan. Min li der û dorên gund temaşe kir. Ez anuha di diya xwe de digihêjim, dizanim çima êvaran wê ji vê deverê hez dikir. Di nav van darên serûyê ên rêzên xwe rast dikirin û dûr diçûn, digihaştin wan tepên ber perên asmanan diçûn, li ser vê axa narincî û kesk, di nav van xanîyên hindik ên bi zanebûn wilo xweşik hatibûn sazkirin, erê çima na, ez dizanim çima dayê ji vê derê hez dikir. Piştî agirê rojê, êvar li vê navçeyê diket û bêguman ew wek navberek ji aşîtiyeke xemgîn bû, ew wek îstegehek ji xweşiyê bû. Îro, di qiçîna nava rojê de, pêtên rencawer ji jor dibariyan û dihiştin ku tiştan li ber çavên min leylan bidana. Pêtên şewatê hawîrdor dikirin dojeheke ku debara tu kesî tê de nedibû.

Em ji ciyê xwe liviyan û me da ser rê. Di wê gavê de, min têderxist ku Pérez hinekî dikuliya. Erebe hin bi hin bi pele û zûtir diçû û wê dihişt ku zora Pérezê pîr jî biçûya û ew li paş me bima. Yek ji wan çar barhilgêrên ku dabûn tengala erbanê jî li paş ket û anuha ew di rêza min de dimeşiya. Rok gelekî bi lez ber bi zikê asmanan hildikişiya û wê zûbûnê hişt ez ecêb mayî bûbûma. Min bala xwe dayê ku êdî ji mêj ve hawîrdora me tije vinevin û zimezima zindewar û kêzikan û dengê xişexişa gîha bû. Xwêdan di ser rûçikên min re dihate xwarê. Ez serqot bûm û min destmalka xwe ji xwe re kir wek baweşinkê û min ba li xwe dikir. Karkerê kefenkirin û veşartina miriyan yê ku li paş hevalê xwe mabû û ketibû rêza min ji min re di wê kêlîkê de tiştek got, lê dengê wî xweş negihaşt guhên min. Di eynî wextê de, wî bi destê çepê qehfê serê xwe bi destmalekê zuha

dikir û destê wî yê rastê bi pêşiya kum digirt ew bilind dikir. Min jê pirsî: "Te çi got?" Wî gotina xwe du gîsin kir û li asmanan nêrî: "Agir dibare". Min got: "erê". Piştî demeke kin wî pirsî: "Ev ya di vir de diya te ye?" Min car din got: "Erê". "Ew pîr bû?". Min vegerand: "Hinekî". Min wilo vegerand ji ber ku min temenê diya xwe yê rastî nizanîbû. Paşê, wî nema dengê xwe kir. Ez li paş xwe zîvirîm û min li Pérezê kal nêrî û dît ku ew nêzîkî pêncî şêst gavî li paş me mabû. Wî dilezand û kumê xwe di destê xwe de bi vî alî û bi wî alî dikir. Min li serdebîr jî nêrî. Ew bi gelek meznayî û giranî dimeşiya û livandineke çiye ne di ciyê xwe de jê çênedibû. Çend dilopên xwêdanê li ser eniya wî dibiriqîn lê wî ew zuha nedikirin.

Ji min re xuya dibû ku koçê dest pê kiribû hinekî bêtir bi lez dimeşiya. Di nav wan gundan de, li wê hawîrdorê, tîna rokê xwe berdabû her derê, ji her qulê dipijiqî û ji ber şewqa gelekî xurt debara mirovan nedibû. Li ser wê rêya ku ber bi gund ve diçû perçak ji nû ve hatibû qîr kirin. Solên nigên me di qîrê de diçûn xwarê û şûna xwe di laşê şewqdar de çêdikirin. Kumê erbaneçî yê ji çermê ku di nav avê de hatibû kelandin li jora erebê xuya dikir û te digot ew kum ne di nav avê de lê di nav wê heriya reş ya rê de hatibû kelandin. Min xwe ji bîr kiribû ji aliyekî di nava wî asmanê şîn û spî de û ji aliyê din di nav hevtayiya rengê reş de: reşê qîra mezeloqî ya ku bi nigan radibû, reşê tarî û vemirî yê kincan û reşê şewqdar yê erebê. Ji ber rokê, bêhna çerm û rêxa dewarên ku erebe dikişandin, bêhna cîla û bixûrê, dijwariya şevek bê xew dunya li ber çavên min dilerziya fikar di serê min de tevlihev dibûn. Min dîsa li paş xwe nêrî û Pérez ji min ve pir dûr xuya kir, ew di nav ewrekî mezin î germê de winda bûbû û paşê min nema ew dît. Min çavên xwe lê gerandin û dît ku ew ji ser rê derketibû û dabû nav erdan. Rê jî li wê derê xwe li xwe dipêçand û ez têgihiştim ku Pérezê ku xweş ew der nas dikir, dizanîbû çawa rêya xwe kurt bikira. Piştî wê deverê Pérez dîsa tev li me bû. Paşê, me car din ew winda kir. Ew gelek caran bi wî awayî ji ser rê derket û wî da nav erdan û ez pê dihesiyam ku xwîna min ber

bi serên min hildikişiya û di cênîkên min de lêdida.

Paşê, tiştan bi lezek mezin, bi zanebûn, bi duzan û bi xwezayî dan dû hev. Ji wan gişan tenê tiştek tê bîra min: li serê gund, nexweşnêra çavdêr bi min re axifî. Dengê wê dengekî taybetî, dilneşîn û lerzdar bû û wî dengî bi xwe ji binî ve bi wî rûyê zuha û giş hestî li hev nedikir. Wê ji min re got: "Mirov nizane çi bike çi neke. Eger em bi bêhna fireh herin heye ku tîna rokê li me bide û me bişewitîne. Eger em gelekî bilezînin, ji xwe em ê di nav xwêdanê de bifetisin û di hundirê dêrê de, taya sar û germ wê me bigire". Gotina wê di ciyê xwe de bû û bi rastî tu çare li ber me tunebûn. Ji vê roja hanê, çend sûretine din jî di serê min de man, wek nimûne, ez dikarim bibêjim rûyê Pérez wextê cara dawî li serê gund ew tev li me bû. Hêsirine mezin ji bêhntengiyê û ji şewata nava wî li ser rûçikên wî digeriyan. Ji ber pirbûna qermîçokan ew hêsir nedihatin xwarê û wan xwe radixistin, xwe tev li hev dikirin û lekek ji avê li ser rûyê jihevketî çêdikirin. Sûretin din tên bîra min: dêr û gundiyên li ser kêlekên cadê, gulên sor ên şemedanî li ser tirbên goristanê, Pérez gava ji ser hişê xwe çû (dema ew li ser axê gevizî te digot ew bûkeke sisto-fisto ji textikan bû), axa di rengê xwîna sor de ya ku di ser tabûta dayê re digindirî û laşê spî yê kok û rehên dar û gihayên tev li wê axê dibûn, hin kesên din, deng, gund, ew wexta ku li ber devê çayxanê ez li bendî otobusê mam, guregura bêwestan ya motor û kêfxweşiya min dema otobûsê wek çûkekî xwe berda hêlîna ronahiyên serbajarê Cezayirê. Û tê bîra min jî min di serê xwe de ji xwe re got ku min ê di nav nivînan de xwe dirêj bikira û ez ê duwanzdeh saetan ser hev razama.

## II

Gava ez ji xewê şiyar bûm, ez têgihiştim çima xwedanê karê min bêkêf xuya kir dema min du rojên bêkarî jê xwestin: ma ne îro bi xwe şemî ye. Min bîra vê yekê nebiribû, lê gava ez şîyar bûm, ev fi-

kira han hate serê min. Xwedanê karê min helbet wilo bawer kir ku min ê tev yekşema xwe çar roj bistandana û vî tiştî nikarîbû kêfa wî bianiya. Lê ji aliyekî, sûc ne sûcê min bû eger diya min di şûna îro de do înê hat veşartin û ji aliyekî din, min ê her şemî û yekşema xwe bistanda. Lêbelê dîsa jî vî tiştî nehişt ku ez xwedanê karê xwe fêm nekim.

Ez ji ber roja buhurî gelekî westiyabûm û wilo jî ez bi zehmetî ji nav ciyan rabûm. Min riya xwe kur dikir û ji ber ku min nizanîbû min ê çi bikira min biryar da herim ji xwe re têkevim avê. Ez li tramwayê siwar bûm, ber bi bingeha avjeniya benderê çûm û li devera ku derya teng dibû, min xwe di avê de kir. Gelek kes hebûn û di avê de min car din Marie Cardona dît. Wê berê li ser mekîna nivîsandinê li ciyê karê min kar dikir. Dilê min wê çaxê bijiya bû wê û di baweriya min de yê wê jî dixwest, lêbelê ew pir nema û piştî çûyîna wê me wext nedît. Wê dixwest hilkişiya ser lastîka pufdayî û min alî wê kir û bi wê yekê, min destê xwe li çiçikên wê xistin. Wê xwe bi ser dev li ser lastîka pufdayî dirêj kiribû û ez hêna di nav avê de bûm gava wê berê xwe ber bi min ve kir. Porê wê ketibû nav çavê wê û ew dikeniya. Min xwe çeng kir ser lastîka pufdayî û ez li kêleka wê rûniştim. Dunya xweş bû û, wek bi henekî, min serê xwe bi paş ve xwar kir û danî ser zikê wê. Wê dengê xwe nekir û ez jî wilo mam. Asman bi hemû ferehiya xwe hatibû ber çavên min û ew asmanekî şin û zêrîn bû. Di bin paşhustuyê min de hinava Marie hêdîka lêdida. Nîv di xew de û nîv heşyar, em demek dirêj li ser doşeka pufdayî man. Dema tava rokê pir xurt bû, Marie xwe berda nav avê û min da dû. Min ew zeft kir, destê xwe li navtenga wê gerand û me bi hev re wilo ajne kir. Marie hema dikeniya. Li qiraxa avê me xwe zuha dikir dema wê ji min re got: "Biner, ez ji te reştir im". Min jê xwest ku êvarê em bi hev re herin sînemê. Wê dixwest biçûya filmekî ku Fernadêl tê de dilîst. Dema me cilên xwe li xwe kirin, ew gelekî behetî ma dema çav li gerafêta reş ket û wê ji min pirsî ka min şînî dikişand. Min jê re got ku diya min miribû. Wê xwest bi-

zanîbûya ew ji kengî ve miribû û min lê vegerand "ji do ve", ew hinekî vekişiya, lê dîsa tiştek neda ber rûyê min. Ez hatim jê re bibêjim ku ne sûcê min bû, lê ez fikirîm min ev tişt berê ji xwedanê karê xwe re gotibû û min dengê xwe nekir. Lê eger suc sucê min bûya an na ev yek tiştekî bêmane bû, ji ber ku çawa be, mirov herdem hinekî sucdar e.

Êvarê, Marie hertişt ji bîr kiribû. Kenê mirov car carna bi film dihat lê ew bi rastî filmekî ji bo zarokan bû. Min ranê xwe bi ranê wê kiribû û bi çiçikên wê dilîst. Hindik ji filim re mabû tev bibûya gava min ew maç kir, lêbelê ne bi awakî xweşik. Piştî ku em derketin, ew hat bal min malê.

Dema ez ji xew rabûm Marie çû bû. Wê berê ji min re rave kiribû ku gerek biçûya mala met an xaltîka xwe. Min ji xwe re got roj yekşem bû û ez aciz bûm ji ber ku ez ji yekşeman hez nakim. Wilo jî min xwe di nav ciyên xwe de qulipand û ez li bêhna xwê geriyam, ew bêhna ku porê Marie di balîfa dirêj de hiştibû û ta saet deh ez razam. Paşê ez ji xew rabûm û ta nîvê rojê ez wilo di nav ciyan de mam û min cixare kişandin. Min nedixwest biçûma bal Céleste û wek her carê fravîna xwe li wê derê bixwara. Min dizanîbû ku bêguman pirs ê ji min bihatana kirin û ez ji vî tiştî hez nakim. Min çend hêk ji xwe re çêkirin û min bê nan di miqilkê de xwar. Nanê min nema bû û ji min nedihat daketama.

Piştî fravînê ez bi dilekî teng di apartimanê de çûm û hatim. Dema dayê li bal min bû ew apartiman baş bû lê anuha ew ji bo min pir mezin e. Ji ber vê yekê jî min masa xwarinê ji oda nanxwarinê guhest oda razanê. Di vê odê de, di nava sendeliyên ku pûşê wan hinekî çûye xwarê, dolaba bi neynika zerbûyî, masa serçav şûştinê û textê ji misê, ez tenê dijîm û hemû tiştên din berdayî û bêxwedî mane. Hinekî derengtir, ta min tiştek bikira, ez rabûm û min rahişt rojnameyek kevn û min ew xwend. Min rêklamek ji bo xwêyên Kruschen jêkir û min ew li defterek kevn xist. Gava di rojnamekê de kêfa min ji tiştekî re bihata, min ew jê dikir û li wê defterê dixist.

Min destê xwe jî şûştin û piştre ez çûm ketim balkonê.

Li vî dorbajarî, oda min li cadeya serekîn ya tarê dinere. Piştî nîvroj dunya xweş bû lê kevirên cadê bi dohn bûn, mirov li ser wan pir kêm bûn û bi ser de jî bi lez dixuyan. Pêşî malbatên ji xwe re tev zarokan derdiketin seyranê li ser cadê xuyabûn. Du lawikên biçûk bi bedlên deryayî, bi şelwarên kurt ên digihaştin jêra çokên wan û ew di nav wan çekên hişk de te digot hatibûn girêdan. Keçeke biçûk bi girêkek pemba û bi soline reşî cîlakirî bi wan herdu lawikan re bû. Dê û bavê wan dabûn dû wan. Dê gelekî qelew bû û kirasekî hebirmêşî qehweyî li xwe kiribû. Bavo zilamekî kinikî hûrik bû û tenê ez wî bi şikil nas dikim. Wî kumekî ji qeselan dabû serê xwe, girêkek minminîkî li dora hustuyê xwe girêdabû, gopalek bi destê xwe wergirtibû. Dema min ew bi jina wî re dît, min nas kir çima di taxê de digotin ku ew mirovekî bijarete û rûmetbilind bû. Piştî wan malbatan bi demeke ne pir dirêj xortên tarê derketin. Wan rûnê ku dihêle por bibiriqîne di porê xwe dabûn, girafêtên sor xistibûn qirika xwe, çakêtên navpişt teng li xwe kiribûn, di bêrîka ber dil ya çakêtan de destmalên neqişandî çikandibûn û wan solên pozqut xistibûn lingên xwe. Min di serê xwe de got ku hebû nebû wan bêguman berê xwe dabûn sînema navenda bajêr ji ber ku ew zû ji mal derdiketin û bi kenekî pir bilind ber bi tramwayê dilezandin.

Piştî wan kesan, cade hin bi hin vikîvala bû. Temaşegehan di baweriya min de li her derê dest pê kiribûn. Tenê xwediyên dikanan û pisîk di cadê de mabûn. Di ser darên hencîran ên li kêleka cadê, asman sayî bû lêbelê ew asmanekî vemirî û bê ronahî bû. Li kêleka cadê li aliyê din, xwediyê dikana tûtinfiroşiyê sendeliyek ber bi devê dikanê ve kişandibû, kerikî li ser rûniştibû û herdu arişkên xwe danîbûn ser pişta wê. Tramwayên ku ta berî bêhnikekê rê û rêwanî di wan de tunebû anuha bêje vikîvala diçûn û dihatin. Li kêleka dikana tûtinfiroş garsonê qehwexana biçûk ya bi navê “li bal Pierrot” kapeka text di eywana vala de rêş dikir. Roj bi rastî yekşem bû.

Min sendeliya xwe zîvirand û ez wek xwediyê dikana tûtinfiroş

rûniştim ji ber ku min dît ku ew hawê rûniştinê xweştir bû. Piştî kişandina du çixaran ez derbasî hundir bûm, min rahişt perçeyek çoklatê û ez ber bi pencerê çûm ta wê çolkatê li wê derê bixwim. Hinekî derengtir, asman tarî bû û min bawer kir ku tavek ji tavên havînê ê bi ser me de biketa. Lê tevlî ku paşê rûyê asmên dîsa hin bi hin sayî bû, min bala xwe dayê ku derbasbûna ewrên mezin di ser rûyê cadê re mîna soza baranê li dû xwe hiştibû û wê sozê dihişt ku cade tarîtir bibûya. Ez wilo mam û min ji xwe re demeke dirêj li asmên nêrî.

Saet li pêncan, tramwayine di nav dengên bilind de gihaştin. Wan ji yarîgeha dora bajêr rahiştibûn qeflên temaşevanan û ew bi xwe re vedigerandin tarê. Temaşevan li ser pelikên ber devê deriyan xwe bi deriyan ve daliqandibûn û xwe bi ser lûlên dora tramwayan xwar kiribûn. Paşê bazîger jî vegeriyan û min ew ji wan çentên wan ên biçûk nas kirin. Wan qirika xwe bi qîrînê diçirandin, distiran û digotin ku kluba wan ê tu carî nemiraya. Çendina ji wan bazîgeran destê xwe ji min re bilind kirin û yekî berê xwe ber bi min ve kir û bi qîrîn got: "Me zora wan bir". Min serê xwe ber bi jêr ve hejand û got: "erê". Piştre trumbêlan dest pê kirin û ber bi cadê hatin.

Roj hinekî din geriya û hat guhertin. Rengekî bi ser sore di ser banên avahiyan re xwe li asmên girt û bi ketina êvarê re, jiyan bi cadeyên vala ve hat. Kesên ji xwe re derketibûn seyranê hin bi hin vedigeriyan. Di nav wan de min ew mirovê ku dema gotin dihat ser jê re digotin mirovê bijarte û rûmetbilind dîsa dît. Zarok digiriyan an jî wan nedixwestin bimeşiyana û wilo jî dê û bavên wan ew bi dû xwe ve dikişkişandin. Deriyên sînemeyên tarê di wê gavê de vebûn û pêlên temaşevanan li ser cadan belav bûn. Di nav wan de, xortên tarê ji her carê bêtir ji xwe bi bawerî dixuyan û ji dan û ji tevgera wan, min nas kir ku ew çûbûn filmekî serpêhatiyan. Yên ji sînemeyên bajêr vedigeriyan hinekî derengtir gihaştin û ew ji yên ji sînemên berdora bajêr girantir dixuyan. Tevlî ew hîna ji xwe re dikeniyan lê car caran ew ji min re diyar bûn wek ku ew ji tiştekî westiyayî

bûn û hişê wan li derine dûr mabû. Ew li ser kêleka cadeya hember min çûn û hatin. Keçên tarê porên xwe berdabûn, destên xwe xistibûn bin milên hev û ji xwe re digeriyan. Xortan ji qazî ve di ber wan re diçûn û bi wan re henek dikirin. Keç li paş xwe dizîvirin û dikeniyan. Çendina ji nav wan ku min ew nas dikirin destê xwe ji min re bilind kirin.

Lempên cadê ji nişkê ve pêketin û wan ronahiya stêrikên pêşîn ên ku ber bi tariya şevê hilkişiyabûn qels kirin. Min bala xwe dayê ku çavên min ji ber wî awayê nêrînê û wan ronahiyan diqerimîn. Kevirên rê ku te digot dohnkirî bûn û tramwayên ku diçûn û dihatin di bin şewqa lempên cadeyê de di navberine wekhev de dibiriqîn. Rohaniya wan lempan li ser porên dermankirî, li ser lêvên ku dibişirîn an jî li ser bazinekî zîvînî di destê keçekê de dişikest û dipijiqî. Hinekî derengtir, tramway pir kêm bûn û bi wê şeva ku ji mêj ve ketibû û di ser serê dar û lempan re reş dikir, tax hin bi hin vala bû. Cade dîsa vikîvala bûbû û pisîka pêşîn derket û hêdîka derbasbû. Min ji xwe re got ku gerek bû ku min şîv bixwara. Hustuyê min hinekî qerimî bû û dêşiya ji ber ku min demeke baş dirêj pala xwe dabû ser pişta sendeliyê. Ez daketim û min nan û mekeroniya kirî, min şîva xwe çêkir û li ser darê nigan xwar. Min xwest cixarekê li ber pencerê bikişînim lê germa bayî gelekî şikestibû û min hinekî sar bû. Min camên xwe girtin û dema ez vegeriyam, ez di neynikê de çav li perçekî masa xwe ketim. Fenera min û çend pariyên nên li ser wê li kêleka hev bûn. Min ji xwe re got ku roj roja yekşembê bû û baş bû ew roj ber bi dawiya xwe diçû. Min got ku dayê anuha di bin axa gorê de bû, ku min ê dîsa dest bi karê xwe bikira û ku bi çend gotinên kurt tiştek nehatibû guhertin.

## III

Min îro li nivîsgehê gelekî kar kir. Xwedanê karê min bi min re qenc derket. Wî ji min pirsî Xwedê bike ez ne pir westiyayî bûm û

xwest bizanîba dayê çend salî bû miribû. Ta min xwe şaş nekira min got "Li dor şêstî" û ez nizanim çima lê ji min re xuyabû wek ku dilê wî ket cih û ku ew yek ji bo wî tirseke qediyayî bû.

Li ser masa min resîd û senedên malên barkirî kom bûbûn. Min li wan gişan nerî, gerek bû ku min ew tev bikirana. Berî ku ez ji nivîsgehê ji bo fravînê derkevim, min destên xwe şûştin. Ez nîvro gelekî ji şûştina destên xwe hez dikim. Kêfxweşiya ku ez êvaran di di vê şûştinê de dibînim ji kêfxweşiya nîvro bi gelekî kêmtir e. Rojê gişî her kes destê xwe bi wê destmala ku li dora xwe digere zuha dike û ji ber vê yekê jî ew gelekî şil dibe. Min ev têbînî rojekê ji xwedanê karê xwe re got. Wî li min vegerand ku ev yek ji binî ve naxwoş bû, lêbelê dîsa jî ew tiştekî bêqîmet û biçûk bû. Saet duwanzdeh û nîvan, hinekî dereng, ez bi Emmanuelê ku di beşê şandinê de kar dike derketim. Buro li kêleka deryayê ye û me ji xwe re bîstikekê li gemiyên baran mêze kir. Bender di bin agirê roka xurt de diqijqijî. Wê kêlîkê, kemiyonek di nav şerqeşerqa zengîran û guregura motorê xwe de hat. Emmanuel ji min re got "Tu dibê çi em xwe bavêjinê" Min yek nekir dudo û min dest bi bazdanê kir. Kemyonê li pêşiya me xist û me bi bazdan da dû. Ez di nav gurregurrê û tozê de fetisî bûm, lê min nema bala xwe da tu tiştî. Min tenê dizanîbû ku min di ber pozên gemiyên rawestiyayî bazdida. Mencenîq, barhilgirên hesinî û stûnên gemiyan li ser aso dîlan dikirin û di nav wê beza min de geh bilind dibûn geh dadiketin.

Ez yê pêşîn bûm ku min xwe gihand kemyonê û bi wê bezê, min xwe avêt paşiya wê. Paşê, min alîkariya Emmanuel kir ta ku ew jî rûniştа. Bêhna me çikiya bû û kemyon li ser kevirên xwaromaro geh bilind dibû geh di nava tozê û germa rokê de diçû xwarê. Emmanuel hingî dikeniya dihat bifetisiya.

Em di nav xwêdanê de gihaştin bal Céleste. Ew herdem bi zikê xwe yê mezin, bi berdilka xwe û bi simbêlên xwe ên spî li wir bû. Wî ji min pirsî: "Xwedê bike dîsa jî tu baş bî". Min jê re got ku erê ez baş bûm û ji birçîna çîzeçîza nava min bû. Min xwarina xwe bi

lez xwar û piştre min qehwek vexwar. Paşê ez vegeriyam malê û ji ber ku min pir şerab vexwaribû, ez hinekî ji xwe re razam. Dema ez ji xew rabûm, dilê min bijiya çixarakê. Wextê min teng bû û min bazda ta min xwe gihand tramwayekê. Min piştî nîvro gişî kar kir. Hundirê nivîsgehê gelekî germ bû û êvarê ez kêfxweş bûm piştî karê xwe hêdî hêdî li ser sekûya bendera deryayê ji xwe re ber bi malê ve diçûm. Asman kesk bû û min xwe mirovekî kêfxweş, bextiyar didît. Lê li gel wê kêfxweşiya xwe, ez dîsa seraser vegeriyam malê ji ber ku min dixwest ji xwe re petatên kelandî çêbikirana.

Ez di nava tariyê de bi pelikan hildikişiyam jorê dema ez û kalê Salamano, cîranê eynî qat, em li bin guhên hev ketin. Ew bi kûçikê xwe re bû û ev heyşt salên wan in ku mirov herdem wan bi hev re dibîne. Li espanyolê wî nexweşiyeke pûstê peyda bûye ez bawer dikim navê nexweşiyê sor e. Ji ber vê nexweşiyê piraniya pirça wî diweşe û qaşirine bi rengekî tarî ji hemû laşê wî yê kulbûyî radibin. Ji ber ku ew herdu herdem di odake teng de wilo bi hev re dijîn, Kalê Salamano, dawiya dawî, bû wek sehê xwe û qaşirine bi ser sore ve ji rûyê wî radibin û ji hemû pirça wî tenê çend tayine zerik bi serê wî ve mane. Tiştê ku kûçik ji xwediyê xwe girtiyê şêweya meşa wî ye. Ew wek kalê Salamano pişta xwe hema wilo xwar dike û poz û hustuyê xwe ber bi pêş ve dirêj dike. Yê li wan binere ê bêje ew ji tuxmekî ne û wekhev in lêbelê ruhê wan ji hev dire. Kalê Salamano her roj du caran kûçikê xwe derdixe derve û wî digerîne, carekê saet yanzdehê danê sibehê û cara duduyan saet pêncê êvarê. Ev heyşt salên wan in ku wan tu carî rêya xwe neguherandine û herkes li cada Lyonê dikare wan bibîne. Di destpêkê de, kûçik kalê Salamano bi dû xwe ve dikişkişîne ta ku kalo dilukume. Wê gavê kalo dest pê dike lê dixe û peyvên dijûn û pîs jê re dide. Ji tirsa nava xwe kûçik zikê xwe dide erdê û dibe dora kalo wî bi dû xwe dikişkişîne. Dema kûçik lêxistin û xerberan ji bîr dike, ew dîsa dide pêşiya xwediyê xwe û wî bi dû xwe ve dicircirîne. Wilo jî carek din lêxistin lê dibe û gotinên pîs jê re tên kirin. Paşê Salamano û sehê xwe li kêleka cadê

dirawestin û li hev dinerin, kûçik bi tirsek mezin û mirov bi qehr û kîn. Her roj jî karê wan ev e. Dema kûçik dixwaze bimîze, kalo rê nadê û wî bi dû xwe de dikişîne. Kûçik li dû xwe rêzeke ji peşkên biçûk ên mîzê dirêj dike. Eger kûçik di odê de bimîze ji xwe wê gavê ew dîsa lêdanê dixwe û ev yek ji heyşt salan de bi vî awayî berdewam dike. Céleste herdem dibêje ku "Guneh e, dilê gawiran bi vî kuçikî dişewite", lêbelê eger bi rastî bê ya dawî kesek xweş nizane. Dema ez li ser pelikan pêrgî wî bûm, Salamano di wê gavê de xeber ji kûçikê xwe re didan. Wî jê re digot: "Pîso! Berateyo!" û kûçik dikir îskeîsk. Min silav lê kir, jê re got: "şeva te bi xêr", lê wî hema xeber didan û silava min venegerand. Wê gavê min jê pirsî kûçik çi kiribû ta ew wilo bi ser de radibû. Wî bersiva min neda û berdomand: "Pîso! Berateyo!" Di tariya pelikan de, min didît ku wî xwe bi ser kûçikê xwe xwar kiribû û gerdenbenda wî rast dikir. Min dengê xwe bilind kir. Wê gavê, bêyî ku li min bizîviriya wî qehra xwe daqurtand û di nav diranên xwe de li min vegerand: "Ma ew hêna li wir e!" Paşê ew derket û wî seh bi dû xwe de kişand. Seh bi îskînî li ser her çar lepên xwe da dû.

Di eynî wê gavê de cîranê min yê qatê dudyan derbas bû. Li taxê tê gotin ku ew li ser jinan dijî. Lêbelê dema yek jê dipirse ew çi karî dike, ew vedigerîne ku ew "enbardar" e. Bi awakî giştî, kêfa kesekî li taxê jê re nayê. Lê ew gelek caran bi min re diaxife û ji ber ku ez li gotinên wî guhdarî dikim, carinan jî tê bal min hinekî dimîne. Ez tiştên ku ew dibêje tiştine balkêş dibînim û bi xwe tu sebeban nabînim ta bi wî re deng nekim. Navê wî Raymond Sintès e. Ew têra xwe kinik e, bi navpişteke fireh e û bi pozekî mîna pozên boksçiyan e. Ew herdem li çekên xwe pir miqate ye. Dema wî behsa Salamano û kûçikê wî kir, wî jî ji min re got: "Çi gunehê mirov bi vî tiştî tê!" Wî ji min pirsî ka ez ji danûstandina Salamano bi kuçikê wî re aciz dibûm an ne, min vegerand û got na.

Em bi hev re hilkişiyan û min ê dev jê berdaya dema wî ji min re got: "Sosîsek û şerab li bal min hene. Ma tu nayê bi min re pariyekî

naxwî?...". Min ji xwe re got ku wê vexwandinê ê min ji çêkirina xwarinê azad bikira û min got erê. Raymond jî tenê di odake bi metbexeke bê pencere de dijî. Di ser serê textê wî re, firişteyekî spî û pemba ji macûna mermerê û sûretine pehlewanan û du an sê klîşên jinên tazî bi dîwêr ve ne. Ode gemarî bû û Raymond textê xwe rast nekirbû. Wî pêşî lempa xwe ya donê gazê vêxist, paşê wî ji bêrîka xwe paçek ne pir paqij derxist û li destê xwe yê rastê girêda. Min jê pirsî çi bûbû û wî ji min re got ku ew û mirovekî girrê xwe jê venedikir rabûbûn hev.

"Tu dibînî, axayê Meursault, wî ji min re got, ez bi xwe li şer nagerim lêbelê ez mirovekî sergerm im. Yê din ji min re got: "Eger tu mêr î tê ji tramwayê dakevî." Min jê re got: "De bes e ha ! Li ciyê xwe rihet rûnê." Wî ji min re got ku heyvanê mêraniyê di nava min de tunebû. Wê gavê ez daketim û min jê re dîsa got: "Kuro bes e ! ev ji te re çêtir e. Eger tu girrê xwe ji min ve nekî ez ê te baqil bikim." Wî li min vegerand "Tu ê min ji çi baqil bikî?" Wê gavê min nema xwe girt û hema miştek lê da û bi wê miştê re ew da erdê. Min xwe daqul kir ku ez wî rakim lê hema wilo li ser erdê wî pehîn li min da. Wê gavê min carekê bi çoka xwe û du caran bi mişta destê xwe lê da û rûyê wî di nav xwînê de hişt. Min jê re got te hîna divê an te têra xwe lêxistin xwariye. Wî got "erê bes e". Sintès çîroka xwe ji min re digot û di eynî wextê de paçê destê xwe rast dikir. Ez li ser text rûniştî bûm. Wî ji min re got: "Tu dibînî ku ne min girrê xwe tê da. Wî bela xwe firot min." Ew yek rast bû û min heq da wî. Wê gavê wî ji min re diyar kir ku wî dixwest ku bi rastî li ser vê pirsê min şîretek lê bikira. Wî got ku çi ye ne çi ye ez mirovekî têgihaştî bûm, ku min têra xwe dunya bi çavên serê xwe dîtibû, ku min dikarîbû alîkariya wî bikira û ku bi wê alîkariyê jî, ew ê bibûya dostê min. Min tiştek negot û wî dîsa ji min pirsî ka bê dilê min hebû ku ez bibûma dostbirakê wî. Min jê re got ku ev yek ji bo min tiştekî wekhev bû û bi wê bersivê wî kêfxweş xuya kir. Wî rabû sosîsê xwe derxist û di miqilkê de birajt. Bêyî ku deng ji tiştekî bianiya, wî ma-

se raxist û lîwan, sênîk, kêr û çetel û du şûşên şerabê danîn ser. Paşê em li ser sifra xwarinê rûniştin û wê gavê wî dest bi çîroka xwe kir. Ew pêşî hinekî dudilî bû lê dest pê kir. "Min xanimek nas kir...ez çawa ji te re bêjim ew yarika min bû... û ew mirovê ku min pê re pevçinîbû birayê wê bû. Raymond ji min re got ku jinik li ser perên wî dijiya. Tevlî ku tu gotin ji devê min derneketin, wî di cî de lê zêde kir û got ku dizanîbû xelkên taxê çi li ser wî digotin, lê ji vî alî, ew ji xwe serrast û bawer bû, wî dizanîbû ku ew enbardar bû.

"Ez serê te neyêşînim, wî got, min bala xwe dayê ku ez dihatim xapandin." Perên ku wî didane wê bi zorê têra wê dikirin. Wî bi xwe kiriya oda wê dida û, ji bo xwarin û vexwarinê, wî rojê bîst frang didane wê. "Sê sed frang ji bo odê, şeş sed ji bo xwarin û vexwarina wê û her demekê, min cotek gorên tenik jê re dikirî, ev dibû hezar frang. Tevlî vê yekê xanimê kar nedikir û bi ser de jî ji min re digot ku ne bes bû, ku wê bi wan peran nikarîbû debara xwe bikira. Lê ne ku min jê re nedigot, min digot: "Ma çima tu bi kêmanî nîvê rojê kar nakî? Tê wilo ji bo kirîna tiştên hûr û mûrên xwe barê min sivik bikî. Ma ne vê mehê min destek kiras ji te re kirîye, ez rojê bîst frangan didime te, ez kiriya xaniyê te didim û bi ser de jî tu xêrê li min dikî xiyar." Lê wê kar nedikir, herdem digot ku wê nikarîbû kar bikira, ta rojekê ez têgihaştim ku wê derew li min dikirin û ez dixapandim."

Wî wilo ji min re çîroka xwe got çawa wî rojekê bilêtek bextkişiyê di çentê wê yê destan de dît û çawa wê nikarîbû bigota çilo û bi çi peran wê ew kirîbû. Hinekî paşê, wî li bal wê kaxezek dîtibû û li gor wê kaxezê wê du bazin li hember peran razandibûn û xistibûn rihanê. Ta wê roja kaxezê, wî ji binî ve nizanîbû ku ew herdu bazin li bal wê hebûn. "Min nas kir ku wê ez dixapandim û ji ber vê yekê min dev jê berda. Lêbelê berî ku ez dev jê berdim, min lê xist. Paşê min hemû rastiya wê di rûyê wê de jê re got. Min jê re got ku wê tenê tiştek dixwest û ew tişt kêfxweşiya ew tiştê di nav şeqê wê de bû. Wek ku min jê re got ez anuha ji te re dibêjim, axayê Meursa-

ult: "Tu nabînî ku çavên xelkê bar nabe ku ez vê kêfxweşiyê, vê bexteweriyê didime te. Lê rojekê ji rojan ew kêfxweşiya tu di nav de bûyî wê bê bîra te û tu ê poşman bibî."

Wî têra wê lê dabû, dem û lêvên wê di nav xwînê de hiştibû. Berê wî lê dida lê ne bi wî hawî. Min tenê çend tep lê dixistin lê min ew nedêşand. Ew hinekî diqîriya. Min depên li ser rûyê pencerê digirtin û wilo jî tişt dibûn wek berê. Lêbelê anuha tiştekî cidî ye û, di baweriya min de, min pir ew nekuta û pîs nekir."

Wî ji min re diyar kir ku çûnki wî bawer dikir ku bi rastî wî heqê wê baş nedabûyê, wî dixwest min pêşniyariyek lê bikira. Lempê cama hawîrdora xwe tenî dikir û wî dîroka xwe di wê navê de birrî û fitîla wê rast kir. Min tiştek nedikir, tenê lê guhdarî dikir. Min nêzîkî litrek şerab vexwaribû û agir bi çênikên min ketibû. Ji ber ku min pakêta xwe tev kiribû min çixarên Raymond dikişandin. Tramwayên dawîn derbas dibûn û wan dengên anuha qelsbûyî ên dorbajêr bi xwe re dibirin. Raymond berdomand û got tiştê ku bêhna wî teng dikir ew bû ku "wî hêna bêriya ganên wê jinikê dikir", lê li gel vî tiştî, wî dixwest tore bi serê wê de bianiya. Pêşî, wî xwestibû ew bibira hotêlekê û paşê bang polîsê dij-qehpetiyê bikira. Wî dixwest wilo ew bihetikanda û bihişta navê wê têketa qeydên polîs ta ku ew wek gewendakê bihata nas kirin. Wî alîkariya hevalên "navendê" xwestibû. Wan tu çare ji bo vê yekê peyda nekiribûn. Wek ku Raymond da rûyê min, giring bû ku ew ji navendê bû. Wî ji wan re gotibû ku ew ji wan bû û gerek wan tiştek ji bo wî bikirana. Wan wê gavê tenê pêşniyariek kirin: "wan dikarîbûn ew nîşan bikirana". Raymond bi ya wan nekiribû ji ber ku daxwaziya dilê wî tiştekî din bû. Ew ê bifikiriya, li çareyek çêtir bigeriya. Berî her tiştî, wî dixwest tiştek ji min bixwesta lê pêşî wî dixwest bizanîba nêrîna min li ser vê çîrokê çi bû. Min lê vegerand ku tu nêrîn û dîtinên min tunebûn lêbelê min ew çîroka hanê balkêş didît. Wî ji min pirsî ka min bawer dikir ku ew hatibû xapandin û ji min re eşkere bû ku erê tiştekî wilo di wê navberê de hebû. Wî ji min pirsî ka ez di şûna wî de bûma

min ê çi bikira, gelo min ê ew keç biedeb bikira. Min jê re got ku min nizanîbû min ê çi bikira lê ez têdigihiştim ku wî dixwest ew bêşanda û tola xwe hilaniya. Min hinek şeraba din vexwar. Wî çixarak vêxist û fikra xwe ji min re rave kir. Wî dixwest nameyek "Bi pehînan û di eynî wextê de bi tiştên ku ê bihiştina ew poşman bibûya" binivîsanda. Paşê, dema ew ê bihata, ew ê pê re razaya û "di nav ciyan de, di deqa wêter bikira," wî ê tif nav çavên wê bikira û berdaba wê. Min dît ku jinik bi wî awayî bi rastî ê bihata pîskirin. Lê Raymond ji min re got ku wî bi xwe nikarîbû nameyeke li gora dilê xwe binivîsanda, û ji ber vê yekê, wî bîra min biribû û dixwest ku min ew name di şûna wî de binivîsanda. Ji ber ku min tiştek nedigot, wî ji min pirsî ka ez ê aciz nebûma bi nivîsandina wê namê. Min got na.

Wî wê gavê piyalek din şerab bi ser gewriya xwe de kir û rabû ser xwe. Wî sênî û perçê sosîsê sarbûyî ku ji ber me mabû da alî. Wî cawê şimakirî li ser masê baş paqij kir. Wî ji çaviyeke masa şevê kaxezek damkirî, zerfeke zer, qelemdanek biçûk ji textê sor û hibirdanek çarqorzî bi hibirek şîrikî derxist. Dema wî navê jinê ji min re got, min nas kir ku ew Ereb bû. Min name nivîsand. Min ew nivisand û çi hat ber devê min min got, lê dîsa jî, ta ji min hat, min ew li gora dilê Raymond nivîsand ji ber ku tu sedem nebûn ta ku min ev yek nekira. Paşê, min ew name bi dengekî bilind jê re xwend. Wî li min guhdarî kir û di ber re cixara xwe kişand û serê xwe bi erêyî hejand. Paşê wî xwest ez nameyê careke din jê re bixwînim. Name gelekî li gora dilê wî bû û wî ji min re got: "Min dizanîbû ku te dunya xweş nas dikir". Di destpêkê de min bala xwe nedabû wî ku wî ji min re di şûna "Hûn" de digot "Tu". Tenê gava wî got "Anuha, tu bi rastî dostbirakê min î", ku ez behetî bûm û ev yek li ber guhên min tiştekî xerîb bû. Wî hevoka xwe dubare kir û min lê vegerand: "Erê". Hevaltî an ne havaltiya bi Raymond re ji bo min bi xwe tiştekî wekhev bû lêbelê li ser rûyê wî eşkere bû ku ew bi hacetî wê hevaltiyê bû. Wî name imze kir û me şerab tev kir. Paşê em

demekê bêdeng man û me tenê wilo cixarên xwe dikişandin. Li derve dunya kerr û bêdeng bû û di wê bêdengiyê de dengê trumbêleke ku gihaşt guhê min û min got: "Dereng e". Raymond jî wilo bawer bû û ji min re got ku dem zû dibuhurî bû û gotina min di ciyê xwe de bû. Ez ji xewa ketibûm lê ji min nedihat rabûma ser xwe û min berê xwe bida malê. Bêguman li ser rûyê min xuya bû ku ez ji hal ketibûm ji ber ku Raymond wê gavê ji min re got ku gerek hayê min ji min hebûya. Pêşî ez tê negihaştim wî behsa çi dikir û wilo jî wî ji min re got ku wî bihîstibû ku dayika min miribû lê ku ev yek her ê rojekê ji rojan biqewimiya. Baweriya min jî bi xwe ev bû.

Dema ez rabûm ser xwe, Raymond bi dilgermî destê min di nav destê xwe de guvaşt û got ku dilê mêran herdem bi hev re rast bû. Ez derketim û min derî li dû xwe girt. Di nav wê tariya ku xwe li pelikan pêçandibû ez hinekî li ber devê deriyê wê mam. Xanî bêdeng bû û ji jêra pelikan hilmeke nediyar û nem ber bi jor ve heldikişiya. Tenê dengek gihaşt min; dilê min lêdida, xwîn ber bi qehfê serê min dajot û zingînî ji ber guhên min dianî. Ez bêliv mam lê di oda kalê Salamana de, kûçik bi dengekî kûr kir îskeîsk.

## IV

Min heftiyê gişî baş kar kir. Raymond hat bal min û ji min re got ku wî name şandibû. Ez û Emmanuel em du caran bi hev re çûn sînemê û Emmanuel bi xwe herdem tiştekî ji fîlm tênagihêje û gerek e ez hercar jê re rave bikim çi li ser perdeya spî derbas dibe. Do şemî bû û wek min û Marie me li hev kiribû ew hat bal min. Wê kirasekî xweşik bi xêzên sor û spî li xwe kiribû, şimikine çermînî xistibûn nigên xwe û dilê min gelekî bijiya wê. Memikên wê ên step kirasê ser sîngê bilind dikirin û tava rokê rûyê wê sorgulî kiribû. Em li otobûsê siwar bûn û çend kîlomitran ji bajarê Cezayirê em çûn kêleka deryayê. Li wê derê teht û zilan ji aliyê erdê xwe li dora avê di-

pêçandin. Roka çarê piştî nîvro ne gelekî bi tîn bû, lê ava deryayê şîrgermî bû û li ser rûyê wê pêlên biçûk û dirêjokî bi nermî ber bi erdê dihatin. Marie min hînî lîstikekê kir. Lîstik ew bû gerek min li ser zik ajnê bikira, lêvên xwe di ser serê pêlan re bibira û devê xwe tije kef bikira. Piştre gerek min xwe bavêta ser piştê, rûyê xwe ber bi asmanan ve bikira û ew kef ji devê xwe bipijiqanda. Tiştê ji nav lêvên min î guvaştî dipijiqî dibû wek tentenên ji kefê, li ber ba belav dibû û bi ser rûyê min wek baranek şîrgermî dihat xwarê. Ava deryayê pir şor bû û wê şorbûnê piştî demeke ne pir dirêj agir bi devê min xistibû. Marie xwe wê gavê gihande min û di nav avê de xwe bi min ve zeliqand. Wê devê xwe xist devê min, bi zimanê xwe agirê bi lêvên min ketibû vemirand û me bêhnikekê wilo di nav pêlan de xwe bi hev re gindirand.

Dema me li kêleka avê çekên xwe li xwe kirin, min dît ku Marie li min dinêrî û di nêrînên wê de pêtên daxwaziyê diçirisîn. Min ew maç kir û ji wê gavê û vir de, me nema dengê xwe kir. Min ew ber bi xwe ve kişand û me herduyan berê xwe bi lez da rawestgeha otobûsê. Me xwest em zû vegeriyana bal min ta me xwe bavêta nav ciya. Min pencera xwe vekirî hiştibû. Rokê laşên me dax dabû û şeva havînê di ser laşên me de diherikî û bi me pir xweş bû.

Marie danê vê sibehê li bal min ma û min jê re got ku me ê firavîn bi hev re bixwara. Ez daketim goşt bikirim û gava ez vegeriyam û bi pelikan hilkişiyam, dengê jinekê ji oda Raymond gihaşt guhên min. Hinekî derengtir, kalê Salamano bi ser kûçikê xwe de rabû û dengê binê solan û şerqîna çend sîlan li ser textê pelikan li ber guhê me peyda bû û: "Pîso, berateyo". Paşê ew derketin çûn ser cadê. Min çîroka kalê Salamano ji Marie re got û ew keniya. Wê pêjameke min li xwe kiribû û zendikên çakêt li hev badabûn. Bi wî kenê wê dîsa dilê min bijiya wê. Piştre wê ji min pirsî ka min jê hez dikir. Min lê vegerand ku mana wê yekê tune bû, lê min jê re got ku min bawer nedikir ku min jê hez dikir. Bi wê yekê xemgîniyê li ser rûyê wê diyar kir lê dema wê dest bi çêkirina xwarinê kir, kênê wê dîsa

ne ji ber tiştekî hat û wilo jî min ew maç kir. Wê gavê dengê pevçûnekê ji oda Raymond dest pê kir û bilind bû.

Pêşî dengekî tûj, yê jinekê hat û paşê dengê Raymond. Wî digot: "Te ez pîs kirim, te ez pîs kirim. Ez ê te hîn bikim çawa tê carek din min pîs bikî." Paşê dengê kurpineke nizim hat û jinikê kir qîrîn, lêbelê wê wilo kir qîrîn ku di cî de hemû tar li devê derî kom bû. Ez û Marie jî em derketin ber devê derî. Jinê hema dikir qîrîn û Raymond jî her lêdida. Marie ji min re got ku ew tişt pir dijwar bû û min dengê xwe nekir. Wê ji min xwest ku ez herim bang polîs bikim, lê min jê re got ku ez ji polisan hez nakim. Lêbelê polîs dîsa jî di wê gavê de hat. Lûlekêşê ku li qatê duduyan bi kirê rûdinê çû ew anî. Dema polîs li derî xist, deng di cih de hate birrîn. Lê derî venebû û yê polîs cara duduyan bi hêrs lê da. Piştî demekê, jinikê dîsa dest bi qîrînê kir û Raymond rabû derî vekir. Cixara wî di nav lêvên wî de, wî xwe bi derewan dikenand wek ku hayê wî ji tiştekî tunebû. Keçikê xwe zer kir derî û bi lez ji polîs re got ku Raymond lê xistibû. Yê polis ji Raymond pirsî: "Navê te" û Raymond vegerand. Polîs got: "Cixara xwe ji devê xwe derxîn dema tu bersiva min didî" Raymond dudilî bû û nizanîbû cixare derxista an na. Wî li min nêrî û wilo jî ew ji devê xwe dernexist. Wê gavê yê polîs got şiring û bi hemû destê xwe sîlak tûj li navçavê wî da. Bi wê sîlê cixare pekiya û çend gavan dûr ket. Rûyê Raymond qulipî, lêbelê wî dengê xwe nekir û paşê bi dengekî sistî melûlî ji polîs xwest ka dikarîbû rahişta quncika cixara xwe. Polîs bi hişkî destûr dayê û berdomand: "Lê careke din tê xweş bizanibî ku polîs ne qeşmerê te û bavê te ne." Keç hîna digiriya û wê car din ji polîs re got: "Wî li min xist. Ew qewad e." Raymond wê gavê pirsî: "Ev çi ye, axayê Polîs, ma li gor qanûnê dibe ku ji miroveki re bê gotin ku ew qewad e?" Yê polîs bersiva wî neda û bi fermandarî lê vegerand û jê xwest" wî devê xwe bigirta". Raymond nema zanîbû çi bikira çi nekira û berê xwe ber bi keçikê ve kir û got: "Xwedê ji min û te re kerîm e, lê, ma ez ê vê yekê ji te re bihêlim?." Polîs jê xwest wî ew devê hanê bigirta û

got ku keç gerek bi rêya xwe de biçûya û Raymond gerek di oda xwe de bimaya ta ku polîsxanê bişanda dû wî. Wî gotina xwe ajot û ji Raymond re got ku gerek wî ji ber xwe û bavê xwe şerm bikira wilo serxweş bûbû û dileriziya. Raymond devê xwe vekir û li yê polîs vegerand: "Ez ne serxweş im, axayê polîs. Tenê sawa te di dilê min de dihêle ez wilo bilerizim. Ev yek ne bi destê min e." Wî deriyê xwe girt û herkes vegeriya mala xwe. Min û Marie me amedekirina firavînê tev kir lê ew ne birçî bû û bêje ku hema min tenê ew xwarin giş xwar. Ew saet yek rabû ser xwe, çû û ez jî hinekî ji xwe ra razam.

Nêzîkî saet sisiyan Raymond li deriyê min xist û buhurî hundir. Ez ji nav ciyan ranebûm û ew li ser kêleka textê min rûnişt. Ew demekê bedeng ma û min ji wî pirsî ka çîroka wî çawa derbas dibû. Wî ji min re got ku wî ya dilê xwe kiribû, lêbelê piştî wê yekê, keçê sîlak daweşand wî. Piştî wê sîlê, Raymond têra wê lê xist û min dawiya çîrokê bi çavên serê xwe dîtibû û ne giring bû wî ew ji min re bigota. Min jê re got ku di baweriya min de ew keç gihaştibû heqê xwe û wilo jî gerek ew bi kêf bûya. Wî jî wilo bawer dikir û got ku polîs bixwesta nexwesta keçikê lêxistina xwe xwaribû û nikarîbû nehişta ku ew lêxistin lê bibûya. Wî berdomand û got ku wî xweş polîs nas dikirin û dizanîbû çawa bi wan re bida û bistanda. Wî ji min pirsî ka ez li bendî wî bûm ku piştî wê sîla hanê wî jî yek daweşanda yê polîs. Min lê vegerand ku ez ne li bendî tu tiştî bûm û min bi xwe ji polîsan hez nedikir. Wî ji min xwest ku em seriyekî bi hev re derkevin. Ez ji nav ciyan rabûm û min dest pê kir porê xwe şeh kir. Wî ji min re got ku gerek ez bibûma şahidê wî. Ew tişt bi xwe ji bo min wekhev bû lê min nizanîbû ka min ê li polîsxanê çi bigota. Li gor gotina Raymond bes bû min tenê bigota ku wê keçê ew pîs kiribû. Min qebûl kir.

Em derketin û Raymond min vexwand û piyalek konyak da min. Paşê wî xwest ku me hinekî bi bilyardo ji xwe re bilîsta. Zora min ji ber tiştekî pir hindik çû. Piştî bilyardoyê dilê wî hebû em bi hev re

biçûna kerxanê. Min nexwest ji ber ku ez ji wî tiştî hez nakim. Wê gavê em hêdî hêdî ber bi malê vegeriyan û di rê de wî ji min re got çiqasî kêfa wî li ci bû ji ber ku wî dawiya dawî heqê yarika xwe dabû wê. Min didît ku Raymond bi min re pir qenc bû û min ji xwe re got ku ew dema me bi hev re derbas kiribû ne xerab bû.

Min ji dûr ve kalê Salamano li ber devê derî dît. Ew weke ku di hundirê xwe de bicoşiya ji min re xuya bû. Dema min nêzîkayî li wî kir, min bala xwe dayê ku kûçikê wî ne pê re bû. Kalê Salamano li hawîrdora xwe dinerî, li dora xwe dizîvirî, çavên xwe di tariya dalanê de digerand, bêyî hişê xwe gotinine bêserî û bêbinî di nav diranên xwe de dicûtin, dîsa bi çavên xwe ên sor û biçûk li cadeyê digeriya. Dema Raymond jê pirsî çi bela wî bû, wî seraser tu bersiv neda. Dengê wî xweş nedigihaşt min lê wî di ber xwe de digot: "Pîso, berateyo" û bêhedan diçû û dihat. Min ji wî pirsî kûçikê wî li kuderê bû. Wî ji nişkê ve li min vegerand û got ku ew çû bû. Paşê zimanê wî xweş geriya û wî li ser hev got: "Min ew wek her carê bi xwe re bir "Kêlgeha Tevgeran". Kes li dora temaşegehên bajarê lîstikan wek axê bûn. Ez li ber "Qehremanê revê" rawestiyam û min ji xwe re temaşe kir. Dema min xwest ji wê deverê herim, min dît ku ew ne li wir bû. Min bi xwe ji mêj ve dixwest zincîreke biçûktir ji bo hustuwê wî bikiriya. Lê min ji ku bawer dikir ku vê berata hanê wê rojekê biçûya."

Raymond wê gavê jê re rave kir ku belkî kûçik xwe winda kiribû lê ew ê vegeriya. Wî çend nimûne li ser kûçikan anî û got ku ew deh kîlomitran meşiyabûn, dîsa li xwediyên xwe vegeriyabûn. Lê van gotinan dilê kalo nexistin cî û eşkere bû ku ew di nava xwe de coşiya. "Ez dizanim ew ê wî ji min bistînin. Ma hûn têdigihêjin? Ew ê wî ji min bistînin. Ax! Xwezî ew rastî şîrhelalekî bihata. Lê Xwedêyo ez ê çi bêjim, ez dizanim ku çara vê yekê tune. Dilê herkesî ji pirzikên wî li hev dikeve. Polîs wê wî bigirin, çare ji vê yekê re tune." Min wê gavê jê pirsî çima ew nediçû bal polîs û got ku ciyekî wan ji bo sehên winda û bêxwedî hebû. Piştî dayîna hinek pere, wî

dikaribû kûçikê xwe ji wê deverê derxista. Wî xwest bizanîbûya eger ew perene pir bûn, û ji ber ku min bersiva wê yekê nizanîbû, bêhna wî teng bû û wî bi qehir got: "Ez ê çawa peran ji bo vê beratê bidim? De bila bitemire!". Wî dîsa dest bi xeberan kir ji sehê xwe re da. Raymond bi ken buhurî hundir û min da dû. Li ber devê deriyên eynî qat, me dev ji hev berda. Piştî demekê, dengê payênkalo hatine guhên min û wî li deriyê min xist. Gava min derî vekir, ew demekê wilo bêdeng ma û paşê got: "Bibuhure, bibexşe". Min jê re got fermo derbas be, lê wî nexwest û li ber devê derî ma. Wî serê xwe xistibû ber xwe, li pozê solên xwe dinêrî û destên wî ên tev bi pizik dilerizî. Beyî ku serê xwe ji ber xwe rakira wî ji min pirsî: "Bêje axayê Meursault ku ew ê wî ji min nestînin. Ew ê wî li min vegerînin. Ma ez ê bêyî wî çi xweliyê li serê xwe bikim, bi kuderê herim?" Min jê re got ku polîs bi xwe kûçikên bêxwedî sê rojan li bal xwe li hêviya xwediyên wan dihêlin û piştî wan sê rojan çi dikirin ew bi kêfa xwe bûn. Wî dengê xwe nekir, li min nêrî û paşê ji min re got: "Bi xatirê te, şeva te bimîne xweş". Wî deriyê xwe girt û paşê ew hema diçû û dihat. Qirçînî ji textê wî hat û ji wî dengê hûr î nizim, ji wî dengê bi taybetî ku ji dîwarê navberê re gihaşt min, min nas kir ku ew digiriya. Ez nizanim çima diya min wê gavê hate bîra min, lê gerek bû ez roja din zû ji xew rabûma. Ez ne birçî bûm û bê şîv ketim nav ciyan.

## V

Raymond telefonî ciyê karê min kir. Wî ji min re got ku hevalekî wî (wî ji wî re behsa min kiribû) min veduxwand roja yekşemê li xaniyê wî nêzîkî serbajarê Cezayira li kêleka deryayê derbas bikira. Min lê vegerand ku ew yek bi dilê min bû lêbelê yekşemê min soz dabû hevalekê. Raymond di cî de ji min re got ku wî ew jî vedixwand. Jina hevalê wî ê pir kêfxweş bibûya eger xwe tenê jin di nav birrek mêr de nedîta.

Ez dizanim ku kêfa xwedanê kar nayê ku em ji xwe re bi telefonê biaxifin û min xwest seraser bibirriya lê Raymond xwest min hinekî lê guhdarî bikira. Wî got ku wî dikarîbû êvara rojê ew nama vexwandinê bigihanda min, lêbelê wî dixwest hayê min ji tiştine din hebûya. Rojê gişî birreke Ereban dabûn dû wî û birayê yarika wî ya kevn di nav wan de bû. "Eger êvarê dema tu vegerî tu wî li kêleka malê bibînî, bila hayê min jê hebe." Min got erê baş e.

Pir wext di wê navberê re nebuhurî xwedanê kar şand dû min û wê gavê dilê min teng bû ji ber ku min bawer kir wî ê ji min bixwesta min telefonên xwe kêm bikirana û ez bêtir bi karê xwe daketama. Lê wî ne ji bo wê yekê şandibû dû min. Wî anî ser zimên ku wî ê bi min re behsa bernameyekê bikira li gel ku ew bername hêna di serê wî de ne pir diyar bû. Wî tenê dixwest bizanîbûya nêrîna min li ser wê çi bû. Dilê wî hebû ku wî buroyek li Parîsê vekira ta ji wê derê, ji ciyê cî û seraser bi şerîkatên mezin re bida û bistanda û wî dixwest bizanîbûya ka min xwe ji bo wî karî û wê berpirsiyariyê amede didît. Vî karê nû ê bihişta ez li Parîsê bi cî bibûma û bi ser de jî di salê de ez ê têra xwe bigeriyama, biçûma her derê. "Tu xort î, û ez bawer im ev jiyana hanê ê dermanê dilê te be". Min got ku erê ev yek rast bû, lêbelê eger min rastiya dilê xwe bigota, ev yek ji bo min wekhev bû. Wî wê gavê ji min pirsî ka min dixwest guhertinin mezin di jiyana min de çêbûbûna. Min vegerand ku mirov jiyana xwe tu carî naguherîne, ku jiyan hemû wekhev in û ez ji binî ve ne dijî jiyana xwe bûm. Kêfa wî ji bersiva min re nehat û ev yek li ser rûyê wî eşkere bû. Wî got ku min tu carî bersiva tiştan bi awakî berbiçav nedida, ku ez li nav û dengê dunyayê nedigeriyam, ku min nedixwest xwe bi pêş ve bixista û ew yek di warê bazirganiyê de tiştekî pir kambax bû. Piştî van gotinan ez vergeriyam ser karê xwe. Min nedixwest dilê wî bihişta, lê min nizanîbû çima min ê jiyana xwe bida bi jiyaneke din. Dema ez baş li ser vê pirsê ramiyam, min dît ku bi rastî ez ne mirovekî dijî jiyana xwe bûm. Dema ez xwendevan bûm, min dilê xwe bi gelek tiştan xweş dikir lê dema min ji

ber bêgaviyê dev ji xwendinê berda, min zû nas kir ku ew hemû daxwaziyên zaroktiyê bi rastî tiştine vala û bêrûmet bûn.

Êvarê, dema ez ji kar derketim, Marie li ber devê derî li bendî min bû û wê ji min pirsî ka min dixwest ew bikira. Min got ku ev yek ji bo min wekhev bû û ku, eger wê bixwesta, me dikarîbû hev bikira, çima na. Wê xwest bizanîbûya ka min jê hezdikir û, wek ku berê carekê min lê vegerandibû, min got ku ew yek tiştekî bêmane bû, lê bêguman min jê hez nedikir. Wê wê gavê pirsî: "Na xwe çima tu ê min bikî eger dilê te di min de tune?" Min jê re got ku ew yek ji binî ve bêrûmet bû û eger dilê wê bixwesta, me dikarîbû ew daxwaz bi cih bikira, çima na. Ma ne wê bi xwe ew yek dixwest û ma ne min jî tenê digot erê? Wê wê gavê xwest ji min re rohnak bikira ku hevdu anîn tiştekî pir mezin bû. Min lê vegerand û got "Na." Wê demekê nema dengê xwe kir û bêdeng li min nêrî. Paşê wê car din dengê xwe kir. Wê tenê dixwest bizanîba eger jineke din di şûna wê de eynî wê daxwazê ji min bikira gelo min ê bigota erê. Min got: "Helbet" Bi vê bersiva min wê ji min re got ku wê bi rastî nizanîbû ka wê ji min hez dikir an na û min bi xwe nikarîbû di şûna wê de bersiva vê yekê bida. Em navberek din wilo bêdeng man, paşê wê bi dengekî nizim, di nav diranên xwe de got ku bi rastî ez mirovekî seyrî xerîb bûm û ku bêguman ji ber wê yekê, wê ji min hez dikir, lê rojekê jî bêguman ji ber wê yekê belkî min ê bihişta ku ruhê wê ji min biçûya. Min nizanîbû çi bigota û min dengê xwe nekir. Wê bi destê min girt û bi ken ji min re got ku wê dîsa jî dixwest min ew bianiya. Min vegerand ku kengî dilê wê bixwesta me dikarîbû ew yek bikira. Min jê re behsa pêşniyariya xwedanê karê xwe kir û wê ji min re got ku wê dixwest Parîs bi çavê serê xwe bidîta. Min jê re got ku berê ez demekê li Parîsê mabûm. Wê ji min pirsî Parîs çawa bû. Min lê vegerand: "Parîs gemarokî ye. Ew tije kevok û hewşên reş e. Pûsta şeniyên wê spî û kal e."

Paşê em derketin ji xwe re geriyan. Me da ser cadeyên mezin û em di nava bajêr re derbas bûn. Jinên derketibûn ji xwe re li ser ca-

dan dimeşiyan xweşik bûn û min ji Marie pirsî ka wê yekê bala wê dikişand. Wê got erê wê dizanîbû û got jî ku wê ez fêm dikirim. Me herduyan demekê nema dengê xwe kir. Lêbelê min dixwest ku ew bi min re bima û jê re got ku me dikarîbû bi hev re li bal Céleste şîv bixwara. Dilê wê hebû ne ku tunebû lêbelê karekî wê hebû. Nêzîkî malê min xatir jê xwest. Wê li min nêrî û got: "Ma tu naxwazî bizanibî karê min çi ye?" Min helbet dixwest, lê nehat bîra min min jê bipirsiya û wilo jî xuya bû wê gazin ji wê yekê dikir. Gava wê li ser rûyê min dît ku min nizanîbû çi bigota û zimanê min ketibû hev, ew dîsa keniya û wê hemû laşê xwe ber min ve anî û lêvên xwe ji bo dayîna ramûsanekê dirêjî lêvên min kirin.

Min şîva xwe li bal Céleste xwar. Min dixwar gava jinek kinik û seyr derbasî hundirê xwaringehê bû û ji min pirsî ka wê dikarîbû li ber masa min rûnişta. Wê helbet dikarîbû. Dema wê xwe tevdigerand livên wê hişk bûn û di rûyêkî biçûkî wek sêvê de çavên wê diçirisandin. Wê çakêtê xwe ji xwe kir, rûnişt û bi dilgermî nêrînên xwe di ser navê xwarinan re di kartê de gerandin. Wê bang Céleste kir û bi dengekî qube seraser hemû babetên xwarinên xwe helbijart. Hêna sêniya pêşîn nehatibû wê çentê xwe vekir, kaxezek biçûk î çarqorzî û qelemek resas derxist û wê hesab kir wan xwarinan ê çiqas pere bikirana. Paşê wê ji çentê xwe kîsikê peran derxist û tev bexşîşê wê ew perên hanê danîn ser masê. Di wê gavê de, sêniya pêşîn jê re hat û wê bi lez ew daqurtand. Li bendî xwarina serekî, wê dîsa çentê xwe vekir, qelemk resas î şîn û kovareke derxist. Wê kovarê bernameyên radioyê ên hefteyê dida û wê jinikê bi dîqet xaçeke biçûk li ber piraniya wan bernameyan çêkir. Kovar ne biçûk bû, duwanzdeh pelî bû û wê ew karê hanê bi eynî wê diqetê berdomand û xwarina xwe jî di ber re dixwar. Min xwarina xwe tev kiribû û wê hêna bi wê dîqetê xaçikên biçûk li pêşiya navê bernameyên xwe datanî. Paşê ew ji nişkê ve rabû ser xwe û, bi wan tevger û livên xwe ên hişk, wê çakêtê xwe li xwe kir û derket. Ji ber ku tu karê min tunebû û nizanîbû min ê çi bikira, ez jî derketim û min texne-

kê da dû. Wê li ser kêleka rê bi lezek mezin û bi awakî jixwebawer diçû bê ku li dora xwe bineriya an rêya xwe xwar bikira û ez ecêbmayî mam. Dawiya dawîn ew ji ber çavên min ket û ez li ser şopa xwe vegeriyam. Min ji xwe re got ku ew jinika hanê seyrî xerîb bû, lê min ew piştî bêhnikekê ji bîr kir.

Kalê Salamano li ber devê deriyê min bû. Min ew derbasî hundir kir. Wî ji min re da nasîn ku kûçikê wî av û av çû bû. Ew çûbû polîsxanê, li hewşa kûçikên windabûyî li kuçikê xwe geriyabû lê ew peyda nekiribû. Kesên li wê derê kar dikirin jê re gotibûn ku belkî ew di bin çerxên trumbêlekê de hatibû perçiqandin. Wî pirsî ka wî dikarîbû ew yek li polîsxanan binasiya lê wan karmendan lê vegerandibûn ku perçiqandina kûçikan li polîsxanan ne dihat qeydkirin ji ber ku ew tişt her roj diqewimî. Min ji kalê Salamano re got çima wî ji xwe re kûçikekî din peyda nedikir, lê wî rast got dema ji min re da xuyakirin ku ew hînî kûçikê xwe bûbû.

Ez li ser qelavîzkan li ser textê xwe rûniştibûm û Salamano li ser sendeliyekê li ber masê rûniştibû. Li hember min wî herdu destên xwe danîbûn ser çogên xwe. Kumê wî yê ji kulavekî kevn li ser serê wî bû û wî di ber xwe de, di bin simbêlên xwe ên zerbûyî de tiştine digot lê min nizanîbû wî çi digot. Ez hinekî jê aciz dibûm lê tu karê min tunebû û xewa min jî nedihat. Ta ku ez bêdeng nemama, min jê pirsine li ser kûçikê wî kirin. Wî ji min re got ku piştî mirina jina wî wî ew kûçik anîbû bal xwe. Di xortaniya xwe de, kêfa wî pir ji tiyatroyê re dihat, wî dixwest derketa ser sahnê û di piyêsan de bilîsta. Gava wî leşkeriya xwe dikir, wî di leqê xwe de di piyêsên kenawer ên li ser jiyana leşkeriyê dilîst. Lê wî karek di şerîketa trên û rêyên hesinî de peyda kiribû û ne poşman bû ji ber ku bi saya wî karî, wî anuha her meh perene hindik distandin û xwediyê bazniştineke biçûk bû. Wî kêfxweşî û bextewerî bi jina xwe re nedîtibû, lê bi awakî giştî, ew hînî wê bûbû û jiyana xwe wilo pê re derbas dikir. Piştî mirina wê, wî gelekî xwe bi tenha serê xwe dîtibû. Wî rojekê ji hevkarekî kargeha xwe cewrikek xwestibû û xwedî kiribû. Wî ew bi

şîrê şûşa devmemikî şîr dabû û mezin kiribû. Lê ji ber ku seh ji mirovan zûtir mezin dibin, ew wilo jî bi hev re pîr bûbûn. Salamano ji min re got: "Cirra wî bi xwe pir nexweş bû. Car caran ez û wî em diketin qirika hev, lêbelê dîsa jî ew kûçikekî nesêle bû." Min got ku kûçikê wî ji tuxmekî baş, ji reheke kûçikên xweşik bû û Salamano bi vê yekê pir kêfxweş xuya kir. Wî berdomand: "Xwezî te ew bidîta berî ku ew nexweşî lê peyda bûbûya! Bi rastî tiştê herî xweşik di wî de pirça wî bû." Ji roja ku ev nexweşiya çerm li kûçik ketibû, Salamano her sibeh û her êvar merhem di laşê wî gişî de dida. Lê di baweriya wî de, nexweşiya rast ya kûçik pîrbûyîn bû û herkes dizane ku dermanê pîrbûyînê tune."

Di wê gavê de ez bawîşkî bûm û kalê Salamano xwest rabûya ser xwe û biçûya. Min jê re got ku wî dikarîbû hêna bimaya û ku ez li ber windabûna kûçikê wî diketim. Wî min spas kir, ji min re got ku dayê gelekî ji kûçikê wî hez dikir. Dema wî behsa wê dikir, wî jê re digot "Rebena diya te". Wî got ku ez gelekî li ber mirina diya xwe diketim û ku ji ber wê mirinê ez gelekî xemgîn bûm, lê min dengê xwe nekir. Wî wê gavê ji min re bi lez û bi diltengî got ku wî dizanîbû ku di taxê de xelqê rastiya min baş nizanîbûn. Wan şaş ez hukum kiribûm çima min diya xwe xistibû mala pîran, lê wî bi xwe baş dizanîbû ez çawa bûm û dizanîbû ku min gelekî ji dayê hez dikir. Ez nizanim çima lê min lê vegerand ku ta wê gavê min ji binî ve nizanîbû ku di tarê de behsa min bi nepakiyê dibû. Min rave kir ku çareya mala pîran çareyek di ciyê xwe de bû ji ber ku perên min î wilo pir tunebûn ta min ji bo dayê nexweşnêrek bigirta. Min berdomand: "Paşê çawa bûya, ji mêj ve wê nizanîbû çi ji min re bigota û ew tenê aciz dibû." -"Erê, wî got, li mala pîran bi kêmanî mirov dikarin ji xwe re hevalan bibîne." Paşê wî bexşîn û buhurîn ji min xwest. Wî dixwest razaya. Jiyana wî anuha hatibû guhertin û wî nema dizanîbû ê çi bikira çi nekira. Ew cara yekemîn bû ku wî destê xwe ji nişkê ve bi lez dirêjî destê min kir. Min destê xwe da destê bi qaşirên zivir. Ew hêna neçûbû dema hinekî di ber xwe de keniya:

"Ez hêvîdar im ku vê şevê kûçik wê nereyin. Ez herdem bawer dikim ku ew kûçikê min e wilo direye."

## VI

Yekşemê ez bi zehmetiyek mezin ji nav ciyan rabûm û ta ku Marie bang min nekir û milê min nehejand, ez heşyar nebûm. Me xwirîniya xwe nekir ji ber ku me dixwest em zû têketana avê. Canê min giran bû û hinekî jî serê min dêşiya. Cixara min di korta devê min de tameke tal û nexweş dihişt. Marie li rûyê min nêrî û henekê xwe bi min kir ji ber ku wê digot ku yê li min bineriya wê bigota" ez ji nav goran dihatim". Wê kirasekî ji cawekî spî li xwe kiribû û porê xwe berdabû. Min jê re got ku ew xweşik bû û ew ji kêfa keniya.

Em daketin û me li deriyê Raymond xist. Wî deriyê xwe venekir û bi dengekî bilind got ku ew li ser derketinê bû. Ji ber ku ez westiya bûm û bi ser de jî me depên li ser pencerên odê venekiribûn, gava em derketin roka ku bilind bûbû li ser cadê mîna sîlakê li rûyê min da. Marie ji kêfa dihat bifiriya, hema xwe çenk dikir û digot dunya xweş e dunya xweş e. Min xwe hinekî çêtir dît û bala xwe dayê ku ez birçî bûm. Min ew yek ji Marie re got lê wê çentê xwe yê cawê şimakîrî pêş min kir. Wê çekên me ên ji bo ketina avê û destmalek xistîbûn hundirê wî çenteyî û bi wê yekê xwest bigota ku wext ne wexta xwarinê bû. Ez bêçare bûm xwe ragirim û me dengê Raymond kir wî deriyê xwe li paş xwe digirt. Wî şerwalekî şîn û gomlikekî spî bi zendikên kurt li xwe kiribû. Wî kumekî ji qeselan jî xistibû serê xwe û kenê Marie bi wî hat. Bazendên destên wî spî û bi mûyên reş bûn û dilê min hinekî ji wan mûyan û wê pûsta spî li hev ket. Bi daketina xwe wî difikand û ew pir kêfxweş dixuya. Wî ji min re got:"Merheba birako " Salut, vieux", û silav li Marie kir tenê got "Mademoiselle".

Roja çûyî, em çûbûn bal polîs û li wê derê min şahidî kiribû ku wê keça hanê Raymond "pîs" kiribû. Bi şahidiya min tiştek di situ-

kura Raymond de nema lêbelê hişdariyek jê re hat kirin ku careke din wî tiştekî wilo nekira. Polîs li rastî û nerastiya gotinên min paşê negeriya. Li ber derî, me bi Raymond re deng kir û paşê me biryar da ku em li otobûsê siwar bin. Perava deryayê ji me ne pir dûr bû lê bi otobûsê em ê zûtir bigihaştana. Raymond digot ku hevalê wî ê kêfxweş bibûya eger em wilo zû bigihaştana bal wî. Em li ser çûnê bûn dema Raymond ji nişka ve îşareteke da min û ji min xwest ku min li pêşiya xwe bineriya. Min birrek Ereb dîtin pişta xwe dabûn pêşiya dukana pakêtfiroşiyê. Wan bi awê xwe wilo bêdeng li me dinerîn weke ku em li ber çavên wan ne kêm ne zêde kevirên bêruh an darên mirî bûn. Raymond ji min re got ku yê duduyan li ser destê çepê mêrikê wî bû û diltengî li ser rûyê wî eşkere bû. Di serê wî de ew çîrok gerek tev bûbû û nizanîbû yê din li wê derê çi dikir. Marie xweş tê nedigihaşt û ji me pirsî çi mesele bû. Min jê re got ku ewan Ereban bela xwe difiroştin Raymond. Wê xwest ku em yekser ji wê derê dûr bikevin. Raymond di ci de xwe kenand, xwe rast kir û bi wî kenî got ku gerek bû me bilezanda.

Rawestegeha otobûsê ne pir dûr bû û me berê xwe da wê. Raymond ji min re got ku Ereban nedidan dû me. Min li paş xwe nêrî û dît ku ew ji ciyê xwe neliviyabûn û, bi eynî wê sersariya xwe, wan li dera em jê çûbûn dinerîn. Em li otobûsê siwar bûn û Raymondê wê gavê bêhnfireh xuya dikir, henek dikirin û dixwest kenê Marie bianiya. Min bala xwe dayê ku kêfa wî jê re dihat, lêbelê Marie guh lê nedikir û bi serê zimanê xwe lê vedigerand. Car carna wê bi ken lê dinerî.

Em li dorbajarê Cezayirê peya bûn. Perava avjeniyê ji îstegeha otobûsê ne dûr e lê dîsa jî gerek me deşteke biçûk di wê navberê de bibiriya û paşê me xwe bi kaşê wê deştê re ber bi kêleka avê berda. Li ser rûyê wê erdê pir kevirên bi rengekî zere hebûn û kulîlkine spî di bin wî asmanê şînî sayî de bêtir spî dikirin. Marie sebra xwe dianî çentê xwe yê ji cawê şimakirî bi hêz li kulîlkan dida û pelikên wan belawela dikir. Em di nav rêzên xaniyan re derbas bûn, xaniyine bi

perçînên kesk û spî pêçandî. Hin ji wan vîllayan tev balkonên xwe di nav darên gezê de winda bûbûn û hin jî di nav keviran de rût û tazî bûn. Hêna em negihaştibûn qiraxa wê deştê deryayek aram û bêliv ji me re xuya bû. Li dûranî çiyayekî qelafetê serê xwe berdabû nav ava zelal û di xew re çûbû. Dengekî hûr, dengê motorê keştiyekê di nav bêdengiya wê hawîrdorê de li ber guhê me ket û piştî wî dengî li dûr ve, li ser rûyê wê ava şeweqdar, me keştiyek masîvaniyê dît. Ew keştî wiqasî hêdî hêdî diçû ku mirov bawer dikir ku ew ji ciyê xwe nediliviya. Marie çend sosinên tehtan dan hev. Berî ku me xwe di wî kaşî de berda xwarê û em ber bi deryayê daketana, me dît ku hingê li kêleka avê berî me çend melevan hebûn.

Hevalê Raymond di kulbekî ji textan de li dawiya peravê dima. Xanî pişta xwe dida tehtan, berê xwe dida deryayê û sitûnên wî ên textînî di nav avê de bûn. Raymond em bi hev dan nasîn. Navê hevalê wî Masson bû. Ew mêrikekî têra xwe dirêj bû û ji navteng û navmilên xwe wek çiyakî bû. Jina wî kinikî girover û qenc bû bi zarava şêniyên Parîsê dipeyivî. Wî di ci de ji me xwest em ciyên xwe xweş bikin û got ku masiyên ku di sibeha wê rojê de wî girtibûn ji bo me li ser agir bûn. Min jê re got ku min gelekî mala wî xweşik didît. Wî li min vegerand ku wî hemû rojên şemî û yekşeman û rojên bêkariyê lê derbas dikir. Wî gotina xwe ajot û got: "Bi kevaniya xwe re. Em baş li hev dikin". Kevaniya wî jî bi xwe wê gavê bi Marie re dikeniya û wilo jî ew belkî cara yekemîn bû di temenê min de ku ez fikirîm bi rastî bibim xwedî jin û mal.

Masson dixwest têketa avê, lê jina wî û Raymond ne dixwestin bihatana. Em her sê daketin û Marie xwe negirt yekser xwe avêt nav avê. Min û Masson me xwe hinekî giran kir. Ew hêdî dipeyvî û min bala xwe dayê ku xuyekî wî hebû çi digot wî piştre lê zêde dikir û digot: "Ez ê bêtir bêjim " bê ku bi rastî tiştek li naveroka hevoka xwe zêde bikira. Dema ew li ser Marie axifî wî got: "Ew dilbir e, ez ê bêtir bêjim ew dilerevîn e." Paşê min nema guh li vê yekê kir û xwest laşê xwe bida ber xweşiya germa wê rokê. Xîzê dest pê kiribû

di bin nigên me de germ dibû. Dilê min pir hebû min xwe biavêta nav avê lêbelê min xwe ragirt ta ew daxwazî xurtir bibûya û, gava min nema bi xwe karîbû, min ji Masson re got: "Em herinê?". Min xwe li ser serî berda binê avê. Masson bi bêhna fireh da nav avê, dest bi ajnê kir dema nigên wî nema gihaştin binê avê. Wî li ser zik, bi hawê beqan, avjenî dikir lê diyar bû wî baş bi avê nizanîbû. Avjeniya wî wiqasî pox bû ku min ew li paş xwe hişt. Min xwe gihand Marie. Av sar bû û ez bi kêf bûm ku min ajnê dikir. Ez û Marie em baş dûr ketin û me bala xwe dayê ku livên me di nav avê de û kêfxweşiya me jî wekhev bûn.

Dema em ji qiraxa avê baş dûr ketin, me ji xwe re bi lîstika depê li ser rûyê avê lîst. Min rûyê xwe ber bi asmanan ve dikir û wilo jî rokê perdeyên tenik yên wê ava ku li ser rûyê min diket devê min dida alî. Me dît ku Masson ber bi peravê vedigeriya ta xwe di bin rokê de li ser xîzê dirêj bikira. Qelafetê wî ji wê dûraniyê ji me re wek çiyakî xuya dikir. Marie xwest ku me bi hev re ajnê bikira. Ez ketim pişt wê û min destê xwe li newqa wê gerand. Wê bi hêza zendên xwe av qelaşt û min alîkariya wê kir nigên xwe li avê da. Dengê çelpeçelpa nizim di sibeha wê rojê de da dû me ta ku min nema dikarîbû. Wê gavê, min kemera Marie berda. Min bêhna xwe xweşik sitand û berda û bi melevaniyek nerm ez vegeriyam. Li ser kenarê deryayê min xwe bi ser zik li kêleka Masson dirêj kir û min rûyê xwe xist nav xîzê. Min jê re got: "av xweş bû" û baweriya wî bi xwe jî wilo bû. Marie Pîştî min bi bêhnikekê ji nav avê derket û berê xwe da me. Min xwe avêt ser piştê ta lê bineriya çawa nêzîk dibû. Laşê wê ji ber ava derya têrxwê giş demûşî bû û wê porê xwe bi paş ve avêtibû. Wê kêleka xwe bi ya min ve kir û herdu germayan, germa laşê wê û germa rokê pencên xwe bi nermî avêtin ser çavên min.

Marie min hejand û ji min re got ku Masson vegeriyabû malê û ku wext wextê firavînê bû. Ez ji nêza ketibûm, û dema bû behsa xwarinê, ez di cî de rabûm ser xwe. Lêbelê wê gavê Marie ji min re

got ku ji sibehê de min ew maç nekiribû. Ew yek rast bû li gel ku dilê min di wan maçan de hebû. Wê got: "Were di nav avê de". Me bazda û di nav pêlên biçûk ên pêşîn de xwe dirêj kir. Pîştî çend gazan di nav avê de wê laşê xwe bi laşê min zeliqand. Wê rahnên xwe li dora rahnên min birin û anîn û dilê min bijiya wê.

Li vegerê dengê Masson hat bang me dikir. Min got ku ez gelekî birçî bûm û wî di cî de ji jina xwe re got ku kêfa wî ji min re dihat. Nan xweş bû û min para xwe ya masî kir çend gep û bi lez daqurtand. Piştî masî goşt û petatên raqelanî hatin. Me gişa bêdeng dixwar. Masson baş şerab bi ser xwe de dikir û bê rawestan piyala min dadigirt. Dema bû dora qehwê, min bala xwe dayê ku serê min hinekî giran bûbû û min gelek cixare jî kişandin. Min û Masson û Raymond me hersiyan biryar da ku em hemû meha tebaxê ango havîna paşîn bi hev re li kêleka wê avê derbas bikin û tiştê li me biketa her yekî ê para xwe bidaya. Marie ji nişka ve ji me re got: "Ma hayê we ji saetê heye çend e? Saet tenê yanzde û nîv e". Em giş mat man û Masson wê gavê got ku me gelekî zû firavîna xwe xwaribû, lêbelê ew yek tiştekî xwezayî bû û kengî mirov xwe birçî dibîne ji xwe ew saet saeta firavînê ye. Ez nizanim çima lê kenê Marie bi wan gotinan hat. Ez bawer dikim wê têra xwe vexwaribû û serê wê xweş bûbû. Masson ji min pirsî ka dilê min hebû ez bi wî re li ber peravê hinekî li ser xwe bigeriyama. "Piştî firavînê jina min herdem xwe dirêj dike. Kêfa min bi xwe ji vî tiştî re nayê. Piştî firavînê gerek e ez li ser xwe bigerim. Ez herdem jê re dibêjim ku ji bo sihetê çêtir e mirov piştî xwarina nîvro li ser xwe bigire. Lê ew bi kêfa xwe ye." Marie xwest bima û alîkariya Xanima Masson bikira firax bişuşta. Parîsiya bejnkinik got ku ji bo wê yekê gerek wê berdaya mêran û wilo jî em hersê daketin.

Tîrên rokê te digot yekser xwe bi ser xîza peravê de berdidan xwarê û şewqa wê li ser rûyê deryayê awir dibirrî, çavên mirovan kwîr dikir. Kesek li ser xîza peravê nemabû. Li hawîrdor û jora wê deştê dengê sênî û kevçiyan ji hemû xaniyên biçûk dihat. Erd wek

sêlek sincîrî bû û wexma jê derdiket bêhna mirovan diçikand. Di destpêkê de, Raymond û Masson li ser tiştinan û li ser kesinan peyivîn ku min bi xwe ew nas nedikirin. Paşê min fêm kir ku wan ji mêj ve hevudu nas dikirin û ku demekê jî bi hev re di malekê de mabûn. Em ber bi avê çûn û me da ser tixûbê xîz û avê û em meşiyan. Car caran pêlek ji pêlên din mezintir dihat û pêlavên me ên ji caw şil dikir. Hayê min ji tiştekî tunebû û roka ku li serê min î serqot dida pencên xewê davêt ser çavên min.

Ez wilo çav li xew bûm gava Raymond tiştekе ku xweş negihaşt guhê min ji Masson re got. Lê di wê kêlîkê de ez çav li du Ereban ketim. Ew li dawiya peravê bûn û hêna baş ji me dûr bûn. Ew herdu Ereb bi çekên taybetî bûn ên karkerên ku agir di tenûr û firnan de dadidan û ew bi aliyê me de dihatin. Min li Raymond nêrî û wî ji min re got: "Ew e." Me meşa xwe berdomand. Masson nizanîbû wan çawa dabûn dû me û ta wê derê hatibûn. Min ji xwe re got ku hebû nebû wan bêguman dîtibûn ku em bi çentên avjeniyê li otobûsê siwar bûbûn, lê min dengê xwe nekir û bersiva Masson neda.

Ereban li gel ku hêdî hêdî dimeşiyan ew baş nêzîk bûbûn. Me meşa xwe neguherand, lê Raymond got: "Eger hat û pevçûn çêbû, Masson tu here yê din. Ez bi xwe ji mêrikê xwe re dizanim. Meursault, eger yekî din hat, ji xwe ew ji te re ye." Min got: "baş e" û Masson destên xwe xistin bêrîkên xwe. Xîza sincirî anuha li ber çavên min sor dixuya. Bi gavine wekhev em nêzîkî Ereban dibûn û ew navbera hanê hin bi hin kêm bû. Dema çend gavine hindik di navbera me de man, Ereb rawestiyan. Min û Masson me payên xwe giran kirin û me xwe li paş hişt. Raymond seraser ber bi mêrikê xwe ve çû û xweş negihaşt min çi jê re got, lê yê din xwest bi serê xwe poşek lê bixista. Bi wê yekê jî Raymond dest pê kir lê xist û di cî de gazî Masson kir. Masson ber bi mêrikê xwe ve çû û bi hemû giraniya qelafetê xwe du mişt lê da. Yê din bi ser dev çû xwarê û di nav avê de gevizî. Ew çend kêlîkan wilo ma, peqpeqok ji devê wî derdiketin û li dora serê wî diteqiyan. Raymond di wê gavê de li yê xwe

da û rûyê wî di nav xwînê de hişt. Wî berê xwe ber bi min ve kir û got: "Tu ê bibînî ez ê çi torê bi serê wî bikim". Min bi qîrîn lê vegerand: "Hayê te jê hebe kêr pê re heye!" lêbelê hîna min temam nekiribû ku kêrê destê wî vekiribû û devê wî qelaştibû.

Masson xwe bi pêş ve zer kir ta bi hawara Raymond biçûya, lê Erebê din rabibû ser xwe û xwe xistibû pişt xwediyê kêrê. Me ji ber kêrê newêribû xwe nêzîk bikira û herdu Ereban wilo jî bê ku çavên xwe ji çavên me derxistana hêdî hêdî paşûber vekişiyan û wan bi wê kêrê navbera hanê firehtir dikirin. Dema ew têra xwe ji me dûrketin, ewan revî revî bazdan û di cî de ji ber çavên me ketin. Piştî windabûna wan em di bin germa rokê de bêliv man û Raymond hema bazûyê destê xwe bi destê din diguvaşt û dilopên xwînê ji wî bazûyî dihatin xwarê.

Masson di cî de got ku textorek rojên şemiyan dihat wê nêzîkahiyê û Raymond xwest seraser biçûya bal wî. Her ku wî gotinek digot xwîna ji birîna devê wî dihat peqpeqok çêdikirin. Me bi milê wî girt û em bi lez û bez vegeriyan mala Masson. Li wê derê, Raymond got ku birînên wî ne dijwar bûn û wî dikarîbû bi tenha xwe biçûya bal textor. Ew bi Masson re çû û ez bi herdu jinan re mam û min ji wan re got çi bûbû. Kevaniya Masson digiriya û Marie ruh tê de nemabû. Ez bêçare bûm ji wan re wê çîroka hanê bêjim lê paşê min nema dengê xwe kir. Min çixarak vêxist û ji xwe re li deryayê nêrî.

Nêzîkî saet yek û nîvê, Raymond û Masson vegeriyan. Paçek li destê Raymond girêdayî bû û perçak benda çespdar li kêleka devê wî bû. Textor jê re gotibû ku ne tiştek bû, lêbelê Raymond dîsa gelekî bi keder dixuya û rûyê wî hatibû girtin. Masson xwest qerf û henek pê re bikira, kenê wî baniya lê dîsa tu deng ji Raymond derneket. Dema Raymond got ku ew ê ber bi peravê daketa, min jê pirsî ew ê bi kuderê biçûya. Wî li min vegerand ku wî dixwest hinek ba ji ber serê xwe berda. Min û Masson me xwest ku em bi wî re derketana lê wê gavê ew pir hêrs bû û gotinên ne xweş ji me re kir. Masson got ku ya baş ew bû me dev jê biqeriya, me bihişta wî li gor

dilê xwe bikira, lêbelê min dîsa jî da dû Raymond.

Em texnekî li ser peravê meşiyan. Rok anuha pir bi tîn bû û tîrêjên wê li ser xîzê û li ser rûyê deryayê dişikestin û belav dibûn. Pêşî min bawer kir ku Raymond dizanîbû bi kuderê diçû, lê paşê min xweş nas kir ku ev baweriya min ne di ciyê xwe de bû. Li dawiya peravê em dawîya dawî gihaştin ber çavkaniyeke biçûk. Ava wê çavkaniyê di nav xîzê re diherikî û li paş zinarekî mezin ber bi deryayê diçû. Me dît ku herdu Erebên me li wê derê bûn. Wan xwe bi çekên xwe ên rûnavî li ser wê erdê dirêj kiribûn. Yê ku li wan bineriya ê bigota hayê wan ji bayê felekê tunebû û ew bêdeng û aram dixuyan weke ku wan hinekî dilên xwe hênik kiribûn. Hatina me tiştek ji tevgera wan neguherand û yê ku kêr li Raymond dabû bêdeng li Raymond nêrî. Yê din li zileke biçûk dixist û li me dinêrî. Wî tenê sê deng ji wê bilûrê derdixstin û bê ku çavên xwe biqurmiçandana, ew her sê dengên hanê hema vedigerandin.

Di wê demê gişî de, tiştên ji wê hawîrdorê man ew rok bû, ew bêdengî bû, ew dengê hûr yê çavkaniyê û ew her sê dengên bilûrê bûn. Raymond destê xwe dirêjî bêrîka demançê kir lê yê din ne liviya û wan wilo jî herdem li hev dinêrîn. Min bala xwe dayê ku pêçiyên nigên yê ku li bilûrê dixist pir ji hev dûr bûn. Raymond bê ku awirên xwe ji dijminê xwe bişkendanda ji min pirsî: "Ma tu çi dibêjî? Ez wî daxînim?" Min bala xwe dayê ku eger min bigota na ew ê hêrs bûbûya û bêguman wî ê demançe berda wî. Min tenê jê re got: "wî hêna ji te re tiştek negotiye. Ne xweş e hema tu wilo bi wî biteqînî." Dengê hûr yê avê û bilûrê di kezeba wê bêdengiyê û wê germê de dîsa gihaştin me. Paşê Raymond got: "Baş e, ez ê herim gotinên dijûnî jê re bidim û eger ew devê xwe veke, ez ê wî daxînim." Min lê vegerand: "ya rast ev e. Lêbelê eger ew kêrê nekişîne, nabe tu demançê berdê." Raymond wê gavê hinekî germbû. Yê din herdem li bilûrê dixist bi yê pêşîn re baş bala xwe dida tevgerên Raymond. "Na, min ji Raymond re got. Wek mêran herê û ka demançê bide min. Eger yê din dengê xwe bike, an kêra xwe bikişîne,

ji xwe ez ê wî daxînim."

Dema Raymond demança xwe da min, şewqa rokê di ser hesinê wê re şemitî û demançê biriqand. Lê em di ciyê xwe de bêliv man wek ku her tiştî dora me zeft kiribû. Bêyî ku yekî ji me awirên xwe bişikenda me li hev dinêrî û her tişt rawestiyabû, her tişt di nava deryayê, xîzê, rokê, herdu bêdengiyan, bêdengiya bilûrê û ya avê de rawestiyabûn. Wê gavê min ji xwe re got ku du tişt li pêşiya me hebûn, me dikarîbû biteqanda an neteqanda. Lê ew herdu tişt bi rastî wekhev bûn û mirov nikarîbû bigota ku yek ji ya din çêtir bû. Ji nişka ve, herdu Ereban paşûber xwe vekişandin û xwe avêtin paş wî zinarî. Ez û Raymond jî wilo em li ser şopên xwe vegeriyan. Wî hinekî çêtir xuya dikir û behsa otobûsa vegerê kir.

Min ta xaniyê biçûk yê Masson da tengala wî û ew bi pêlikên ji text hildikişiya gava ez li ber pelika pêşîn rawestiyam. Ji ber germa rojê zingînî ji ber guhê min dihat û min di xwe re nedît bi wan pelikan hilkişim û dîsa jî çîrokê ji herdu jinan re bêjim. Lê germa wiqasî xurt bû ku min nikarîbû jî li ser wê pelikê wilo bêliv di bin barana awirbirr de bimama. Wekhev bû ez li ser wê pelikê bimama an bi derine din biçûma. Piştî demekê, ez ber bi peravê vegeriyam.

Rok di zikê asmanan de asê bûbû û agirê jê dipijiqî dunya li ber çavên mirovan sor dikir. Bêhna pêlên biçûk ên avê diçikiya û deryayê bi helkehelk ew pêl li ser pişta xwe dikirin û ew digihandin ser xîza peravê. Ez hêdî ber bi zinaran dimeşiyam û min bawer dikir ku eniya min ji ber germa xurt ya rokê dinepixî û dihat belav bûbûya. Germayê dîsa hemû giraniya xwe berdida ser milên min û di rûyê min de dirawestiya. Her ku tîna wê germê li eniya min dixist, min çengoyên xwe bi ser hev de dişidandin, min germiştên xwe di bêrîkên şelwarê xwe de didan hev û diguvaştin. Rokê serxweşiyek tîr berdida canê min û min hemû laşê xwe dişidand ta ku min zora wê û wê serxweşiyê bibira. Her ku şûrek ronahiyê ji nav xîzê, ji qaqilekî spîbûyî an ji perçek şûşeke şikestî dipijiqî, min çengoyên xwe didane hev. Ez demeke baş dirêj meşiyam.

Ji dûranî qelafetê tarî yê tehta biçûk xuyanê kir. Şewqê û keldûmana deryayê dibûn tozeke awirbirr û xwe lê girtibûn. çavkaniya hênik li paş tehtê di bîra min de bû û min dixwest car din dengê xuşexuşa ava wê bikira. Min dixwest ji ber tînê xwe bida alî û zor li xwe bikira giriyê wan herdu jinan ji bîr bikira, erê min dixwest sî û xweşiya wê çavkaniyê peyda bikira. Lê dema ez nêzîktir bûm, min dît ku mêrikê Raymond vegeriyabû û li wê derê bi tenha xwe bû. Wî xwe li ser piştê dirêj kiribû, destên xwe xistibû paş hustwê xwe. Eniya wî di bin siya tehtê de bû û hemû laşê wî li ber germa rojê bû. Di nav wê germê de, keldûman ji çekên wî diçû. Ez hinekî veciniqîm. Ji bo min bi xwe, ew çîroka hanê çîrokeke kevn bû, û bê ku ew di bîra min de bûya, ez ji xwe re hatibûm wê derê.

Hema ew çav li min ket, wî di cih de hinekî xwe rast kir û destê xwe rada bêrika xwe. Min jî helbet demança Raymond ya di bêrîka çakêtê xwe de zeft kir. Wî wê gavê dîsa xwe bi paş ve kişand lêbelê destê xwe ji bêrîka xwe dernexist. Em baş ji hev dûr bûm û hêna deh duwanzdeh gavên mezin di navbera me de hebûn. Car caran min dizanîbû ku wî di nav palikên çavên xwe ên nîvgirtî de li min mêze dikir, lê sûretê wî di nav bayê sincirî de bêtir li ber çavên min dilerziya. Dengê pêlên deryayê ji nîro û şûn de qelstir û tembeltir bû. Rok ew rok bû û şewqa li ser wê xîzê ew şewq bû . Ji du saetan û şûn de, ew di asmanan de asê bûbû, ji du saetan wê mîna keştiyekê lengerê xwe berdabû nava ava deryayek ji hesinê keliyayî. Li ser milê asoyê dûr keştiyeke buxarî buhurî û min bala xwe dayê ku ji ber ku min herdem di bin çavan re li yê Ereb dinêrî herdem ew pitika reş li ber çavên min bû.

Min ji xwe re got ku eger ez tenê nîv fitlê li dora xwe bizîviryama, her tişt ê tev bûbûya. Lê ew perava sincirî ketibû paş min, wê min bi pêş ve dajot û wilo jî ez nezîvirîm. Min çend gav ber bi çavkaniyê avêtin. Yê Ereb neliviya û bi rastî ew hêna têra xwe ji min dûr bû. Ez baş nizanim lê belkî ji ber siya tehta li ser rûyê wî dilîst min bawer kir ku ew dikeniya. Min xwe ragit. Rokê anuha dest pê

kiribû rûçikên min jî dişewitand û dilopên xwêdanê di nav brûyên min de gihaştibûn hev. Roka wê rojê eynî roka roja vêşartina dayê bû û, wek wê rojê jî, eniya min bi taybetî dêşiya û hemû damarên min di bin pûsta bedena min de bi hev re lêdidan. Min nema ji ber şewatê kir der û ez ji ciyê xwe liviyam û bi pêş de çûm. Min dizanîbû ku ew kerîtiyek ji min bû, min dizanîbû ku ez ê bi wê pêşveçûnê ji wî agirî xelas nebûma, lê min gavek, tenê gavek bi pêş avêt û bi wê gavê yê Ereb bê ku rabûya ser xwe kêra xwe kişand û ew di bin şewqa rokê de da ber rûyê min. Ronahî li ser pola kêrê pijiqî, bû wek devê kêrek awirbirr hema li eniya min dida. Di vê gavê de hemû xwêdana di nav brûyên min de ji nişkê ve bi ser çermokên çavên min rijiya û mîna perdak şîrgermî û stûr li ber çavên min ma. Min li paş wê perdeya xwê û hêsiran nema ber xwe didît. Nema hayê min ji tu tiştî jî hebû, min tenê dizanîbû ku rokê bi senc û sêlên xwe ên sincirî eniya min dax dida û şûrê şewqdar yê ku ji kêrê dipijiqî herdem li ber rûyê min bû. Wî şûrê sorkirî mijankên min dikeritand û di çavên min ên dêşiyan de diçû xwarê. Di wê gavê de her tişt hejiya. Deryayê nefesek tîr û pir bi tîn bi xwe re anî. Ji min re wilo xuya bû ku asman bi hemû firehbûna xwe bûbû deriyekî vekirî û di wî derî re baranek ji pêtên şewatê bi ser rûyê erdê dibariya. Hemû canê min hate hev û min girmista destê xwe li dora destikê demançê guvaşt. Dîkê demançê sist bû û destê min li wî zikê şayik ket. Bi wê yekê, bi wê qurpîna hem hişk û hem pir xurt, her tiştî dest pê kir. Min xwêdan û rok hejand. Min nas kir ku min tewazina rojê wêran û berbad kir. Min xwe li ser wê peravê bextewer dîtibû û, bi wê qurpînê, min nas kir ku min bêdengiya awarte ya wê peravê dirrand. Wilo jî, min çar gullên din berdan wî laşê bêruh. Gulleyan bê ku xuya bikira di laş de diçûn xwarê. Ew her çar gulle wek çar carên kurt bûn ku min bi destê xwe li deriyê malwêraniyê dixist.

# Beşê Dudan

## I

Piştî girtina min di cîh de çend caran tehqîq bi min re hatin çêkirin. Lêbelê pirsên ku ji min dihatin kirin pirsine li ser nasîna min bûn û wan jêpirsînan gelekî dirêj nekirin. Cara pêşî li polîsxanê ji min re xuya dikir ku serhatiya min bala tu kesî nedikişand. Piştî heftiyekê ji girtina min, dadmendê jêpirsîn û vekolînê bi tersî gişan bi awakî fizûlî li min nêrî. Lê dema wî dest bi jêpirsînê kir, wî jî pirsa nav û navnîşana min kir, pirsî ku min çi kar dikir, ez li kuderê û kengî çêbûbûm. Paşê wî xwest bizanîba ka min ji xwe re parêzgerek helbijartibû. Min vegerand ku bi rastî min ew yek nekiribû û min pirsî ka bêyî wê yekê nedibû. wî pirsî: "çima?" û min vegerand ku serhatiya min pir sade bû, parêzger jê re nedivat. Ew wê gavê di nav lêvên xwe de keniya û wî got: "Ev yek dîtinek e, lêbelê qanûn qanûn e. Eger tu parêzgerekî ji xwe re nebînî, em ê bêgav bibin li ser berpirsiyariya xwe yekî ji te re peyda bikin." Min dît ku ew tiştekî pir baş bû ku dadmendiyê ev kitekit û karûbarên hûrik davêt ser milê xwe û min ev yeka hanê jê re jî got. Wî li min vegerand ku gotinên min di cîhê xwe de bûn û gihaşt wê netîcê ku qanûn bi zanebûn û dûrbînî hatibûn sazkirin.

Di destpêkê de min rûmeteke wilo zêde neda tevgera wî. Wî ez xistim odakê bi perdan rapêçandî. Wî ji min xwest ku ez li ser sendeliyek bi destik rûniştama. Li ser nivîsgehê lempak hebû û wê lempê ronahiya xwe tenê bi ser serê min û sendeliyê xwar dikir. Dadmendê vekolînê bi xwe di nav tariya odê de bû. Min teswîrek weha

di pirtûkan de xwendibû û hebûna me wilo di wê odê de ji min re mîna lîstikekê xuya bû. Lêbelê gava hevpeyvîna me tev bû, min dest pê kir bi awakî cihê lê mêze kir, min dît ku ew mirovekî bi dem û lêvine lihevhatî bû. Ew bejindirêj bû û çavên wî ên şîn di kortên xwe de hinekî çûbûn xwarê. Mûyên spî di nav simbêlên wî ên dirêj de pir bûn û porê serê wî gij bû, tiştek jê re nemabû bi giştî spî bûbûya. Min dadmend mirovekî gelekî aqilmend dît û li gel ku di rûyê wî de rehinan lêdidan û dora devê wî hinekî xwaromaro dikirin, bi kurtî, min ew qenc û dilsoj dît. Gava derketinê, min wextî destê xwe dirêjî destê wî bikira, lê Xwedê kir di wê gavê de hat bîra min ku min mirovek kuştibû û ew yek nedibû.

Li zindanê dotira rojê, parêzgerek ji bo min hat. Ew kinikî girover bû, hêna têra xwe gênc bû û wî porê xwe bi çermê serê xwe rastî şayik kiribû. Li gel ku dunya germ bû (ez bi xwe bi tena qemîs bûm) wî destek çakêt û şelwarê tarî bi ser qemîsekî bi gerdena guhikên şikenandî li xwe kiribû û grafêtek seyr bi rêzine pehn reş û spî li qirika xwe girêdabû. çentê wî di bin çengê wî de bû û wî ew çente danî ser textê min, xwe bi min da nas kirin û got ku wî dossiera min xwendibû. Doza min ne hêsan bû, lêbelê eger min pişta xwe bi wî rast bikira û baweriya xwe bi wî bianiya, ji xwe şika biserneketinê ji binî ve nediket dilê wî. Min ew sipas kir û wî ji min re got: "De ka em di cî de têkevin dilê dozê."

Ew li ser text rûnişt û wî ji min re rohnak kir ku dadgehê di vekolîna xwe de agahî li ser jiyana min ya kesane dabûn hev û wê dizanîbû ku diya min ne ji mêj ve li wargeha pîran miribû. Wilo jî li Marengoyê bi xwe jî pirs li ser min hatibûn kirin. Bazpirsên dadgehê têgihaştibûn ku çi ye ne çiye di roja veşartina dayê de "min nîşanên sersarî û bêhîsiyê dabûn xuya kirin". Parêzgerê min got: "Bi rastî hinekî bi min ne xweş tê ku ez van tiştan ji te bixwazim. Lê ev pir girîng e. Eger ez nikaribim bersiva vê yekê bidim, ev yek ê di destê dadyarê dadgehê de bibe peyt û îsbateke mezin li dijî te." Wî ji min xwest ku min alîkariya wî bikira û pirsî ka wê rojê ez xemgîn bûm.

Vê pirsê hişt ez ecêbmayî bimînim û ez bawer dikim ku eger min ew ji kesekî bikira min ê ji ber xwe şerm bikira. Lê min lê vegerand ku ji mêj ve min nema pirs li ser hîs û dilgermiyên xwe ji xwe dikir û loma jî min nikarîbû tu agahî bigihandana wî û alîkariya wî bikira. Bi xwe ne ku min ji dayê hez nedikir, lêbelê mana wê hezkirinê tunebû. Hemû kesên spîsax rojekê ji rojan di dilê xwe de pir an kêm mirina kesên li ber dilên xwe şîrîn dixwazin. Dema min ev gotinên hanê ji parêzger re gotin wî nema xwe girt, gotina min birrî û gelekî bêhnteg xuya kir. Wî hişt ez sozê bidim wî ku ez tiştên wilo roja danişţina dadgehê an li pêşiya dadmendê dadresiyê nebêjim. Lê min jê re rave kir ku xuyê min wilo bû, ku daxwazên laşê min zora hîsên min dibirin û dihiştin ku ew hîs piraniya caran tevlihev bibin. Roja veşartina dayê, ez pir westiyayî bûm û xewa min dihat. Ji ber wê yekê, min bîr nedibir çi li dora min dibû an nedibû. Tiştê ez jê serrast bûm ew bû ku min bêtir dixwest ku dayê nemira. Dilê parêzger hênik nebû û ji min re got: "Ev yek ne beş e."

Ew di ber xwe de ramiya. Paşê wî ji min pirsî ka wî dikarîbû bigota ku wê rojê min zora hîsên xwe ên xwezayî biribû û ew eşkere nedikirin. Min got: "Na, ji ber ku ev tişt ne rast e." Wî bi şêweyekî seyr li min mêze kir weke ku dilê wî hinekî ji min li hev biketa û, weke ku wî bi wê yekê dixwest hinekî min bêşanda, wî bi engirîn got ku min bixwesta nexwesta serdebîr û karmendên mala pîran ê bihatana şahidiyê û "vê yekê dikarîbû tore bi serê min de bianiya." Min bala wî kişand ser wê yekê ku tu pêwendî di navbera vê çîrokê û doza min de tunebûn, lê wî tenê li min vegerand ku eşkere bû ku tu carî berê karê min û dadgehan bi hev neketibû.

Parêzgerê min ji bal min bênteng rabû. Min bi rastî dixwest bi milê wî bigirta û jê re rave bikira ku min dixwest kêfa wî ji min re bihata, ne ta ku li ber dadgehê wî ez çêtir biparastama, lê hema wilo ji ba Xwedê. Min dizanîbû ku min ew bêhnteng dikir. Ew di min de nedigihaşt û wilo jî dilê wî hinekî ji min dima. Min dixwest jê re bipeyitanda ku ez wek herkesî, erê wek vê alemê gişî bûm. Lê bi

rastî ev tiştên hanê giş bê fêde bûn û ji ber tembelî û sersariyê min tiştek nekir.

Hinekî paşê, ez dîsa çûm ber destê dadmendê jêpirsînê. Saet duduyê piştî nîvro bû û perdên di nivîsgeha wî de nikarîbûn di rûyê ronahiya xurrt de bimana. Hundirê odê gelekî germ bû. Wî hişt ku ez rûnim û bi zimanekî şîrîn ji min re got ku parêzgerê min "Ji ber sedemekê ji nişka ve li ber wî peyda bûbû" nedikarîbû bihata. Lêbelê mafên min hebû ku min bêyî wî bersivên pirsên wî nedana. Min got ku min dikarîbû bêyî parêzgerê xwe jî bersiv bidana. Wî li ser masa ber xwe tiliya xwe danî ser bizmika zengilekî eletrîkî û bi wê yekê, tendnivîsekî (bayganekî) ciwan derbas bû û pir nêzîkî pişta min rûnişt.

Me ciyên xwe di sendeliyên xwe ên bidestik de xweş kir û jêpirsînê dest pê kir. Wî pêşî ji min re got ku dema dibû behsa min dihat gotin ku ez miroveki bêdeng û dûrî civatê bûm û xwest bizanîba min çi digot. Min vegerand ku "Erê ji ber ku tiştekî min wilo balkêş tune ez bibêjim, loma ez dengê xwe nakim." Dadyar wek cara pêşîn dîsa di ber xwe de keniya û got ku rast bû eger tiştekî mirov tunebe mirov bêje wê gavê ji bêdengiyê çêtir tune. Wî gotina xwe ajot: "Leyse, ev tişt yeckar bê bêqîmet e." Wî nema dengê xwe kir, li min nêrî, pişta xwe rast kir û ji nişkê ve bi dilgermî ji min re got "Tiştê ku ji bo min bi qîmet e û bala min dikişîne tu yî". Ez xweş tênegihaştim wî çi dixwest bigota û min dengê xwe nekir. Wî berdomand: "Tiştine di tevgera te de hene hişê min wan nakişîne. Ez ji te bawer im ku tu ê alîkariya min bikî wan ji min re rave bikî". Min lê vegerand ku serhatiya min bi xwe gelekî sade bû. Wî bi keftekeft xwest min jê re behsa wê roja hanê bikira. Min ew tiştên ku berê min jê re behs kiribû dîsa bi rêz kir: ez li ser Raymond, peravê, avjeniyê, car din li ser peravê, çavkaniya piçûk, li ser rokê û her pênc gullên demançê bi kurtebirrî peyivîm. Her ku hevokek ji devê min derdiket wî digot: "Baş e, baş e". Dema ez gihaştim ser laşê li ser erdê ramidandî, wî dîsa serê xwe bi erêyî xwar kir û got "baş e". Ez

bi xwe ji dubarekirina vê çîrokê westiya bûm û min bawer kir ku di hemû temenê xwe de min tu carî berê wek wê carê wiqasî dengê xwe nekiribû.

Dadmend demekê bêdeng ma, paşê rabû ser xwe û ji min re got ku wî dixwest alîkariya min bikira, ku min bala wî dikişand û ku bi alîkariya Xwedê, wî ê tiştek ji bo min bikira. Lê pêşî wî dixwest dîsa çend pirs bikirana û ji nişkê ve ji min pirsî ka min ji diya xwe hez dikir an na. Min vegerand: "Erê, wek vê alemê gişî". Tundnivîsê ku bi bêhna fireh û li dû hev li mekîna xwe ya nivisandinê dixist bi wê gotina min xwe şaşomaşo kir û tiliyên xwe bêguman li şestiyne çewet da. Wî xwe hinekî winda kir û bêgav bû paşûber li nivîsa xwe vegeriya. Bêyî ku mentiqekî berbiçav di nav wan pirsan de ji binî ve hebûya yê dadmend wê gavê ji min pirsî ka min ew her pênc gullên demançê li ser hev berdabûn an na. Ez ramiyam û min jê re xweş rave kir ku pêşî, min tenê gulleyek teqand û piştî wê bi çend saniyan, min her çar ên din berdan. Wî pirsî: "çima tu di navbera gulla pêşîn û ya dudyan de mayî?" Bi wê pirsê, dîsa perava sorbûyî li ber çavên min xuya bû û dîsa wê roka sincirî li eniya min da. Min dengê xwe nekir û di wê bêdengiyê de dadmend li bendî bersiva pirsa xwe di nava xwe de dicoşiya. Ew rûnişt û bi bêhntengî wî bi tiliyên xwe porê serê xwe li hev da. Wî enîşkên xwe danî ser nivîsgeha xwe, xwe hinekî ber bi min ve xwar kir û bi şêweyekî seyrî xerîb ji min pirsî: "Çima? çima te ew gulle berdan laşekî bê ruh li ser axê ramidandî" Min wê gavê jî nizanîbû çawa bersiva wî bida û dadmend destên xwe di ser eniya xwe re bir û bi dengekî ku ji ber bêhntengiyê tevlihev bûbû got: "Çima? Gerek e tu ji min re bêjî. çima?" Min jî herdem dengê xwe nedikir.

Paşê ew ji nişkê ve rabû ser xwe, bi gavine mezin wî berê xwe da dawiya nivîsgeha xwe û çavikek dolaba belgehan kişand. Wî xaçek ji zîv derxist û laşê Îsayê bi mîxan daliqandî bilind kir û ber bi min vegeriya. Wî bi dengekî hinekî lerzdar û guhertî got: "Ma tu vî mirovê hanê nas dikî, tu dizanî ew kî ye?" Min lê vegerand: "Erê, hel-

bet". Wî wê gavê ji kezebeke peritî ji min re got ku baweriya wî pir bi Xwedê dihat, ku li gor baweriya wî li ser rûyê erdê mirov çiqasî gunehkar bûya, Xwedê dibuhurî û ew dixist ber dilovaniya xwe. Lêbelê ta Xwedê di gunehê de bibuhuriya, gerek mirov ji dilekî rast tobe bikira. Dilê mirovê tobedar gerek mîna dilê zarokekî ji gunehan vala bûya ta hezkirina Xwedê xwe berda hundirê wî. Wî hemû gewdê xwe bi ser masê de xwar kiribû û xaç hema di ser serê min re dihejand. Bi rastî, min fêm nedikir wî çi dixwest bigota ji ber ku berî her tiştî, min germ bû û di wê nivîsgehê de mêşine mezin hebûn xwe li ser rûyê min datanîn û paşê, wî ez hinekî ji xwe ditirsandim. Min di eynî wextê de dizanîbû ku ew tiştekî ne di ciyê xwe de bû ji ber ku yê tawankar ez bûm, ne ew. Lê wî dîsa jî berdomand. Tiştê ku ez hinekî têgihaştim, ew bû ku di nêrîna wî de, di hemû pêhatin û îtirafa min de, tenê tiştekî nediyar hebû û ew tişt jî ew bû çima min gulla duduyan di cî de li dû ya pêşîn bernedabû, çima min xwe ragirtibû. Ji bilî vê yekê, hemû tiştên din baş bûn, pir baş bûn, tenê wî ev nuqte fêm nekir.

Min ê jê re bigota ku ew şaş bû hema ji ya xwe danediket çunki ev nuqta dawîn ne wiqasî giring bû. Lê ew rabû ser xwe, wî rê neda min, hemû qelafetê xwe bi ser serê min xwar kir û ji bo cara dawîn, bi kelecan û meraq ji min pirsî ka baweriya min bi Xwedê dihat. Min got na û wilo jî ew bi qehrek mezin li ciyê xwe rûnişt. Wî ji min re got ku ew tişt ne mumkin bû, ku baweriya herkesî, ta wan kesên ku rûyên xwe ji Xwedê dûr dibirin jî, bi Xwedê dihat. Baweriya wî bi vê yekê wilo xurt dihat û eger biba û rojekê heyvanê şikê xwe berda dilê wî, ji xwe wê gavê tu mane ji jiyana wî ê nema. Wî bi dengekî bilind ji min re got: " Ma tu dixwazî ku jiyana min bêmane bibe?" Di baweriya min de ev ne karê min bû û min ew yek jê re got. Min hîna gotina xwe tev nekiribû gava min bala xwe dayê ku wî di ser rûyê wê masê re dest pê kiribû Îsayê li ser xaçê ber bi rûyê min dianî û bi rengdêreke neaqilane bi bilindî digot: "Ez ji can û dil file me. Ez ji viyê hanê bexşîn û lêbuhurînê ji bo gunehên

te dixwazim. Ma çawa tu dikarî bawer nekî ku ew ne ji bo te bû ew wilo êşiya?". Min bala xwe dayê ku wî di şûna "Hûnê" de ji min re digot "tu", lê ez hatibûm heta qirikê. Germa hundir hema dijwartir dibû. Wek hercara ku ez dixwazin ji yekî tev bibim, min ji dadyar re jî da xuyakirin ku tiştên wî digotin rast bûn. Ez wê gavê ecêbmayî mam ji ber ku wî bi serfirazî digot: "Te dît, te dît, te dît çawa baweriya te bi wî tê û tê xwe bispêrî wî?" Wê carê jî helbet wek carên din min got na. Gava min got na, ew bêçare dîsa bi ser sendeliya xwe ya bidestik hat xwarê.

Dadmend pir westiyayî xuya dikir. Wî bêhnikekê dengê xwe nema kir û di bêdengiya wê bêhnikê de mekîna nivîsandinê ya tu carî ji dû hevpeyvînê neqetiyabû di wê navberê de da dû gotinên dawîn. Paşê wî bi baldarî û bi hinek xemgînî li min mêze kir û bi dengekî nizim di ber xwe de got: "Min tu carî dil wek dilê te wilo hişk nedîtine. Tawankarên heta anuha hatine ber destên min herdem li ber vê wêneya renckêşiyê hêsirên wan bariyane." Min wextî lê vegeranda û bigota ku ew digiriyan ji ber ku tawankar bûn. Lê min ji xwe re got ku ez jî yekî wek wan bûm. Ez tawanbarek bûm lêbelê min dikir û nedikir min nikarîbû bi rastî xwe wilo bidîta. Dadmendê jêpirsînê wê gavê rabû ser xwe weke ji min re bigota ku jêpirsîn tev dibû. Wî bi eynî wê bêgaviyê tenê ji min pirsî ka ez poşman dibûm. Ez ramiyam û min got ku bi rastî pirs ne pirsa poşmanbûyînê bû lê bi awakî min dikarîbû bigota ez ji ber hinekî aciz bûm. Eşkere bû wî ji min fêm nedikir. Wê rojê tiştan ji wilo pê ve dirêjtir nekirin.

Piştî vê yekê, min gelek carên din dadmendê jêpirsînê dît lêbelê her carê parêzgerê min bi min re bû. Tiştên ji min dihatin xwestin tenê ew bû ku min çend pitik ji agahiyên ku berê min dabûn ronaktir bikirana. An jî, carinan dadyar bi parêzgerê min re li ser tuhmên li ser min diketin dipeyivîn. Lê bi rastî di wan gavan de tu carî kesekî guh li min nedikir. Hin bi hin rengdêra jêpirsînan hate guhertin û min bala xwe dayê ku yê dadyar nema guh li min dikir û di serê xwe de bi awakî bersiva doza min dabû û ew avêtibû ser refikan. Wî

nema ji min re behsa Xwedê kir û min tu carên din ew di kelecana wê roja pêşîn de nedît. Dawiya dawîn jî danûstandinên me xweştir û dilgermtir bûn. Carinan,tenê çend pirsên biçûk ji min dihatin kirin, hinek axiftin bi parêzgerê min re dibû lê bi rastî jêpirsîn ji mêj ve tev bûbû. Wek ku yê dadyar bi devê xwe digot, doza min dabû ser rêya xwe û ber bi dawiya xwe diçû. Carinan jî, dema axiftin diçû ser tiştên giştî, wan rê didane min û ez jî beşdarî axiftinê dibûm. Dawiya dawîn bêhna min hate ber min û kesekî nepak di wan saetan de bi min re tunebû. Her tişt wilo bi şêweyekî xwezayî û bi hêsanî dibuhurî, her tişt bi pîvan bû û her yekî bi giranî û bi zanebûn bi karê xwe radibû. Wilo jî di nava min de hîsek neaqilane peyda bû ku "ez jî yek ji malê bûm". Jêpirsînînan yanzdeh meh kişandin û piştî wê demê gişî, ez hinekî ecêbmayî dimînim ku tenê tiştekî di wan mehan de kêfa min dianî. Ew tişt jî ew bû dema dadmend bi min re dihat ber devê derî. Wî bi henekî destê xwe li milê min dida û digot: "îro bes e, axayê Decalê dijî-Îsa." Piştî wan deqên xweş li ber devê derî, ez diketim nav destên cendirman.

## II

Tiştine hene min tu carî nexwestiye behsa wan bikim. Dema ez ketim girtîxanê, min piştî çend rojan nas kir ku ez ê tu car nexwazim behsa wan bikim.

Lêbelê hinekî derengtir, min nema qîmet ji wan tiştan re dît ta ku ez behsa wan nekim. Di rojên pêşîn de, min bi rastî xwe mîna zindaniyekî nedidît û min xwe radigirt wek ku ez li bendî bûyerine nû bûma. Lê piştî serlêdana Marie ya yekemîn, tenê wê gavê her tiştî dest pê kir. Ji roja ku nama wê gihaşt destê min (Wê di nama xwe de digot ku mafê wê tune bû bihata serlêdana min ji ber ku em ne jin û mêrê hev bûn) ji wê rojê de, selûla min ji min re bû mal û min nas kir ku jiyana min li wê derê radiwestiya. Roja pêşîn dema ez ha-

tim girtin, ez ketim odakê û di wê odê de berê çend girtî hebûn piraniya wan Ereb bûn. Gava ew çav li min ketin ew keniyan û paşê ji min pirsîn min çi kiribû ta ku ez hatibûm girtin. Min li wan vegerand ku min yekî Ereb kuştibû û bi wê yekê ew di ciyê xwe de sar man. Piştî demeke ne dirêj êvar ket û wan pêş min kirin min ê çawa berra xwe ya ji zilan ji bo razanê raxista. Mirov dikarîbû seriyekî wê berrê hinekî li hev bipêçanda û ew ji xwe re bikira balgeh. Şevê gişî sîsik di ser rûyê min re çûn û hatin. Piştî çend rojan ez bi tenha xwe ketim selûlek din û di wê selûlê de textekî textînî ji bo razanê hebû. Di wê oda biçûk de satilek ji bo destavê û leganek hesinî ji bo serçav şûştinê jî hebûn. Zindan li jora jorîn ya bajêr bû û di paceyeke biçûk de min dikarîbû derya bidîta. Rojekê min wilo destên xwe li mîlên ser paçê guvaştibûn û min rûyê xwe ber bi rojê ve biribû gava pasebanek buhurî hundir û ji min re got ku hinin hatibûn serlêdana min. Min ji xwe re got hebe nebe ew Marie bû û bi rastî jî ew derket.

Min berê xwe da ciyê hevdîtinê. Ez ketim dalanekê û piştre ez bi çend pelikan hilkişiyam û car din ketim dalanekê. Ez derbasî ewyaneke pir fireh bûm ronahiya wê ji pencereke pir mezin dihat. Du derabeyên hesinî mezin ew eywan bi dirêjayiya wê dikirin sê perçên ji hev cihê. Di navbera herdu derabeyan de deh duwanzdeh gavên mezin hebûn girtî û kesên dihatin dîtina wan ji hev dûr dixistin. Ez çav li Marie ketim û ew bi kirasê xwe yê xetxetî û rûyê xwe yê sorî qemirî li hember min bû. Li aliyê min neh deh girtî hebûn û piraniya wan Ereb bûn. Li aliyê din jî giş Ereb bûn û Marie ketibû navbera du jinan. Yek ji wan herdu jinan pîreke hûrik bû lêvên wê bi ser hev de guvaştî bûn û çekên rêş lê bûn. Ya din jineke têra xwe girsî dagirtî bû, ew servekirî bû û bi dengekî pir bilind diaxifî û gelekî xwe tevdida. Ji ber wê navbera di nava herdu derabeyan de gitrî û kesên ku dihatin serîlêdana wan bêgav dibûn bi dengekî pir bilind bi hev re deng bikin. Dema ez derbasî odê bûm, qîrînên bilind li bin guhên dîwarên mezin û tazî diketin û vedigeriyan û ronahiya

xurt ya ji asmanan bi ser caman re dibariya û di hundirê eywanê de çavên mirovan kwîr dikirin ez hinekî gêjomêjo bûm. Selûla min ji wê derê bi gelekî bêdengtir û tarîtir bû. Min zû bi zû der û dora xwe ji hev dernexist lê piştî çenk kêlîkan çavên min hînî wê deverê bûn û wê gavê hemû rûyên li hember min di ronahiya rojê de pir xweş hatin xuyakirin. Min bala xwe dayê ku li dawiya wê eywanê û di navbera herdu derabeyan de pasebanekî zindanê rûniştibû. Piraniya girtiyên ereb û kesên ji malbatên wan ên hatibûn serlêdana wan li ser qelavîzkan li hember hev rûniştibûn. Ew ên wilo rûniştibûn nedikirin qîrîn û tevlî wê qerebalixa xurt, ew bi dengekî pir nizim bi hev re dikirin kurtepist û ji hev fêhm dikirin. Kurtepista wan dibû wek zummînekê û di bin qîrîna kesên şipya de dibû wek zummîna aleta awazbumê. Ez ber bi Marie diçûm dema van tiştan zû bala min kişandin. Marie xwe hingê bi derûpencerê ve leziqandibû û ta jê dihat dibişirî. Min ew pir xweşik dît lê min nizanîbû çawa ew yek jê re bigota.

"Ha?", wê bi dengekî pir bilind ji min pirsî. "Wek tu dibînî" - Tu baş î, tiştek ji te re ne lazim e? - Na, her tiştên min hene."

Me nema dengê xwe kir û Marie dibişirî. Jina qelawî stûr berê xwe bi mêrê li kêleka min dikir û qîreqîra wê bû. Ew mêrikê hanê bêguman mêrê wê bû mêrikekî kej î dirêj û bi nêrînek saf û sade bû. Xuya bû wan ji mêj ve dest bi axiftinê kiribûn û jinikê bi dengekî ta Xwedê dabûyê xurt dikir qîrîn û berdomand: "Jeanne nexwest wî li ba xwe bihêle. Mêrik digot: "Erê, erê". "Min jê re jî got ku piştî ku tu bêyî berdan tu ê dîsa wî bibî ba xwe, lê wê nexwest wî bi xwe bigire."

Marie jî ji aliyê xwe kir qîrîn û got ku silavên Raymond ji min re hebûn û min got: "Spas". Min got "Spas" lêbelê dengê min di nav dengê cîranê min de windabû. Wî cîranî dixwest bizanîbûya "Ka ew ne nexweş bû". Jina wî keniya û got: "Ew tu carî ji wilo baştir nebûye". Mirovê li milê min yê çepê xortekî hûrik bi dest û tiliyine nazik bû û wî dengê xwe nedikir. Min bala xwe da wê pîra hûrik li

hember wî. Min dît ku wê jî dengê xwe nedikir û wilo jî wan herduyan hema bi awakî kwîr li hev dinêrîn. Min nikarîbû bala xwe xweş bida wan ji ber ku di wê navberê de Marie ji min re bi qîrîn got ku gerek min hêviya xwe nebirriya. Min lê dinêrî û got: "Erê". Min dixwest milê wê di bin kirasê wê de biguvaşta. Dilê min dibijiya wî cawê nerm î tenik û min nizanîbû min ê ji derveyî wî kirasî heviya çiyê din bikira. Ez bawer dikim ku Marie bi xwe jî dixwest ku min ê hêviya xwe ji wî kirasî nebirriya çûnki wê herdem bi ken li min dinerî. Ew dikeniya û tenê diranên wê ên dibiriqand û qermîçokên biçûk ên dora çavên wê ji min re hatin xuya kirin. Wê dîsa kir qîrîn: "Tu ê derkevî û em ê hevdu bînin!" Min lê vegerand: "Ma tu bawer dikî?" Min ev yek jê pirsî bi rastî tenê ta ez bêdeng nemama. Wê gavê wê bi lez û herdem bi dengekî bilind got ku erê, ku ez ê serbest bihatama berdan û ku dîsa em ê têketana avê. Lê jinika li kêleka wê dikir qîrîn û ji mêrê li kêleka min re digot ku wê selikek li qelema dadgehê ji bo wî hiştibû. Wê her tiştên di selikê de bi nav kir û hijmart. Gerek bû ku mêrê wê xweş bineriya ka tiştek ji selikê ne kêm bû ji ber ku her tişt buha bûbûn. Cîranê min yê din û diya xwe bêdeng li hev dinêrîn. Kurtepista Erebên rûniştî di nav nigên me re berdewam dikir. Li derve, ronahiya rojê li ser pencera mezin te digot dinepixî û bi ser rûyên wan kesan de mîna şîraveke nû dirijiya.

Min xwe hinekî nerehet didît û dilê min hebû ez ji wê derê derketama. Ez ji ber wê qerebalixa xurt dêşiyam lêbelê Marie li wê derê bû û hebûna wê bi min xweş bû. Ez nizanim çiqas wext di wê navê re bêtir buhurî. Marie herdem bi bişirîn ji min re behsa karê xwe kir. Kurtepistîn û qîrîn tevlihev dibûn. Di wê dera tevlihev de tenê warek, tenê giravek ji bo bêdengiyê mabû û ew jî li kêleka min bû di nêrînên wî xortê hûrik û pîra diya wî de bû. Paşê hin bi hin pasebanan ew Ereb ji wê derê derxistin û bi derxistina mirovê pêşîn re piraniya kesên li wê derê nema dengê xwe kirin. Pîrejina hûrik xwe nêzîkî mîlên hesinî kir û di eynî gavê de, pasebanekî ji lawê wê

re îşaretek da jê xwest ew rabûya. Xort got: "Bi xatirê te, dayê" Pîrê destê xwe di nav du mîlan re dirêj kir û hêdîka demeke dirêj ew destê xwe livand.

Ew çû di eynî wê gavê de ku miroveki kumê wî di destê wî de derbas dibû û diket şûna wê. Pasebanan zindaniyek derbas kirin û wan herdu mirovan bi germî, lê ji ber ku ew eywan aram û bêdeng bûbû ew bi dengekî nizim bi hev re axifîn. Paşê bû dora cîranê min yê milê rastê. Ew jî gerek biçûya û jina wî weke ku hayê wê jê nebû ku ew dengê bilind di wê aramiyê de nema giring bû wê bi qîrînî got: "Baş li xwe miqate be û bila hayê te ji te hebe ha." Paşê dora min hat. Marie bi lêv û destên xwe ji min re maç şandin. Berî ku ez bi giştî ji wê eywanê derketama, min li paş xwe nêrî. Marie di ciye xwe de bêliv mabû û eynî ew bişirîna mezin li ser rûyê wê bû.

Pir wext di wê navberê de derbas nebû dema wê ji min re nameyk şand û ji wê namê û vir de wan tiştên ku min nedixwest behsa wan bikim dest pê kirin. Lêbelê ez naxwazim tiştan di serê xwe de mezin bikim û bi rastî ev yek ji bo min ne zehmetir bû ku ji bo yekî din. Di destpêkê de dema ez hatim girtin, tiştê herî zehmet ji bo min ew bû ku fikir û daxwaziyên min hêna yên kesên azad bûn. Wek nimûne ez bêjim, dilê min dibijiya ku min xwe li ser peravê bidîta û min berê xwe bida avê. Dema min di serê xwe de dengê pêlên pêşîn di bin hevêsa payên xwe de çêdikir, dema min didît çawa laşê min av diqelaşt, dema min didît çawa ez bi wê yekê kêfxweş dibûm, ez ji nişkê ve pê dihesiyam çiqasî dîwarên zindana min nêzîkî hev bûbûn. Vê yeka hanê çend mehan dirêj kir lê paşê, fikir û tevgerên min bûn yên hemû zindaniyan. Her roj ez di hewşê de li ser xwe digeriyam û wilo jî ez li bendî wê saetê an li bendî saeta hatina parêzgerê xwe dimam. Min dizanîbû çawa wextê xwe yê mayî pir baş dûzan bikira. Min gelek caran di serê xwe de ji xwe re got ku eger ez bêçare bibûma di qurmê darek hişk de bijiyama, û ji bilî mêzekirina li gula asmanê di ser serê xwe re tiştekî din tunebûya, ez ê hin bi hin hînî wê yekê bûbûma. Ez ê li hêviya firîna firendeyan di

ser serê xwe re bimama, ez ê li bendî ewrên ku tevlihev dibûn bimama wek çawa wê demê, li wê derê, ez li hêviya girafatên seyr ên parêzgerê xwe dimam û wek ku çawa berê, di dunyak din de, min xwe ta roja şemiyê radigirt ta laşê Marie li ser sînga xwe biguvaşta. Wilo jî gava min bala xwe xweş didayê, ez ne di qurmê dareke mirî de bûm. Kesin din hebûn rewşa wan ji ya min gelekî kambaxtir hebû. Ew fikra hanê bi xwe ya dayê bû û wê gelek caran digot ku mirov dawiya dawîn hînî her tiştî dibe.

Ji bilî vê, rewşa min li wê derê kêm zêde wek berê bû. Mehên pêşîn zehmet bûn lê min li ber xwe da û wê berxwedanê hişt ew derbasbibin. Wek nimûne ez behs bikim, dilê min dibijiya jinekê û nebûna wê ez dêşandim. Ew tişt gelekî xwezayî bû ji ber ku ez xort bûm. Ez bi taybetî bi Marie tu carî nedifikirîm lê bi jinekê, bi jinan, bi hemû jinên ku min nas kiribûn û ez bi wan re razabûm ez difikirîm. Wilo jî rûyên wan û dilxwaziyên min hundirê selûla min tije dikirin. Wan fikran bi regekî dihiştin ku ez xwe winda bikim lê bi rengekî din, wan dihiştin ku wext derbas bibûya. Pasebanê serok di wextê belavkirina xwarinê bi garsonê aşxanê re derbas dibû selûlê û navbera me xweş bûbû. Rojekê wî ji ber xwe ve ji min re behsa pirsa jinan kir. Wî ji min re got ku dema girtiyan gazin dikirin wan berî hertiştî gazin ji vê yekê dikirin. Min jê re got ku ez jî wek wan bûm û ku di nêrîna min de, ev yek neheqiyek bû li me dibû. Wê gavê wî got: "Ma ne ji bo vê yekê bi xwe ku mirov dikevin zindanan ta ku ji dunya jinanan bêpar bibin." Min got: - Çawa? Ji bo vê yekê? - Erê ji bo vê yekê. Ma ne azadî ev e. Di zindanê de hûn ji jinan, ji azadiyê bêpar dibin." Min berê yekcar bîra vê yekê nebiribû. Min wilo jî heq dayê: "Rast e, ma ku ne ev be mana sezayê ê çi be? - Erê, tu tiştan fêm dikî, yên din na. Lê dawiya dawîn ew hîn dibin xwe bi xwe dilê xwe hênik dikin." Paşê yê paseban çû.

Derdê cixaran derdekî din bû. Dema ez ketim girtîxanê, kemerbenda min, qeytanên solên min, grafata hustuya min û her tiştên di bêrîka min de, bi taybetî cixarên min, ji min hatin standin. Dema

ez ketim selûla xwe, min doza cixarên xwe kir, lê ji min re hat gotin ku ew tişt qedexe bû. Rojên pêşîn bi min pir zor bûn û belkî ji ber kurmê cixarê jî ruh di min de nema. Min ji depê textê xwe yê razanê tîjik radikirin û ew dimijandin. Rojê gişî ez dilvereşî bûm. Ziyana cixaran yekcar li tu kesî tunebû û min nizanîbû çima wan pasebanan ez bê cixare dihiştim. Piştî demekê, min nas kir ku ev yek jî perçek ji azar û renckirina girtiyan bû. Lê dema ez bi ser vê rastiyê ve bûm, min nema bêriya cixaran dikir û ev renckirina hanê nema ji bo min renckirin bû.

Ji bilî van serêşan, ez ne wiqasî bêkêf bûm. Dîsa jî pirs ew bû min ê çawa wextê xwe bikuşta. Ji dema ez fêr bûm çawa tiştan bi bîra xwe bînim, ez nema aciz bûm. Carinan min oda xwe dianî bîra xwe û di serê xwe de ji qorzîkekê dest pê dikir û dîsa ez vedigeriyam eynî ciyê xwe. Min dest pê dikir û her tiştên li ser rêya xwe bi nav dikir. Pêşî, min gera xwe zû tev dikir. Lê her ku min ji nû ve dest pê dikir, ez di gera xwe de demek dirêjtir dimam. Min hemû esbabxanên odê dianîn bîra xwe û di her esbabxaneyê de her tiştên di hundirê wê de, û ji her tiştê di hundirê wan de hemû kitekitên wan û ji bo kitekitên wan jî nîşanek li ser, derzek biçûk, û kêlekek hinekî birînbûyî, rengên wan an jî celeb û texlîtên wan min dianîn bîra xwe. Di eynî wextê de, min nedixwest rêya xwe di nava tiştan de şaş bikira, ne tiştek ji bîr bikira. Piştî girtina min bi çend hefteyan, min dikarî qeyametek wexta xwe tenê bi hejmartina tiştên di oda xwe de derbas bikira. Wilo jî her ku ez li ser tiştan hûr dibûm wiqasî jî tiştên ku berê nedihatin bîra min an ji bîra min çûbûn vedigeriyan û ciyên xwe di serê min de çêdikirin. Min wê gavê nas kir ku mirovê ku tenê rojekê li ser rûyê erdê mabe dikare, bê zehmetî, sed salî di zindanê de bimîne û bîranînên wê roja hanê wê têra wî bikin ta ku ew di zindana xwe de aciz nebe. Bi awakî, ev tişt ji bo min tiştekî nexerab bû.

Ji bo kuştina wextê xew jî hebû. Di destpêkê de, bi şev ez pir kêm û pîs radizam û bi rojê bi xwe xew ji binî ve bi çavên min nedi-

bû. Hin bi hin şevên min baştir bûn û ez bi rojê jî razam. Ez dikarim bêjim ku di mehên dawîn de ez di rojê de ji şanzdeh ta hîjdeh saetan radizam. Min ew her şeş saetên mayî bi xwarinê, bi çûna destavê, bi bîranînên xwe û bi çîroka mirovê çekoslovakî dikuştin.

Di navbera doşeka xwe ya ji pûş û depê textê razanê de, min bi rastî perçakî kevnî zerbûyî û pir tenik ji rojnamekê dîtibû û ew bi cawê doşekê ve hatibû leziqandin. Wê kaxeza rojnamê behsa biserhatinekê dikir. Destpêka çîrokê kêm bû lê bêguman ew çîrok li çekoslovakyayê qewimî bû. Mêrikekî ji gundekî çekî bar kiribû çûbû ji xwe re li malê dunyayê bigeriya. Piştî bîst û pênc salan ew dewlemend bûbû û bi jina xwe û zarokekî xwe re vegeriya bû wî gundê xwe. Ta bihişta ku dê û xuşka wî lê beheti bimana, wî jina xwe û lawê xwe li oteleke din hişt û bi tenha xwe vegeriya malê. Diya wî ew nas nekir û wilo jî wî bi henekan odak xwest û perene pir nîşanî dê û xuşka xwe kir. Di şevê de, dê û xuşka wî ji bo diziya peran ketibûn ser wî û ew bi çakûçan kuştibûn û laşê wî avêtibûn çem. Dotira rojê, jina wî hatibû û, bê ku bizanîbûya çi bi serê mêrê wê hatibû, wê ji dê û xuşka wî re rastiya wî rêwiyî gotibû. Dayê xwe daliqandibû û xuşkê xwe bi saxî avêtibû binê bîrê. Min ev çîroka hanê ez dikarim bêjim bikêmanî hezar carî xwend. Ji aliyekî ve, ew çîrokek dûrî aqilan bû û ji aliyekî din ve jî, ew gelekî xwezayî û sade bû. Di dîtina min de ew mirina hanê hinekî di heqê wî rêwiyî de bû. Di baweriya min de jî mirov gerek tu carî wilo henekên xwe neke.

Wilo jî, bi saetên xewê, bi bîranîna tiştan, bi xwendina çîroka xwe û bi guhertina şev û rojê wext derbas bû. Min li derekê xwendibû ku di zindanê de mirov dawiya dawîn ji bîr dike wext çawa derbas dibe lê ev yeka hanê ji bo min tiştekî bêrûmet bû. Min berê bala xwe nedabûyê roj çiqasî dikarîbûn di eynî wextê de dirêj û kin bûna. Roj bêguman di jiyanekê de dirêj bûn, lê ew roj wilo vedizeliyan, diketin hundirê hev û di dawiya dawîn de tevlihev dibûn. Nav ji wan rojan re nediman, tenê peyvên "do" û "sibeh" hêna mana wan hebû.

Rojekê gava pasebanekî ji min re got ku pênc mehên min li wê derê çêbûbûn min jê bawer kir, lê min fêm nekir çi dixwest bigota. Di selûla min de, ji bo min, roj herdem rojek bû û wê rojê bê rawestan pêlên xwe ber bi min dajotin û tiştên ji min dihatin xwestin berdewam dikirin. Wê roja hanê, piştî çûyîna negehban, min di sêniya hesinî ya ku min tê de xwarin dixwar li xwe nêrî. Min bala xwe dayê ku li gel ku min dixwest bi sûretê xwe re bikeniyama rûyê min herdem cidî dima. Min sûretê xwe li ber xwe hejand û xwe kenand lê wî sûretî dev ji wî mirûzê hişk û xemgîn berneda. Roj ber bi dawiya xwe diçû û saet ew saeta hanê bû, ew saeta ku ez naxwazim behsa wê bikim, ew saeta bê nav, ew saeta ku dengên êvarê ji hemû qatan didan nav karwana bêdengiyê û zîz ber bi min ve heldikişiyan. Min xwe nêzîkî pacê kir û di ronahiya dawîn ya rojê de dîsa li sûretê xwe mêze kir. Ew herdem wilo cidî bû, lê çima ew ê ne wilo bûya ji ber ku ez bi xwe wê gavê wilo cidî bûm? Di eynî wê wextê de û ji bo cara yekemîn piştî wan mehên girtîxanê, dengê min xweş li ber guhê min peyda bû. Min ew dengê hanê di wan rojên hanê de ji mêj ve dibihîst û min nas kir ku di dirêjiya wan mehan de, ez bi xwe re, bi tenha xwe peyivîbûm. Wê gavê tiştê nexweşnêrê di roja veşartina dayê de gotibû hat bîra min. Na, tu çareser tunebûn û kesek nikare bawer bike an bîne ser ziman êvarên girtîxanan çi dijwar in.

## III

Ez dikarim bêjim ku bi rastî havînê pir zû ciyê havînê girt. Min dizanîbû ku bi hatina rojên pêşîn ên germê tiştekî nû ê ji bo min biqewimiya. Doza min di rûniştina dawîn ya dadgeha sezayê de hatibû qeyd kirin û ev rûniştina hanê di havîna pêşîn de tev dibû. Dadgehê di qiçîna germê de dest pê kir. Parêzgerê min dilê min xistibû cî û gotibû ku doza min eger pir dirêj bikira wê du an sê rojan bikişanda. Wî berdomandibû: "Dadgeh bi xwe ê bi lez di ser doza te re

here ji ber ku di nava serhatên rûniştinê de ne dozeke wilo balkêş e. Piştî te seraser doza bavkujekî ê dest pê bike."

Heft û nîvê destê sibehê, cendirme hatin dû min û trumbêla dorgirtî ez ajotim ber devê seraya dadiyê. Herdu cendirman ez derbasî hundirê odake girtî kirim. Em li kêkela deriyekî rûniştin û me xwe ragirt. Ji paş wî deriya hanê mirovan bang hev dikirin û dengên wan tev dengê sendeliyan û xirecireke mezin dibûn. Wan dengan û wê xirecirê cejnên tarê anîn bîra min dema konser teva dibûn û mirovan ji bo dîlanê sendelî didan alî û ew navber vala dikirin. Herdu cendirman ji min re gotin ku gerek bû me xwe li hêviya dadgehê ragirta. Yekî ji wan cixarak dirêjî min kir lê min ew cixare ji destê wî negirt. Paştî demeke kurt, wî cendirmî ji min pirsî "ka ez dilbitirs bûm". Min got na. Ez neditirsiyam û bi ser de jî, min bi rastî dixwest bidîta dadgeh çawa bû. Di hemû temenê min de keyseke wilo neketibû min û min ew yek ji yê cendirme re rave kir. Cendirmê duduyan li min vegerand: "Rast e, lêbelê dawî mirov jê diweste."

Piştî bêhnikekê bû çireçira zingelekî biçûk di hundirê eywanê de. Wê gavê cendirman destbend ji destên min derxistin. Wan derî ji min re vekirin û ez derbasî qefesa tawanbariyê kirim. Hingî kesên pir hatibûn rê û rêwanî di eywana dadgehê de nemabû. Li gel ku latikên penceran bi ser wan de kiribûn, tîrêjên rokê di derinan re derbas dibûn û germa hundir bêhna mirovan diçikand. Camên penceran girtî mabûn. Ez rûniştim û herdu cendirman yek li vî milî yek li milê din dora min girtin. Di wê gavê de ez li ber xwe çav li rêzek rûyê mirovan ketim. Wan rûyan hemûyan li min dinêrîn û min wilo jî nas kir ku ew kesên sondxwar bûn. Ez nikarim bibêjim çi di wan hemû rûyan de wek hev bû an ji hev cihê bû lê hebûna wan wilo li ber min tenê hîsek di serê min de çêkir: Min xwe wek di tramwayê de dît û li hember min, li ser textê pêşiya min ew rêwiyên nenas rûniştibûn û li bendî hilkişîna rêwîne nû bûn ta ku wan kesên kenawe ji nav wan derxistana. Ez xweş dizanim ku ew fikra hanê neaqilane û gelekî tewş bû ji ber ku bêşik eger ew li wê dadigehê li

tiştekî digeriyan ew li tawankaran digeriyan. Lêbelê ferqeke bi rastî wilo mezin di navbera kenaweran û tawankaran tuneye, û ez xweş nizanim çima lê ev fikra hanê di serê min de çêbû.

Min ji ber pirbûna mirovan di wê eywana girtî de hinekî xwe gêj kiribû. Min dîsa çavên xwe gerand û di nav wan hemû kesan de tu rûyî bala min nekişand. Ez bawer dikim ku di destpêkê de min fêm nekir ku ew merov giş tenê ji bo dîtina min hatibûn û ew dera hanê wilo dagirtibûn. Min fêm nedikir ji ber ku bi rastî kesekî guh li min û li kesê min nedikir û min nizanîbû çawa bawer bikira ku serê wê qiyametê gişî ez bûm. Min ji yê cendirme re got: "Çiqas xelk hatine!" Wî li min vegerand ku ew yek ji ber rojnaman bû û wî bi gotina xwe re birrek kes nîşanî min da li dora masakê li jêra rêza sondxwaran bûn. Wî ji min re got: "Wan e! Ji xwe re li wan biner!" Min pirsî: " Kî?" û wî dîsa got: "Rojname." Wî yek ji nav wan rojnamevanan nas dikir û wî rojnamevanî wê gavê li me nêrî û berê xwe da me. Ew mirovekî baş bi temenê xwe mezin bû, dilsoj û bi rûyekî hinekî naxoş bû. Wî bi dilgermiyek mezin destê cendirme di nav destê xwe de guvaşt. Min wê gavê bala xwe dayê ku hemû kesên li wê navê pêrgî hev dihatin, bang hev dikirin, bi hev re diaxifîn, weke ku ew giş endamên klubekê bûna û her yekî ji nav wan xwe bi kesên wek xwe, ji çîna xwe kêfxweş didît. Min nas kir çima ez pê dihesiyam ku ciyê min di nav wan de tunebû û min nas kir çima li wê derê ez hinekî wek mirovekî bi zora xwe derbasbûma bûm. Lêbelê yê rojnamevan dîsa jî bi bişirîn bi min re peyivî û got ku wî hêvî dikir ku her tişt ê baş ji bo min derbas bûbûya. Min ew sipas kir û wî gotina xwe berdomand: "Tu dizanî, me hinekî deng ji serhatiya te re çêkir. Di havînê de bazara rojnaman dişike. Bi ser de jî di nav hemû dozan de tenê ya te û ya mirovê bavkuj hêja bûn tiştekî." Wî paşê di nav koma ew jê derketibû mirovek nîşanî min da. Ew mirovekî kinik bû, wek mişkekî xûrma, rasûyekî ku tu bikî dermale wilo qutî dagirtî bû. Berçavokine pir mezin bi hawîrdorine reş li ber çavên wî bûn. Min nas kir ku ew şandeyê taybetî yê rojnameke ji Parîsê bû

"Ew bi xwe ne ji bo te hatiye. Lê ji ber ku ew ê li ser doza yê bavê xwe kuştiye seretayê binivîse, me jê xwest ew di eynî wextê de doza te jî bi telegrafê bişîne Parîsê." Wê gavê jî min kir jê re bigota spas lê min ji xwe re got ku bi wê yekê min ê kenê mirovan bi xwe bi-aniya. Wî bi destê xwe bi dilsojî îşareteke da min û dev ji me berda. Me dîsa çend deqên din xwe ragirt.

Parêzgerê min bi kirasê xwe yê parêzgeriyê bi komek hevkarên xwe re derbasî hundir bû. Wî berê xwe da rojnamevanan, destê xwe da wan. Wan bi hev re henekên xwe kirin, bi hev re keniyan û ji min re xuya bû ku kêfa wan hemûyan li cî bû. Ew wilo bi hev re man ta ku di hundirê eywana dadgehê de zingilekî lêda. Wê gavê her kes vegeriya ciyê xwe. Parêzgerê min berê xwe da min û destê xwe da min. Wî ji min xwest ku min bi kurtî bersivên pirsan bida û ku min ji ber xwe tişt zêde nekira. Ji bo tiştên din wî ji min xwest ku min pişta xwe bi wî xurt bikira.

Li milê min î çepê, dengê sendeliyek ku bi paş dihat kişandin hat û min miroveki dirêjî bejinzirav dît, wî kirasekî sor li xwe kiribû û tenê bi berçavokeke yekçavî bû. Gava min nêrî, min dît ku wî ew sendelî dikişand, rûdinişt û kirasê xwe bi haydarî xweşik dipêçand ta qermîçek tê de çênebûna. Ew mirovê hanê dadyar bû. Dergevanê dadgehê dengê xwe wê gavê bilind kir û got: "Dadgeh" û di eynî wextê de gurrînî bi du baweşinkên mezin di zikê eywanê de ket. Sê dadmend, dudo bi kirasên reş û yek bi kirasê sor derbasî hundir bûn. Dossierên wan di destên wan de, wan bi lez berê xwe dan ma-seya dirêj ya di dera herî bilind di eywanê de. Yê kirassor di nava herduyên din de li ser sendeliya bi destik rûnişt, kumê xwe yê dad-mendiyê danî ber xwe, xwêdana qehfê serê xwe yê gurûz bi dest-malekê zuha kir û bi lêv kir ku dadgehê dest bi danişţina xwe dikir.

Rojnamevanan hingê pênûsên xwe amade kiribûn. Li ser rûyê wan hemûyan mirûzekî xwînsar û tenazawer dixuya. Di nav wan de rojnamevanekî bi temenê xwe ji wan gişan bi gelekî ciwantir hebû, ciline nermik ji fanêlê cûn lê bûn, grafêteke şîn di hustuwê wî de

bû. Wî rojnamevanî tenê pênûsa xwe li ser masa ber xwe hiştibû û hema li min mêze dikir. Rûyê wî ne wilo pir lihevhatî bû tenê çavên wî bala min kişandin. Ew çavine gelekî zelal bûn û bêyî ku min bizanîbûya wan çi dixwestin, wan bi baldarî li min hûr dibûn. Wê gavê jî ez nizanim çawa lê sûrtek di serê min de çêbû û min bawer kir ku di neynikekê de min li xwe dinêrî. Bêguman ji ber vê yekê û ji ber ku min xweş adet û tevgera wê deverê nas nedikir min baş fêhm nekir ne ji helbijartina sondxwaran, ne ji pirsên ku sermiyanê dadgehê ji parêzger, ji dadyar û ji sondxwaran kirin (bi her pirsê serê hemû sondxwaran bi hev re ber bi dadmendan diçû) ne ji xwendina bi lez ya nama suckariyê tevî ku tê de min navên hin deran û hin kesan nas kirin û ne jî ji wan pirsên nû ên ji parêzgerê min hatin kirin.

Min pir ji wan tiştan fêm nekiribû û sermiyanê dadgehê got ku wî ê dest pê bikira yeko yeko bang şahidan bikira. Yê dergevan navine xwendin û wan navan bala min kişandin. Dema ez derbasbûm wê derê, tu rûyî bala min nekişandibû. Lê bi xwendina navan anuha ew yeko yeko li ber çavên min xuya dibûn. Serdebîr, dergevanê mala pîran, Thomas Pérezê kal, Raymond, Masson, Salamano, Marie hemû bi xwendina navên xwe rabûn ser xwe, di deriyekî di kêlekê re derketin û ji ber çavan winda bûn. Tenê Marie ji nav wan bi dilekî tirsdar îşareteke da min. Ez hîna wilo ecêbmayî bûm çawa berê ez çav li wan neketibûm gava Céleste jî, ango şahidê dawîn, bi xwendina navê xwe re rabû ser xwe. Min dît ku li kêleka wî ew jinika hûrik ya ku li xwaringehê bi wî re kar dikir rûniştî bû. Ew bi çakêtê xwe û wan tevgerên xwe ên jixwerazî li wê derê bû û bi kwîrayî li min mêze dikir. Lê wextê min çênebû bifikirim ji ber ku serokê dadgehê dest bi axiftinê kir. Wî got ku debatên bi rastî ê dest pê bikirina û ji xwe ne giring bû wî bala gelên wê eywanê bikişanda ku gerek ew li ciyê xwe bêdeng û aram bimana. Li gor gotina wî, ew li wê derê bû ta debat bi rastxwazî li ser dozekê çêbibûna û paşê jî ta ku biryarnameya sondxwaran bi dadwerî di derheqa wê dozekê de

bihata standin. Eger hinina ne di wê çarçovê de dengê xwe bikirana û karê dadmendiyê tevlihev bikirana, ji xwe wî ê ew eywan vala bikira.

Germa hundir xurtir dibû û min bala xwe dayê ku kesên hatibûn temaşekirinê rojnamên di destên xwe de ji xwe re dikirin baweşînk û dengê nizim yê wan kaxezên qermiçandî qut nedibû. Sermiyanê dadgehê destê xwe ji dergevên re bilind kir û wî yê hanê bi wê îşaretê rahişt sê baweşînkên ji qeselên hûnayî û ew li dadmendan gerand. Her dadmendî seraser ew baweşînk bi kar anî û ba li xwe kir.

Jêpirsîna min wê gavê seraser dest pê kir. Sermiyan bi bêhnferehî, ez dikarim bêjim jî bi hinek dilsojî, pirsên xwe ji min kir. Wî jî ji min xwest min nav û navnîşana xwe bigota û li gel ku ez bi wê yekê bêhnteng dibûm, min ji xwe re got ku bi rastî kirina wan pirsan tiştekî giring û xweza bû, ji ber ku ew ê tiştekî pir kambax bûya eger mirovek di şûna yekî din de bihata hukum kirin. Paşê dîsa sermiyan dest bi çîroka min kir. Wî ew xwend û her sê hevokan berê xwe bi min ve kir û pirsî: "Ma ne wilo ye?" Min jî her carê, wek ku parêzgerê min min hîn kiribû vegerand û got: "Erê, axayê Serok". Wê yekê gelekî dirêj kir ji ber ku sermiyanê dadgehê li ser her kitekitên doza min gelekî hûr dibû. Di wê wextê gişî de, rojnamevanan hema dinivîsandin. Min dizanîbû ku ew rojnamevanê herî ciwan û wê jina hûrik ya xwe mîna jineke hesinî tevdida, awirên xwe ji min nedibirrîn. Kesên li ser dîwançeya tramwayê rûniştibûn gişan li sermiyan dinêrîn. Sermiyan kuxiya, belgehên nava dossiera li ber xwe li hev dan, baweşînka xwe hejand û berê xwe bi min ve kir.

Wî got ku gerek bû ku wî pirsine ji min bikirana, pirsine erê xuya dikirin ji doza min dûr bûn lê belkî pêwendiyine bingehîn di navbera wan de hebûn. Min wê gavê nas kir ku wî ê dîsa behsa dayê bikira û di cî de min nas kir ez çiqasî bi wê yekê aciz dibûm. Wî pirsî çima min diya xwe xistibû mala pîran. Min vegerand ku min ew yek kiribû ji ber ku perê min têrê nedikirin min ji bo wê kesek bigirta li ber bima. Wî pirsî ka ez di hinava xwe de dêşiyam çima min diya

xwe xistibû mala pîran. Min vegerand ku ne dayê ne min me nema hêviya tiştekî ne ji hev û ne ji kesekî din dikir, ku dawî jî her yek ji me wilo hînî jiyana xwe ya nû bûbû. Sermiyan wê gavê got ku wî nedixwest dirêjtir bikira û ji dadyar pirsî ka wî dixwest pirsine bikirana.

Dadyar berê xwe bi awakî eşkere nedida min, wî tenê nîvê pişta xwe bi min ve kiribû. Wî bi lêv kir ku eger sermiyanê dadgehê destûr bida, wî dixwest bizanîba ka ez bi niyeta kuştina mêrikê Ereb bi tenha xwe zîvirîbûm ber çavkaniyê. Min vegerand û got "Na". "Na xwe çima ew bi demancê dîsa vegeriyabû eynî wê dera hanê?" Min got ku ew tişt bi tesadufî çêbû. Dadyar wê gavê bi zardeveke pîs û nexweş got: "Ez naxwazim anuha tu pirsên din bikim". Paşê tişt hinekî tevlihev bûn, bi kêmanî wan wilo ji bo min xuya kirin. Lê piştî ku sermiyan bi yên din re çend caran kir kurtepist û li nêrînan guhdarî kir, wî bi lêv kir ku dadgeh radibû û piştî nîvrojê ê dîsa vebûya li şahidan guhdarî bikira.

Wextê min û ramandinê çênebû ji ber ku cendirman bi çeplên min girtin, ez siwarî trumbêla dorgirtî kirim û vegerandim girtîxanê. Min nanê xwe xwar û piştî wî nanî bi demekê erê wilo pir hindik bû lê dîsa jî min tê de nas kir ku ez westiyayî bûm, cendirme car din hatin dû min û her tiştî wek berê dest pê kir. Min xwe dîsa di eynî wê heywanê de li hember eynî wan rûyên berê dît. Ew der wek xwe mabû, tenê germa wê xurtir bûbû. Min nizanîbû çawa ew baweşînkên ji qeselan ketibûn hemû destan, ketibûn destê hemû sondxwaran, destê dadyar, destê parêzgerê min û destê çend rojnamevanan. Rojnamevanê ciwan û jina hûrik jî herdem li wê derê bûn; wan ba li xwe nedikirin, dengê xwe nedikirin, tenê li min dinêrîn.

Min xwêdana ser rûyê xwe zuha kir û ez hinekî bi ser hişê xwe hatim. Min nas kir ez li kuderê bûm gava navê serdebîrê mala pîran li ber guhê min ket. Sermiyanê dadgehê jê pirsî ka dêya min gazin ji min dikirin an na. Wî got erê lêbelê ne wê tenê gazinên xwe ji xwe-

dî û merivên xwe dikirin, xuyê hemû xanînişînên wê derê wilo bû. Sermiyanê dadgehê xwest baş bizanîbûya eger wê gazin ji min dikirin çima min ew xistibû wê wargehê. Serdebîr dîsa jî got erê, lê vê carê tiştek li erêya xwe zêde nekir. Pirseke din jê hat kirin û wî bersiva xwe da û got ku roja binaxkirinê, ew li aramiya min ecêbmayî mabû. Ji wî hat pirsîn wî çi dixwest bi wê gotina aramiyê bigota. Wê gavê serdebîr li pozê solên xwe nêrî û got ku min nexwestibû careke dawîn li diya xwe binêriya, ez tu carî li ser wê negiriyabûm û piştî veşartinê min seraser da ser rê, ez hinekî bi tenha xwe li ser gora wê nemabûm. Tiştekî din jî bala wî kişandibû û ew mat hiştibû: karmendekî ji nav karmendên kefenkirin û veşartina miriyan jê re gotibû ku min temenê dayê nizanîbû. Demeke bêdeng di wê navberê de buhurî û sermiyanê dadgehê jê pirsî ka ew bi wê şahidiyê li ser min û ne li ser yekî din axifîbû. Serdebîr di vê pirsê de nedigihşat û sermiyan jê re rave kir û got: "Qanûn wilo ye, gerek e ez vê pirsê bikim." Paşê wî ji dadyar pirsî ka wî dixwest çend pirs ji yê şahid bikirana û yê dadyar bi dengekî bilind got: "Ma ji vê rûreşiyê mezintir? Na ev yek bes e." Dadyar gotina xwe bi dengekî wilo qube got û di eynî wextê de bi nêrînên miroveki serketî li aliyê min nêrî. Wê gavê, û ji bo cara pêşîn piştî gelek salên dirêj, ez nizanim çima, lê wek keran li min hat û ez hatim bigiriyama çunkî min nas kir ku kesên li wê derê pir ji min diqeherîn.

Piştî ku sermiyan ji sondxwaran û ji parêzgerê min xwest ka pirsên wan hebûn, wî gazî dergevanê wargeha pîran kir. Wî tiştê ku ji hemû şahidan dihat xwestin ji wî re jî dubare kir. Gava yê dergevan derbasî eywana dadgehê bû, wî li min nêrî û di cî de rûyê xwe ji min guherand. Pirs jê dihatin kirin û wî jî bersivên wan da. Wî got ku min nexwestibû dayê ji bo cara dawîn bidîta, ku li ber laşê wê min cixare kişandibû, ku ez razabûm û ku min qehwa bi şîr vexwaribû. Min wê gavê nas kir ku di eywana dadgehê de bêhna mirovên rûniştî ji min pir teng dibû û min ji bo cara yekemîn nas kir ku ez sûckar û tawanbar bûm. Sermiyan ji dergevên xwest ku wî çîroka

qehwa bi şîr û cixarê dubare bikira. Dadyarê giştî li min nêrî û di nêrînên wî de çirûskên tenaziyê eşkere bûn. Wê gavê parêzgerê min rabû ji dergevan pirsî ka wî jî bi min re cixarak kişandibû. Dadyar bi hêrs dijî vê pirsê derket. "Ma kî ye yê tawankar li vê derê? Paşê ev çi hawe ne ku mirov bixwaze ku şahidên sûckariyê bên pîs kirin ta ku bawerî bi gotinên wan ên ku dîsa jî pir xurt dimînin qels bibe!" Lêbelê sermiyanê dadgehê ji yê dergevan xwest bersiva pirsê parêzgerê min bida. Devê kalo ket hev û got: "Ez dizanim ku min çewtiyek kir. Lê min ceger nekir cixareya ku Axa dirêjî min kir negirta." Sermiyanê rûniştinê dawiya gişan ji min pirsî ka min jî dixwest tiştek bigota û min got: "Na, tenê ez dixwazim bêjim ku yê şahid rast dibêje. Rast e ku min cixarake da wî." Wê gavê dergevan hinekî mat bû, li min nêrî weke ku bi wê nêrînê dixwest bigota mala te ava te ez rûspî kirim. Ew dudilî bû, lê paşê got ku wî bi xwe xwestibû qehwa bi şîr ji min re bianiya. Parêzgerê min wê gavê bi dengekî qube û biserketî got ku mirovên sondxwar li wê derê ê rûmet û giraniya vê yekê bizanibin. Lêbelê yê dadyar di ser serê me gişa re bû wek gurîna tavê û got: "Erê çima na? Axayên sondxwar ê rûmet û giraniya vê yekê bizanibin. Û ê bigihêjin wê dawiyê ku miroveki biyanî herdem dikare bibêje fermo ji te re qehwak, lêbelê lawikê ku li ber laşê jina ku ew jê çêbûye gerek bigota na." Dergevan zîvirî ciyê xwe li ser dîwançeyê û rûnişt.

Dema bû dora Thomasê Pérez, dergevanekî dadgehê bêgav bû ket ber milê wî ew gihand ciyê şahidiyê. Pérez got ku wî bi taybetî diya min nas kiribû û tenê carekê, roja veşartina wê, ew çav li min ketibû. Sermiyanê dadgehê jê pirsî min wê rojê çi kiribû û Pérez vegerand: "Ez ji ku zanim? Ez bi xwe wê rojê pir bi keder bûm û min tiştek nedît. Kederê rê nedida min ta ku min bizanîbûya çi dibû. Ji bo min ew derd derdekî wilo mezin bû ku ez bêhiş ketim. Ji ber vê yekê min nikarîbû Axa bidîta." Parêzgêrê giştî jê pirsî ka wî bi kêmanî dîtibû ku ez giriyabûm. Pérez vegerand û got na. Wê gavê dora dadyar jî hat bigota: "Axayên sondxwar ê rûmet û giraniya vê

yekê bizanibin." Parêzgerê min bi wê gotinê hêrs bû û di nêrîna min de wî mesele pir mezin kir gava ji Pérez pirsî "eger wî dîtibû ku ez nedigiriyam". Pérez got: "Na". Kesên hatibûn temaşekirinê di hundirê dadgehê de keniyan. Parêzgerê min zendikên kirasê xwe li hev badan û bi dengekî qube û jixwebawer di wê navê de got: "Vaye tiştê ji vê dozê ji me re tê xuya kirin: her tişt rast e û tiştekî rast tune!" Mirûzê dadyar kirî bû û wî hema serê qelemeke resas di sernavên pelên ber xwe de diçikand.

Dadgeh pênc deqan rawestiya û di wê navberê de, parezgêrê min ji min re got ku baş bû, ku tiştan bi awakî pir hêja ji bo min didan dû hev. Paşê gava dadgehê dîsa dest pê kir, me li Céleste guhdarî kir. Navê wî ji aliyê berevaniyê hatibû xwestin û berevanî jî bi xwe ez bûm. Céleste car caran berê xwe bi aliyê min dikir, dinêrî û di nav destên xwe de kumekî ji qeselan li hev badida. Wî bedlê şerwal û çakêtê xwe yê nû li xwe kiribû. Wî ew deste carinan di rojên yekşeman de li xwe dikir dema bi min re dihat temaşekirina hespbeziyê. Lê ez bawer im ku wî gerden bi ser gumlikê xwe de li xwe nekiribû û di şûnê de, wî tenê bişkokek ji misê xistibû hustuyê xwe û ber xwe girtibû. Ji Céleste hate pirsîn ka ez zibûnê wî bûm. Wî vegerand " Erê, lê bi ser de jî ew heval bû." Li ser pirsa nêrîna wî di min de, wî vegerand ku, di nêrîna wî de, ez mêr bûm. Ji wî hat pirsîn wî bi wê gotinê çi dixwest bigota û wî got ku her kesî dizanîbû maneya wê gotinê çi bû. Li ser pirsa ku dihat gotin ku ez mirovekî dûrî civatê bûm, Céleste di derheqa vê yekê de tenê got ku rast bû ku min gotinên vala ji xwe bernedidan. Avokatê giştî jê pirsî ka min perên xwarina xwe li bal wî herdem di wextê de dida. Bi vê pirsê Céleste keniya û got: "Pirsa peran di navbera me de tiştekî pir biçûk bû." Gava ji wî hat pirsîn nêrîna wî di tawankariya min de çi bû, wî destê xwe danî ser mîla ciyê rastbêjiyê û diyar bû ku wî ji bo wê pirsê tiştek amade kiribû. Wî got: "Ji bo min bi xwe ev bobelatek e. Herkes dizane bobelat çi ne, Xwedê wan bi ser kesî de neyne. Ew mirovan ji desthilanînê dixin û bêçare dihêlin. Bizanibin ku ji bo

min bi xwe ev yek bobelatek e." Wî ê gotina xwe dirêj bikira dema sermiyanê dadgehê jê re got ku baş bû ew yek bes bû û ew spas kir. Bi wan gotinên sermiyanê dadgehê, Céleste di ciyê xwe de sar bû, nema dizanîbû çi bikira çi nekira. Paşê wî got ku wî gotina xwe tev nekiribû. Sermiyan jê xwest ku wî gotinên xwe kurt bikirana. Céleste dîsa got ku ew yek bobelatek bû û sermiyan jê re got " Baş e, me fêm kir. Lê em ne li vê derê ne ta biryarnaman di derheqa malwêranîn û bobelatan de bidin. Bes e, mala te ava." Weke ku tiştê ku ji Céleste hatibû kiribû, wî wilo jî berê xwe ber bi min ve kir. Min wê gavê bawer kir ku çavên wî ji ber du hêsiran dibiriqandin û lêvên wî ji ber neçariyê dileriziyan. Wî dixwest bi wî rûyî ji min bipirsiya ma çiyê din bêtir ji destê wî dihat ta ku wî ji bo min bikira. Min tiştek negot û ez ji ciyê xwe bi qeysî serê derziyê jî neliviyam, lêbelê di temenê min de, ew cara pêşîn bû ku min xwest mirovek hembêz bikira. Sermiyan dîsa bi hişkî jê xwest ew vegeriya ciyê xwe û Céleste rabû û çû û di nav wan kesan de li ciyê xwe rûnişt. Paşê, ew di rûniştina dadgehê gişî de wilo ma. Wî hinekî xwe bi pêş de xwar kir, enîşkên xwe danîn ser ejnûyen xwe û, ew kumê ji qeselan di nav destan de, wî guhdarî kir. Dora Marie hat. Wê kumek dabû serê xwe lê dîsa jî xweşik bû. Kêfa min bêtir jê re dihat dema wê porê xwe berdida. Min ji ciyê xwe dizanîbû çiçikên wê ên ne pir giran çawa bûn û min lêva wê jêrîn, ew lêva herdem hinekî werimî nas kir. Ew gelekî bêhnteng dixuya. Bi pirsa pêşîn seraser jê hat xwestin wê ji kengî ve ez nas dikirim. Wê vegerand ji dema ku wê li bal me kar dikir. Sermiyan xwest bizanîbûya çi bûn pêwendiya wê bi min re û wê vegerand ku ew hevala min bû. Wê bersiva pirsek din da û got ku erê rast bû ku wê ê ez bikirama. Dadyar pelên dossiera ber xwe li hev da û ji nişkê ve xwest bizanîbûya pêwendiya me kengî dest pê dikir. Wî xwe xeşîm kir, wek ku hayê wî ji tiştekî nebûya û piştî bersiva Marie wî got ku ew roj, wek ku jê re xuya dibû, roja piştî mirina diya min bû. Paşê wî bi zaraveke tenazawer got ku Xwedê giravî ji bo wî ne hêsan bû ku ew têketa nava jiyana kesane

ya Marie, lêbelê (û bi wê yekê dengê wî tûjtir bû) wî karê xwe xweş nas dikir û dizanîbû ku gerek wî xwe di ser wan urf û adetan re bidîta. Wî ji Marie xwest ku bi kurtî behsa wê roja hanê bikira. Marie nexwest dengê xwe bikira lê ji ber ku yê dadyar engirî, ew li ser ketina me ya avê, çûyîna me ya sînemayê, û vegera me bal min axifî. Marie îfada xwe dabû û paşê, yê dadyar li bernameyên fîlmên wan rojan nêrîbû û wî ji Marie xwest ku wê bi devê xwe bigota navê wî fîlmî çi bû. Marie bi zimanekî sade vegerand ku ew fîlmek bû Fernandel tê de dilîst. Dema wê tev kir, te di eywana dadgehê de derziyek jî bavêta dengê wê ê bihata. Dadyar wê gavê bi awakî pir giran rabû ser xwe, tiliya xwe ber bi çavên min kir û bi dengekî ku bi rastî dileriziya got: "Ji xwe re li vî mêrê hanê binerin, axayên sondxwaran. Ev mêrê hanê dotira roja mirina diya xwe diket avê, bi jinikekê re derdiket û diçû sînemayê sebra xwe bi fîlîmekî kenawer dianî. Tiştê ez dixwazim ji we re bêjim tenê ev bû."Bi van gotinan ew li ciyê xwe rûnişt û bêdengiya giran car din xwe li eywanê pêçand. Lê di wê bêdengiyê de Marie ji nişkê ve kire kûrekûr. Wê bi girî got ku ew yek ne rast bû, wê dixwest tiştek bigota lê bêgav dibû tersî wan tiştan bigota, ku wê baş min nas dikir û ku dizanîbû ku min tiştekî nerind nekiribû. Lê dergevanê dadgehê li ser îşareta Sermiyan rabû bi destê wê girt û ew vegerand ciyê wê. Dadgehê berdomand.

Piştî wê yekê, kî ê bi rastî guhê xwe bida rastbêjeya Masson? Masson got ku ez mêr bûm, mêrekî mêran, rast û dilpak bûm. "Û wî ê bêtir bigota ku ez mêrekî qenc bûm." Kesî nikarîbû guh li Salamano jî bikira dema wî got ku ez li ber sehê wî ketibûm û ku ez bi wî sehî re qenc bûm. Dema pirsa min û diya min jê hat kirin, wî got ku tiştekî min û wê tunebû me ji hev re bigota û, ji ber vê yekê, min ew xistibû mala pîran. "Gerek e mirov di vê yekê bigihêje, gerek e" lê bêguman kesek di vê yekê nedigihaşt û dergevanê dadgehê bi destê wî girt û ew vegerand ciyê wî.

Raymond rastbêjê dawîn bû û dema dora wî hat, wî îşareteke bi-

çûk da min û seraser got ku ez bêsûc û bêguneh bûm. Sermiyanê dadgehê wê gavê jê re bi lêv kir ku wî dikarîbû nêrîn û ditinên xwe ji bo xwe bihiştana û tiştên ku jê dihatin xwestin tiştine berbiçav bûn. Wî jê xwest tenê bersiva pirsan bida, devê xwe vekira dema jê bihata xwestin. Sermiyan jê xwest wî bi dirêjayî û bi awakî xweş pêwendiyên di navbera wî û yê kuştî de rave bikira. Raymond bi xwe li qetekî digerriya û werîsek bi dest ket. Wî got ku mêrikê hatibû kuştin ji roja ku wî sîlak daweşandibû xwişka wî bi rastî ji wî bi xwe diqeherî. Wî dadgehê jê pirsî ka sedemine hebûn ji ber wan wî mirovî dikarîbû ji min bi xwe jî biqehiriya. Raymond got ku hebûna min li ser peravê tesaduf bû. Wê gavê yê dadyar jê pirsî na xwe çawa ew nameya ku bûbû sûcê kuştinekê bi destê min bi xwe hatibû nivîsandin. Raymond vegerand ku ew tesaduf bû. Dadyar wê gavê got ku tesadufê ji destpêkê di vê bûyerê de barê ziyanan li ser wicdanan giran kiribû. Wî pirsî ka ew jî tesaduf bû ku ez neketibûm navberê Raymond û yarika wî gava wî sîlak daweşandibû wê, tesaduf bû ku ez çûbûm polîsxanê ji wî re bûbûm rastbêj, tesaduf bû ku gotinên ku min di şahidiya xwe de gotibûn bi rastî tu bingeh ji wan re tunebûn. Wî xwest bi pirseke dawîn tev bikira û ji Raymond pirsî karê wî çi bû, çilo xwe xwedî dikir. Gava Raymond vegerand: "Ez enbardar im", yê dadyar bi sondxwaran da zanîn ku li gor tiştên dihatin bihîstin, şahidê min qewadî dikir. Wî berdomand ku ez hevdest û hevalê wî qewadî bûm. Tawankariya min tawankariyeke pir pîs bû û ji ber ku bi karên dijî sinc û exlaqê girêdayî bû, pîsîtiya wê bêtir dibû. Raymond xwest li ber xwe bida û avokatê min ev gotinên hanê protesto kir, lêbelê sermiyanê dadgehê ji wan xwest ku ew rehet rûniştana ta ku dadyar gotinên xwe tev bikira. Wilo jî dadyar ji Raymond re got: "Tenê tiştekî min î biçûk heye ez dixwazim li gotinên xwe zêde bikim: ew hevalê te bû an na?" Raymond vegerand: " Erê, ew dostbirakê min bû." Paşê dadyar berê xwe bi min ve kir û eynî pirs ji min kir. Min li Raymond nêrî û dît ku wî awirên xwe ji min nequrmiçandin. Min jî vegerand "Erê." Bi wê gotina min dad-

yar li sondxwaran vegeriya û bi dengekî qube got: "Eynî mêrê ku roja piştî mirina diya xwe diket nava pîsîtiyên bêhawe mezin ji bo sedemine pir biçûk û tewş mêreke kûşt ta ku wilo jî wî kareke bedexlaqiyê ku nayê binavkirin safî bikira."

Agir ketibû parêzgerê min û nema dikarîbû bêtir xwe bigirta. Bi rûniştina yê dadyar re ew rabû ser xwe û bi dengekî bilind axifî. Wî herdu destên xwe bilind kirin û wê yekê hişt ku zendikên kirasê wî bihatana xwarê û xêza qemîsê wî yê nişastekirî û ûtîkirî xuyabû: "Ev çi ye ev çi kar e? Ma tawanbariya wî binaxkirina diya wî ye an kuştina mirovekî ye?" Kesên ku hatibûn temaşekirinê keniyan. Lê dadyar dîsa rabû ser xwe, kirasê xwe li xwe pêçand û bi lêv kir ku pêwendiyine bi xwe pir xurt, bingehîn û patetîk di navbera wan herdu tiştan de hebûn. Mirovê ku ew pêwendî nedîtana ji xwe ew ê, mîna berevanê birêz, mirovekî kawik û sade bûya. Wî bi dengekî xurt berdomand: "Erê, erê ez vî merê hanê tawanbar dikim ku wî bi dilê kuşdarekî cendekê dayikekê binax kiriye." Van gotinên dawîn xuyakirin bêpîvan li kesan kêr kirin. Parêzgerê min milê xwe hejand û xwêdana eniya xwe zuha kir. Eşkere bû ku ew bi xwe jî bi wan gotinan hatibû hejandin û min nas kir tu tişt ji bo min ne baş derbas dibûn.

Paşê, tiştan bi lez dane dû hev. Dadgeh ji bo wê rojê tev bû. Gava ez ji seraya dadmendiyê derketim û min berê xwe da trumbêlê, min di wê bêhnika kurt de rengên şevekê ji şevên havîne nas kirin. Min xwe di wî bajarî de kêfxweş didît û min pir ji wê bêhnika êvarê hezdikir. Di tarîtiya trumbêla dorgirtî de, di tarîtiya girtîxana xwe ya ku da ser rê, min hemû dengên rojane ên wî bajarî nas kirin. Min hemû dengên wê bêhnikê deng bi deng bihîstin. Erê min ew dengên hanê yek bi yek bihîstin ne wek ku ew ji derve lê ji nava jihalketina min derdiketin. Qîrîna rojnamefiroşan di dawiya rojekê de piştî şikestina germê, çîveçîva çûkên dawîn di meydaneke biçûk de, ineina tramwayan ku di kuçeyên cadên jora bajêr de dizîvirîn, û gumeguma xwe li asmanan digirt dema şevê xwe bi ser benderê xwar

dikir, erê van hemû dengan ji min re, wek ji miroveki kwîr re, dibûn çend perçe ji rêyekê ku berî ketina min ya zindanê min xweş nas dikir. Erê, berî anuha bi gelekî, min di wê bêhnikê de gelekî xwe kêfxweş didît. Berê, dema min berê xwe dida malê, tiştê ku li dawiya wê rêyê li bendî min bû xeweke sivik û bê xewn bû. Lê tiştek hatibû guhertin, tiştek nema wek berê bû. Li hêviya roja din ez ne ber bi malê çûm lê vegeriyam zindana xwe. Erê mirov dikarîbû bigota ku wan rêyên nas ên di asmanên havînê de hatibûn xêzkirin ne tenê dikarîbûn mirov ber bi xewa şîrîn bibirana, lê wan ber bi odeyên teng ên girtîxanan jî dikarîbûn bibirana.

## IV

Li kuderê be, ta li ser rûniştekа tawanbariyê be jî, bi mirov tiştekî balkêş û xweş tê dema behsa wî dibe. Hem ji aliyê dadyar û hem ji aliyê parêzgerê min ez dikarim bibêjim ku pir behsa min hat kirin, belkî bêtir li ser kes û xuyê min ku li ser cirma min. Her yekî ji aliyêkî dengê xwe dikir lê ma ferqeke wilo mezin di navbera wan herduya de hebû? Parêzger destên xwe ber bi asmanan bilind dikir û digot erê ew tawabar e lê ji bo kuştina wî mêrikî ji min re uzr û behane peyda dikir. Dadyar destê xwe dirêj dikir û digot tawanbar lê tu sûc û behane ji tiştê min kiribû nedidît. Lêbelê tiştekî di wan danûstandinan de ne eşkere dihiştin ku bêhna min teng bûbûya. Tevlî karûbarên min pir bûn min carinan xwe nedigirt û dikir di wê navberê de tiştek bigota lê parêzgerê min her carê bi destê min digirt û digot: " hiş be ji bo doza te çêtir e." Min bala xwe dayê ku wan dixwestin bêyî min ev doza hanê çareser bikirana û tişt wilo jî li ber çavên min derbas dibûn bêyî ku min bikaribûya dengê xwe bikira. Wan kesan tevnê çarenûsa min dihûnandin bê ku ji min bipirsîna bi kêmanî nêrîna min çi bû. Car caran min dixwest hema wilo gotinên wan bibirriya û bigota: "Hê, ma wilo dibe? Ma yê tawanbar li vê

derê ez im an na? Çavên xwe vekin û bizanibin ku tawanbarbûyîn ne tiştekî bêrûmet e. Bihêlin ez tiştekî bêjim." Lê gava min baş bala xwe dayê min dît ku bi rastî tiştekî min tunebû min bigota. Paşê ez dizanim ku mirov nikare bi awakî dûr û dirêj bala kesan bikişîne. Wek nemûne ku mirov nikare guhê xwe bi dirêjayî bide mirovekî din ez dikarim bêjim ez pir zû ji gotara dadyar sar bûm. Di dirêjiya hemû gotara tawanbarkirinê de tenê çend hevokan, çend livên destê wî û çend risteyên dirêj bala min kişandin.

Bi ser de jî eger ez ne şaş bim, ez bawer dikim ku tiştê dadyar dixwest bigota ew bû ku min biryara wê kuştina hanê di serê xwe de berê çêkiribû, ku min xwe jê re amade kiribû. Wî bi kêmanî xwest ev yek bipeyitanda. "Axayên min, ez ê vê yekê ji we re dubare bipeytînim. Pêşî li ber ronahî û rastiya pir xurt ya tiştên berbiçav û paşê dema ez ê dilê reş yê vî tawanbarî bi saya psîkolojiyê ji we re rohnak bikim." Wî bi kurtebirrî behsa bûyeran kir, ji mirina dayê dest pê kir. Wî dîsa got ku ez mirovekî wilo xwînsar bûm û min guh li tu tiştî nedikir. Min ta temenê diya xwe jî nizanîbû. Wî got çawa dotira roja mirina wê diyê ez bi jinekê re ketibûm avê, çawa ez çûbûm sînemayê û min filmekî ku Fernandel tê de dilîst dîtibû. Dawî wî behs kir çawa ez bi Marie re vegeriyam malê. Wê gavê ez xweş di gotinên wî de negihaştim ji ber ku gava wî behsa Marie dikir, wî bang wê dikir "Yarika min", û ji bo min bi xwe, Marie Marie bû û ne tiştekî din bû. Paşê ew vegeriya ser çîroka Raymond. Min bala xwe dayê ku dema ew li ser tiştan dipeyivî wî bi zimanekî xweş ew rohnak dikirin û baweriya mirovan bi gotinên wî dihat. Li gor wî min û Raymond me bi hev re xwe li yarika Raymond kiribû yek û min bi wî re name nivîsand ta ku min ew jinik ber bi wî ve bianiya û wilo jî bihişta ku ew Raymondê "napak" ew jinika hanê bêşanda. Min li ber perava deryayê girrê xwe di dijminên Raymond de dabû û ew sor kiribûn. Raymond di pevçûnê de birîndar bûbû û min demançe jê standibû û ez bi tenha serê xwe vegeriyabûm ta ku bi zanebûn min ew demançe bi kar bianiya. Wek ku min biryara wê kuş-

tinê di serê xwe de çêdikir, min wilo jî yê Ereb kuştibû û ew biryar bi gewde kiribû. Ez li hêviya wê yekê mabûm û "ta ku dilê min biketa cih ku min karê xwe gihandibû serî", min piştî gulleya pêşîn, bi bêhna fireh, herdem bi zanebûn, çar gulleyên din berdabûn. Min bîra her tiştî dibir û min xweş dizanîbû çi dikir. Wî berdomand: "Ez serê we neyşînim, axayên min. Min ji we re ta bi derziyê ve kir û got çi bûn ew tiştên berê vî mirovê hanê dane kuştinê. Ez car din dubare dikim û dibêjim ku vî mirovî bîra her tiştî dibir û dizanîbû çi dikir. Gerek e hûn vê yekê ji bîr nekin ji ber ku ev cirma, ev tawana hanê ne tawaneke adî ye ta dilê we bi yê tawankar bişewite û fikira sûc û bihanan di serê we de çêbibe. Axayên min, ev mêrê hanê ne dîn e û ne zarok e. Ew xwedîhiş e, jîr e. Ma ne we lê guhdarî kir û we dît ku ew dizane bersivên xwe bide? Ew rûmeta gotinan dinase. Na mirov nikare bibêje ku wî bi nezanetî kir."

Min guhdarî dikir, dibihîst ku di derheqa min de dihat gotin ku ez mirovekî xwedîhiş bûm. Lê min fêm nedikir çawa xasiyetên miroveki wek her kesî dikarîbûn bûbûna barine giran li ser milên wî dema ew di dadgehê de tawanbar dibû. Di nav tevgerên dadgehê de, ez dikarim bêjim ku bi kêmanî vê yekê bala min dikişand û dihişt ku ez ecêbmayî bimînim. Min nema bala xwe da yê dadyar. Dengê wî gihaşt guhê min gava wî got: "Binerin, axayên min, ma vî mirovî bi qeysî serê derziyê poşîmanî ji we re daye xuyakirin? Di hemû dirêjahiya vekolînê de, vî mirovî tu carî ji ber kambaxiya karê xwe li ber xwe neketiye." Wê gavê jî wî berê xwe bi min ve kir, tiliya xwe ber bi min ve dirêj kir û bê ku min bi rastî bizanîbûya wî çi ji min dixwest, wî dîsa dev avêt min. Ew bêguman wilo radipelikî min ji ber ku min di dilê xwe de dizanîbû ku wî rast digot. Rast bû ku ez li kuştina yê Ereb ne gelekî poşman bûm lê dîsa jî min nizanîbû çima wî girrê xwe ji min nedikir. Min dixwest bi zargermî jê re bigota ku bi rastî di temenê xwe gişî de ez tu carî poşman nebûbûm. Min di jiyana xwe de guh li tiştên buhurî nedikir û tenê tiştên îro û sibehê bala min bi awakî xurt dikişandin. Lê di wê rewşa ku

wan ez xistibûmê, min nikarîbû helbet dengê xwe wilo bigihanda tu kesî. Di wê rewşê de, mafên min nebûn ku min xwe diltenik û xwedîyê hîsên rind û pak bida xuyakirin. Min xwest dîsa li dadyar guhdarî bikira ji ber ku wî dest pê kir behsa canê min kir.

Wî ji sondxwaran re rave kir ku wî xwe bi ser hinava min de xwar kiribû lê di wê hinavê de tu can nedîtibû. Wî digot ku bi rastî ez miroveki bê can bûm ku tiştekî min û mirovan bi hev re tunebû, ku heywanê sinc û axlaqê bi min re peyda nedibû. Wî got ku ez ji van tiştan gişan bêpar bûm û berdomand: "Bêguman em nikarin gazina van tiştan jê bikin û bêjin çima ew li bal wî tunene. Gava tiştek ji ba Xwedê di nava yekî de tunebe mafê me tune em bêjin çima ew tişt kêm e. Lê eger doz bibe doza dadmendiyê, vê gavê nabe em çavên xwe bigirn û di ziyan û bedkariya mirovekî de bibuhurîn û bexşînê bixwazin. Hêsan e ku mirov bêje gerek mirov tê bibuhire lê di dadgehê de lêbuhirîna hêsan gerek zehmetir bibe. Gerek dilê mirovan bi dadmendiyê re be wê di ser her tiştî re bibîne, bi taybetî dema valahiya dilekî wek dilê vî mirovê hanê mîna çalek bêbinî be û ne dûr e ku rojekê hemû civat tê werbe." Wê gavê wî behsa danûsatandinên min bi diya min re kir. Wî di dêbatên pêşîn de behsa wan tiştan kiribû û ew dubare kir. Lê dema wî dest bi diya min kir devê wî nema ket hev. Wî ji tawana min dirêjtir kir, bêpîvan dirêj kir. Min nema dizanîbû wî çi digot û tenê ez bi germa rojê hesiyam. Bala min venegeriya ser gotinên wî gava wî hinekî bêhna xwe berda û bi dengekî gelekî nizim û kwîr berdomand: "Axayên min, ev dadgeh sibe ê biryarnameyê di derheqa dozekê de bide ku hew doz jê pîstir hene: kuştina bavê. Li gor gotinên wî, mirov nikarîbû bawer bikira çawa kesekî dikarîbû destê xwe dirêjî ruhê bavê xwe bikira û tiştekî wilo dijwar bikira. Wî pir hêvî dikir ku dadgeha mirovan berî ya Xwedê bê sistî û bê dilovanî ew yek ê seza bikira. Lê eger wî tawana min pir kambax didît û ku dilê wî ji ber wê pir dêşiya, wî diwêrîbû bigota ku dilê wî bêtir ji ber sersariya min dêşiya. Herdem li gor nêrînên wî, mirovê ku diya xwe bi awakî mecazî dikuşt û xwe ji

civata mirovan dûr dixist, ew mirov ne dûr bû ji wî kesê ku destê xwe dirêjî ruhê bavê xwe kiribû û ew kuştibû. Mirovê bi rengekî remzî dikuşt rê li ber kambaxiyên mirovê ku bi rastî dikuşt vedikir û destûra kuştinê dida. Paşê, wî dengê xwe bilind kir û berdomand: "Ez bawer dikim, axayên min, ku hûn ê fikira min pir xerîb nebînin eger ez ji we re bêjim ku ev mêrê anuha li ber me ye tawanbar e jî bi kuştina bavê ku ev dadgeh sibehê ê li ser biaxife. Wilo jî ez dixwazim ku ev mêrê hanê bi tawana kuştina bavê jî bê cezakirin." Xwêdanê li ser eniya dadyar dibiriqand û bi wan gotinan wî ew xwêdan zuha kir. Wî dawî got ku berpirsiyariya wî dijwar bû û tiştê ku jê dihat xwestin tişteki pir dijwar û rencawer bû, lê wî ê dîsa karê xwe bi dilekî xurt bigihanda serî. Wî got ku ciyê min di nav civata mirovan de tunebû û çêtir bû ez ji ber çavan biketama ji ber ku min hemû destegeh û rêkên wê civatê bi qirşikekî nedikirin. Wî berdomand ku min nikarîbû gazî dil û dilovaniya mirovan bikira ji ber ku min tiştek ji wî dilî û ji wê dilovaniyê nas nedikir. Wî got "Ez serê vî mirovî bi kêfxweşî ji we dixwazim. Erê ez vê yekê ji we bi dilekî rihet dixwazim eger min di nav salên pir yê karê xwe de ceza serjêkirinê carinan xwest, ev cara pêşîn e û ez dibînim ku bi rastî mirovek hêjayî sezayekî wilo ye. Du tişt hene vê gerdenbirînê pewîst dikin, pêşî gerek e ku daxwazeke îlahî xurt bê parastin û ji aliyekî din nepakiya vî rûyê ku tenê ziyan jê dibarin.

Dema dadyar ji nû ve rûnişt, bêdengiyê demeke baş dirêj xwe li hundirê dadgehê pêçand. Ez bi xwe ji ber germa hundir û matmayînê gêj bûbûm. Sermiyanê dadgehê hinekî di ber xwe de kuxiya û bi dengekî sist ji min pirsî ka min dixwest tiştek bigota. Ez rabûm ser xwe û ji ber ku dilê min û axiftinê hebû min hinekî tevlihev kir û hema çawa tişt hatin serê min min got ku min nedixwest ew mêrikê Ereb bikuşta. Yê Sermiyan got erê û berdomand ku wî ta wê gavê fêm nekiribû çawa min destgeha berevaniya xwe saz dikir. Wî got ku berî ku bibûya dora parêzgerê min, ew ê kêfxweş bibûya eger min jê re rave bikira çima min ew mirov kuştibû. Min tevlihev

kir û li gel ku min dizanîbû ku kenê kesan ê bi min bihata, min bi lez got ku suc sucê rokê bû. çend kes di eywana dadgehê de keniyan. Parêzgerê min milên xwe bilind kir û piştî min di cih de bû dora wî. Gava bû dora wî, wî got ku wî ê bi saetan bêguman dirêj bikira û wext bi xwe dereng ketibû. Wî ji sermiyan xwest ku daniştin biçûya danê piştî nîvro û daxwaza wî bi cî bû.

Di eywanê de piştî nîvro baweşînkên mezin ên ser eletrîkê bayê giran di hundir de li hev didan û di destên sondxwaran de baweşînkên biçûk û rengînî giş bi hev re diliviyan. Parêzgerê min jî ez çi bêjim devê xwe vekir û nema girt. Ji nişkê ve min lê guhdarî kir ji ber ku wî digot: "Erê rast e min kuştiye." Her ku wî behsa min dikir wî bi wî dengî û bi wî şêweyî hema digot "Ez, min". Ez pir ecêbmayî mam. Min xwe bi aliyê cendirmekî ji herdu cendirmeyan xwar kir û pirsî çima wî hema digot "Min, ez". Yê cendirme got huş be û paşê berdomand: "Hemû parêzger wilo dikin." Min ji xwe re got ku bi wî awayî wî dîsa min dûrî doza min dibir, wî tu rûmet ji min re nedihişt gava xwe dixist şûna min. Lê ez bawer dikim ku hingê ez ji wê oda danîştinê dûr ketibûm. Parêzgerê min bi xwe neket serê min û ji min re kenawer xuyabû. Wî tiştekî wilo berbiçav û dirêj dijî gotinên dadyar negot û bi lez di ser lêtûjkirinên wî re derbas bû. Paşê wî jî behsa canê min kir. Bi jîrbûyînê ew bi rastî nedigihaşt toza yê dadyar. Wî got: "Min jî xwe bi ser hinava vî merovê hanê xwar kir û bi tersî axayê birêzê berpirsyarê wezareta gelî, min canek dît. Ez dikarim bibêjim ku ew can ji min re wek pirtûkeke vekirî xuya bû." Wî di wê pirtûka nava min de xwendibû û dîtibû ku ez miroveki dilpaqij û karkerekî bîrbir bûm, ku min ji can û dil û bêwestan ji bo xwedanên karê xwe kar dikir, her kesî li wê derê ji min hez dikir û min di ber dilê herkesî de dida. Li gor gotinên wî, li ser rûyê axê law hew di ser min re ji diya xwe re qenctir û baştir hebûn. Ta ji min hatibû min diya xwe di nav xweşiyê de xwedî kiribû, lê dawiya gava nema ji min hat ez wê di wê xweşiya hanê de xwedî bikim, min ew xist maleke pîran û li wê derê min dizanîbû ku ew ê di re-

hetiyê de bûya. Wî berdomand: "Ez bi xwe fêm nakim çima di vê dadgehê de wiqasî axiftin û di ber re jî rexne li ser van malên pîran çêbûn. Eger em bixwazin başbûna van encumenan bipeytînin gerek e em ji bîr nekin ku dewlet bi xwe alîkariya wan ya diravî dike." Lêbelê wî li ser veşartina diya min dengê xwe nekir û min nas kir ku ew yek ji berevaniya wî kêm bû. Lê ji ber van hemû hevokên bêserî û bêdawî, ji ber hemû van saet û rojên dirêj ên di wan de axiftin tenê li ser canê min bû, her tişt li ber çavên min bûn mîna aveke bêreng di nav de ez gêj dibûm û erd li dora serê min digeriya.

Dawî, tenê tê bîra min ku hêna parêzgerê min diaxifî gava ji cadeyê û di nav wan hemû dîwar û eywanên dadgehê re dengê borîazana krêmfiroşekî li ber guhê min olan da. Min xwe di nav gerrînokên bîranînên jiyanekê de winda kir, jiyaneke ku ji min dûr diket, jiyaneke nema ya min bû. Wê jiyanê bi xwe re tiştên xweş anîn: hemû xweşiyên biçûk û mezin, bêhnên taybetî yên havînan, tara ku min jê hez dikir, carinan jî rengê asimanan di çend êvarên taybetî de û ken û kirasên Marie bi xwe re anîn. Min wilo jî nas kir ku hebûna min li wê navberê, di hundirê wê dadgehê de tiştekî pûç bû û min ji hemû dilê xwe xwest ku ew xirecir zû tev bibûya ta ku ez vegeriyama selûla xwe û min xwe berdaya nava tevnên xewê. Min pir guhê xwe neda parêzgerê xwe dema wî ji sondxwaran xwest ku wan karkerekî dilpaqij ku ji ber deqake bêhişî xwe winda kiribû neşandana mirinê. Di nav barên min de barê tawan û poşmaniya min ya ebedî li ser canê min barên herî giran û dijwar bûn û wilo jî wî ji bo min zurûfên sivikkirî dixwest. Dadgeh sekinî û parêzgerê min wek ku ji hal ketibûya li ciyê xwe rûnişt. Hevkarên wî ber bi wî ve hatin û destê wî guvaştin û her yekî got: "Tiştekî pir hêja bû, ezîzê min". Yekî ji wan berê xwe bi min ve kir weke ku dixwest bigota: Te dît! Ma ji wilo çêtir? Min serê xwe bi erêyî hejand lê bi rastî ji ber ku ez westiyayî bûm, min ne ji dilê xwe wilo jê re xweş kir.

Li gel ku li derve roj diqulipî û ku şewata rojê baş şikestibû, ez pir westiyayî bûm. Dengine ji cadeyan dihatin û ji wan dengan min nas

kir ku hênikahiya êvarê xwe bi ser bajêr de berdabû. Em giş, erê em giş li wê derê li bendî tiştekî bûn û ew tiştê hanê jî tenê bi min ve girêdayî bû. Min li hundirê eywana dadgehê car din nêrî û çavên min rastî çavên rojnamevanê bi çakêtê cûn û jina otomat hatin. Wê gavê hate bîra min ku di hemû dirêjbûna rûniştinên dadgehê de min çavên xwe li Marie negerandibûn. Min ew ji bîr nekiribû lê ji ber pirbûna karûbarên xwe, ez jê re vala nebûbûm. Min ew di navbera Céleste û Raymond de dît û wê gavê wê ji min re îşaretek biçûk da wek ku dixwest bigota: "Dawî ez hatim bîra te". Rûyê wê ku nereheti li ser xuyanê bû bi min re dibişirî. Dilê min girtî bû û ji min nehat min bersiva wê bişirîna wê bida.

Dadmend vegeriyan ciyên xwe. Ji sondxwaran re bi lez ristek pirs hatin xwendin. Di nav wan pirsan de gotinên "tawankar bi tawaniya kuştinê"... "xwe ji kuştinê re amade kirin"... "zurûfên sivikkirî" li ber guhên min ketin. Sondxwar derketin û ez jî ketim wê oda ku berê min xwe lê ragirtibû. Parêzgerê min xwe gihand min û bi devekî sivik, bi piştekе rast û bi dilgermiyeke ku tu carî berê wî ji min re nedabû xuyakirin ew peyivî. Li gor baweriyên wî tişt baş ji bo min derbas dibûn û eger ez bihatama cezakirin ew ê pir û pir çend salên zindanê an çend salên karên zorê bûna. Min jê pirsî ka mafê min hebû min biryarnameya dadgehê bişekanda eger ew biryarname ne li gor dilê min bûya. Wî ji min re got ku na. Tektîka wî ew bû ku piştî ku ceza dihat birrîn, wî nedixwest doza tu tiştî bikira û bi derewan serên kesên sondxwar bêşanda. Wî ji min re rave kir ku nedibû ku hema her yek rabûya doza guherandina biryarnama dadgehê bikira û bi ser de jî, ew tişt ne wilo hêsan bû. Gotinên wî ketin serê min. Eger mirov ne li dengê dilê xwe lê li yê mejiyê xwe guhdarî bike, tiştê ku parêzgerê min digot di ciyê xwe de bû. Eger me qîma xwe bi biryarnameya dadgehê neaniya û doza daniştineke din bikira, gelek kaxez bi derewan ê li ser hev kom bibûna. Parêzgerê min got: "Rê û çareya îstînafê herdem li ber me ye. Lê ez dizanim bêşik ku gotina dadgehê wê baş be."

Em gelekî, nêzîkî sê çarîkan, ez bawer dikim di wê oda biçûk de man. Dema dengê zingilekî gihaşt me, parêzgerê min rabû ser xwe û got: "Sermiyanê sondxwaran wê bersivan bixwîne. Tu ê derbas bibî tenê dema biryarnama di derheqê te de hatiye satandin ê bê xwendin." Terqîniya deriyên ku vedibûn û dihatin girtin dihat min. Kesine li ser pêlikan bi lez dadiketin û hildikişiyan û min nizanîbû ka ew pelik dûr an nêzîk bûn. Paşê dengekî dûr gihaşt guhên min û wî dengî di eywana dadgehê de tiştek dixwend. Dema zingil dîsa lêxist û deriyê qefesa tawanbarbûyînê li ber min vebû, bêdengiya ku xwe li eywanê girtibû ber bi min ve hat, ew bêdengiya wê hîsa taybetî ya ku di nava min de peyda bû dema min bala xwe dayê ku rojnamevanê xort awirên xwe ji min birrîbû. Wextê min çênebû min li aliyê Marie mêze bikira ji ber ku sermiyanê dadgehê ji min re bi rengekî tevlihev got ku bi navê miletê fransî serê min ê di meydaneke umûmî de bihata jêkirin. Ez bawer dikim ku wê gavê min hîsên mirovan li ser rûyên wan xwendin û min nas kir nêrîna wan di min de çi bû. Ez bawer dikim ku wan rûmeteke didane min. Herdu cendirman bi min re paşê gelekî qenc derketin. Parêzgerê min destê xwe danî ser destê min. Ez nema bi tu tiştî difikirîm gava sermiyanê dadgehê ji min pirsî ka min dixwest tiştek bigota. Ez ramiyam û min got: "Na." Wê gavê wan ez ji wê derê derxistim û birim.

## V

Keşê ku tê serlêdana mehkûman sê caran xwest bihata û hersê caran min got na. Ma ez ê çi ji wî re bêjim? Dilê min nabije axiftinê û ez ê di wexteke baş nêzîk de wî bibînim. Tiştê ku anuha bala min dikişîne ew e ku ez ê çilo xwe ji mêkanîka îdamê xilas bikim, anuha ez dixwazim bizanibim ka mirov dikare qederê hinekî biguherîne, careserekе din ji vê dawiyê re bibîne. Ez ji selûla xwe hatim derxistim û ketim yeke din. Di vê selûla nû de, gava ez xwe dirêj dikim, ez ji

bilî asmanan tiştekî din nabînim. Hemû rojên min wilo derbas dibin: ez xwe li ser piştê radimidînim, destên xwe dixim bin serê xwe û li ser rûyê asmanan dinerim çawa reng têne guhertin û çawa rengên rojê ber bi yê şevê dirin. Ez nizanim çend caran lê bêguman gelek caran min ji xwe pirsî ger di nav mehkûmên îdamê de çend kes hebûn xwe ji vê çarenûsê xelas kiribûn û berî saeta mirina xwe bi awakî din miribûn û rêza pasebanan ji hev xistibûn. Ez poşman bûm çima berê min baş guh nedabû çîrokên îdamê. Mirov gerek her gav guh li wan pirsan bike ji ber ku kesek nizane sibe ê çi bi serê wî bê. Wek her kesî min kurtenivîsên wan serpêhatiyan di rojnaman de xwendibû lê pirtûkine taybetî li ser wan pirsan helbet hebûn û ji ber ku wan bala min nekişandibûn min tu carî li wan nenêrîbû. Eger min ew pirtûk bixwendana, ez ê belkî di wan de rastî çend çîrokên revê bûbûma. Min ê nas bikira ku bi kêmanî carekê qewimîbû û çerxa felekê rawestiyabû, ku bi kêmanî carekê bexteweriyê ev çarenûsa ku nedihat guhertin guherandibû. Erê eger tenê carekê ev yek bibûya, ez bawer dikim ku ew ê ji min re bes bûya û dilê min ê karê mayî ê bigihanda serî. Piraniya caran rojnameyan digotin ku mirovê tawankar dibû deyndarê civakê û gerek wî deynê xwe bida. Lê deyn û deynadarî û gotinên wilo tiştekî ji xeyala mirovan re nabêjin. Tiştê girîng rev û hebûyîna wê bû, şikenandina qederê bû, tiştê girîng bezek ber bi warê dînbûyînê bû. Dînbûyîn girîng bû ji ber ku wê bi xwe re hemû deriyên hêviyê di rûyê mirovê tawankar de vekira. Hêviya herî mezin jî bi xwe ew bû ku mirovê tawankarkirî bireviya, bazdaya û ku li kuçeya cadakê, gulleyekê ba biqelaşta û ew bida xwarê. Lê gava min bala xwe xweş dida tiştan, ew guhertinên hanê di xewnên şevan de jî ji bo min çênedibûn û wê mêkanîka hişk ez zeft dikirim û ez bernedidam.

Lê min dikir û nedikir, min nikarîbû ev takîda bêcir qebûl bikira. Min nikarîbû ew mirina ku wê takîdê bi xwe re dianî qebûl bikira ji ber ku di navbera wê û mercên derketina wê de wek erd û asmanan hebû. Hukmê kuştinê ji deqa derketina xwe mirinek bi girr bi xwe

re dianî lê mercên derketina wî î hukmî gelekî dikarîbûn bihatana guhertin. Biryara ku di derheqa min de ne pir cedî xuya kir ji ber gelek tiştan: ji ber ku hukmê mirinê di saet heyştê êvarê û ne di saet pêncan de hatibû xwendin, ku ew hukum dibû hukmeke din bûya, ku merovên ku ew derxistibûn merov bûn û cilên xwe diguherandin, ku ew bi navê dazanînek ne diyar wek " Miletê fransî ( an almanî, an çînî) erê ji ber van hamû tiştên ku dikarîbûn bihatana guhertin, biryarnameya kuştina min wek tiştekî cedî neket serê min. Lêbelê, ez çi bêjim, ji kêlîka ku ew biryarname derketibû, min dizanîbû ku ew bi gewde û berbiçav dibû, wek wî dîwarê ku min laşê li ser xwe pehn dikir.

Di wan gavan de çîrokek ku diya min berê ji min re li ser bavê min digot hat bîra min. Min bavê xwe nas nekiribû û tiştên ku min xweş li ser vî mirovî dizanîbû ew bûn tiştên ku tenê dayê berê behs kiribû. Wî carekê li îdamkirina kuşdarekî temaşe kiribû. Hîna ew neçûbû wek nexweşan lê hatibû û gava vegeriyabû, ew di danê wê sibehê de gelek caran vereşiyabû. Dilê min hinekî ji bavê min ji ber wê vereşandinê li hev diket, lê anuha, ez fêm dikim ku ew vereşandin tiştekî gelekî xwezayî bû. Ez nizanim çawa berê min nedidît ku ji kuştina mirovekî mezintir tunebû û ku bi awakî tenê ew kuştin di bin stûna asmanan de tiştekî birûmet bû. Eger ez ji vê zindanê derketama, min ê li hemû hukmên îdamê temaşe bikira. Lêbelê ez bawer im ku min şaşîtiyek dikir dema min ev îhtimala hanê datanî ber çavên xwe. Dema min di serê xwe de xwe di destê sibehek zû de xwe li pişt rêza pasebanan mîna temaşevanekî azad didît, erê mîna temaşegerekî ku hatibû û piştre jî belkî dilê wî li hev biketa û vereşiya, dilê min wê gavê ji kêfek jehrînî dihat ji sînga min derketa. Lê mirov helbet nikare herdem li ciyê xwe giran rûnê. Min şaşîtiyek mezin dikir dema min ew îhtîmal di serê xwe de çêdikirin ji ber ku piştî wê xweşiya ku xwe berdida nava min sermake bêsînor xurt xwe li canê min dipêçand û bê ku min bikarîbûya tiştek bikira dibû qirçeqirça diranên min.

Mirov nikare herdem biaqilî li tiştan binere. Wek nimûne, min di wê zindanê de carinan di serê xwe de qanûn û destûrine nû derdixistin. Min cezeyên tawanbaran diguherandin. Min bala xwe dabûyê ku dema min ew destûrên nû çêdikirin, tiştê herî giring di serê min de ew bû ku min herdem ji yê mehkûm re keysek, rêyek xelasiyê bihişta. Eger ew keysa xelasbûnê yek li ser hezarî jî bûya, wê yekê rêya xwe didît û dawiyek xweş dida bûyeran. Wilo jî, min bawer dikir ku mirovan ji bo kuştinê dikarîbûn şirûbeke ji dermanên kîmawî çêbikirana. Ew şirûba hanê wê neh caran li ser dehan mirin bi xwe re ji yê nexweş re bianiya (erê min di serê xwe de di şûna yê mehkûm de digot mirovê nexweş). Mercê vexwarina wê avê jî ew bû ku nexweşê ku ew bi ser gewriya xwe de dikir gerek herdem bizanîbûya ku ew şansê filitandinê li ber wî hebû. Dema min bi seriyekî rehet bala xwe dida karê wê mekîna gerdenbirr, min tê de kêmasî didîtin. Devê wî satorî bi qeysî qirşikekî rêya xelasiyê ji yê mehkûm re nedihişt. Dema biryarnameya kuştinê di derheqa miroveki de dihat standin, ew gotina hanê dibû qeder û gerek ew mirov bimiraya. Ji bilî wê mirinê tu çareyên din di rûyê yê nexweş de nediman. Wî satorî xweş karê xwe dizanîbû û eger rojekê biqewimiya û bi awakî gelekî dûrî aqilan wî satorî bi cara pêşîn serî nebirriya, ji xwe cara dudyan û sisyan û hezarî herdem li ber wî hebû. Wilo jî tiştê ken û giriyê mirov pê tê ew bû ku yê mehkûm ji asmanan dixwest û lava dikir ku tiştek bi wî satorî nehata. Erê kêmasiyên vê mekîna gerdenbirr hebûn lê ji aliyekî din, ez bêgav bûm di serê xwe de bêjim ku bi rastî hemû raz û xurtbûna sazgehekê di karê wî satorî de bû. Wê biryarnameya dadgehê û wê mekîna mirinê tu rêyên felatê li ber yê mehkûm nedihiştin. Bi kurtî, yê mehkûm ji bêgaviyê êdî alîkarî dikir ta ku ew bê serêş û teşqele bihata kuştin. Ew ji xêra wî bû ku tiştek di rûyê biryarnameya kuştina wî de derneketa û tiştek bi wê mekînê nehata.

Ez bêgav jî bûm bibînim ku ta wê gavê nêrînên min li ser van pirsan dûrî rastiyê bûn. Bêyî ku min bizanîbûya çima min demeke pir

dirêj bawer kir ku mirov dema ber bi guillotînê(destgeha serbirrînê) diçû, gerek bû ew bi textbendekê hilkişiya, çend pelikan ji ser erdê bilind bibûya. Ez bawer dikim ew sûretê hanê di serê min de ji ber şoreşa 1789an çêbûbû, ez dixwazim bêjim ji ber tiştên ku li ser vê destgeha îdamê ji min re berê hatibûn gotin an nîşanî min hatibûn kirin. Lê sibehekê hat bîra min ku carekê rojnameyekê li ser gerdenbirrîneke ku pir deng dabû nivîsîbû û wê rojnamê sûretê destgeha gerdenbirrînê jî li ser rûyê pelên xwe xistibû. Destgeh li ser erda rast bû û bi qasî buhistekê jî çiye ew ji rûyê erdê ne bilindtir bû. Min bawer jî dikir ku destgeh ji wilo firehtir bû lê bi rastî ew tengik bû. Min nizanîbû çawa berê van tiştan bala min nekişandibûn û çawa ez bi ser wan rastiyan ve nebûbûm. Destgeha li ser pelê rojnamê gelekî bala min kişandibû ji ber ku ew pir bi hosteyî hatibû sazkirin. Ew wek saeteke şewqdar bi zanebûneke mezin hatibû çêkirin. Lê wilo ye, dema mirov tiştekî xweş nas nake, ew herdem wî tiştî di serê xwe de pir mezin dike û baskan jê re çêdike. Gava ez di wê rojnamê de çav li wî sûretî ketim, ez bêgav bûm bibînim ku tişt gelekî sade bûn û bi rastî mirovê ber bi wê destgehê diçû ew wek ku ber bi miroveki din diçû û yek ji yekî ne bilintir bû. Lê gava min ev rastî bi çavên serê xwe dît, ez dikarim bêjim ku ez bi wê rastiyê aciz bûm. Mirov herdem dixwaze di serê xwe de tiştan mezin bike û ciyekî bilind bide wê gerdenbirrînê, mirov dixwaze çend gavan ber bi asmanên bilind hilkişe. Lê ne gav û ne jî çara xelasê li ber yê tawankar hebûn û vê carê jî destgeha mirinê bi giraniya xwe her tişt di bin xwe de diperçiqand: yê mehkûm bi bêdengî, bi hinek şermezarî û bi gelek diqet dihat kuştin.

Ez hergav bi du tiştên din jî diramiyam: yek şefeq bû û yê din daxwaziya min ya bexşînê bû. Ez bi wan diramiyan li gel ku min ji xwe re digot ku baştir bû ku min ew ji bîra xwe bavêtana. Min xwe li ser piştê radimidand û li asmanan dinêrî. Min zor li xwe dikir û hemû bala xwe dida wî asmanî. Asman kesk dibû û êvar diket. Min bêtir zor li xwe dikir ta ku ez bi tiştine din bifikiryama. Min guhdarî

lêdana dilê xwe dikir û min nizanîbû çawa min ê bawer bikira ku ew dengê ku ji roja roj de ji min qut nebûbû ê bikarîbûya rojekê bi gihiştî rawestibûya. Ez bi rastî ne xwediyê xeyalek wilo xurt im lê dîsa jî min zor li xwe dikir û min dixwest ew kêlîka hanê bidîta, ew kêlîka ku wê lêdanê ê nema ta qehfê serê min dirêj bûbûya. Lê ez çi bêjim, hemû tevgerên min pûç derdiketin û fikra şefeqê û daxwaziya min ya lêbuhurînê herdem ji serê min dernediketin. Wilo jî dawiya dawî, min ji xwe re digot ku ya baş ew bû ku min bi derewan zor li xwe nekiribûya.

Ew di şefeqê de bi derketina rojê re dihatin, min ev yek dizanîbû. Bi kurtî, min şevê gişî xwe li bendî wê şefeqê ragirt. Min tu carî hez nekiriyê ku tişt ji xafil bi ser min de bên. Dema tiştek ji bo min diqewime, ez dixwazim ji bo wî tiştî amade û haydar bim. Wilo jî dawiya dawî xew di şevan de nema bi çavên min bû û tenê ez bi rojê hinekî ji xwe re radizam. Di wan şevên dirêj de, ez bi bêhnek fireh li bendî çêbûna ronahiyê li ser cama asmanan mam. Tiştê herî zehmet ew saeta bi dû û gumanan bû, ew saeta ku min dizanîbû ku ew tê de herdem derdiketin û bi karên xwe radibûn. Ji nîvê şevê û vir de ez bendewar dimam û min bi haydarî guhdarî dikir. Guhên min berê tu carî wilo li dengan negeriyabûn û tu carî jî berê min wilqase dengên wilo hûr nekiribû. Ez dikarim bêjim ku bi awakî di hemû wê demê de şansê min hebû ji ber ku tu dengên payan negihaştin min. Dayê gelek caran digot ku mirov tu carî nikare bêje ku ew ji sedî sed perîşan û reben e. Dema rengê asmanan dihat guhertin û ronahiya rojek nû derbasî hundirê selûla min dibû, min gotina dayê rast didît. Erê, ez ne bi giştî bêoxir bûm ji ber ku ne pir dûr bû ku carekê di wan şevan de min dengên payinan bikira û wilo jî ji tirsa dilê min di sînga min de ê belav bûbûya. Dema dengekî biçûk li ber guhên min diket, min bi lez berê xwe dida derî û guhê xwe bi textê wî diçespand. Min dengê her tiştî dikir, ta dengê berdan û girtina hilma xwe û ez pir jî ditirsiyam dema ew dengê ji sînga min derdiket dibû mîna nalîna sehekî. Lêbelê eger bê ya dawî, ez ne wiqasî

bedbext bûm ji ber ku ne dilê min di sînga min de belav dibû û her carê jî, bîst û çar saetên din li jiyana min zêde dibûn.

Karê min di şevan de ev bû. Bi roj, ez bi daxwaziya xwe ya bexşînê xerîk dibûm. Ez bawer dikim ku ji vê yekê jî min tiştê herî hêja derxist. Min di serê xwe de hesabên xwe çêdikirin û hêjatirînên beşan ji fikir û ramanên xwe berhev dikirin. Min herdem gumana herî kambax datanî ber çavên xwe, min ji xwe re digot ku daxwaza min î bexşînê hatibû avêtin. "Baş e, wilo jî, ez ê bimirim." Eşkere bû ku ez ê wilo berî kesine din bimirama. Lê her kes dizane ku ev dunya hanê ne hêja ye ku mirov ji bo wê bijî. Min di nava xwe de baş dizanîbû ku ew ne tiştêkî wilo pir girîng bû eger mirov sîsalî an heftêsalî bimira, ji ber ku di herdu mirinan de gelek mêr û jinên din ê bijiyana û ev yek ê wilo bi hezarên salan jî berdewam bikira. Bi kurtbirrî, şik li vê yekê nedibû. Mirin her mirin bû çi ez anuha bimirama çi piştî bîst salên din. Lêbelê dema min tişt wilo di serê xwe de çêdikirin, ez hinekî aciz dibûm ji ber ku gava min mirina xwe piştî bîst salên din didît, dilê min di sînga min de bi hêrs bilind dibû û dihat derketa. Ta min ew coşa hinava xwe haş bikira, min xwe piştî wan bîst salan didît û car din pirsa mirinê ji xwe dikir. Eger dawiya mirovan li ser rûyê erdê herdem mirin be, berbiçav bû ku saet û şiklê mirinê dibûn pirseke pir biçûk. Wilo jî ( û gerek min ev "wilo jî" ji ber çavên xwe winda nekiribûya) wilo jî, eger daxwaza min ya lêbuhurînê bihata avêtin, ji xwe gerek min ev yek qebûl bikira.

Gava min mirina xwe qebûl dikir, tenê wê gavê min dikarîbû bigota ku mafê min hebû ku min gumana duduyan jî di serê xwe de çêbikira. Min ji xwe re li hev dianî û digot ku bexşîn ji min re hatibû. Dema min çareya duduyan dida ber rûyê xwe û xwe azad didît, coşa xwîn û laşê min kêfxweşiyek pir mezin ber bi çavên min dajotin û ew dişewitandin. Tiştê nexweş wê gavê ew bû ku gerek min bi gema wê dilpekîniyê, wê kêxweşiyê bigirta, gerek min ew dengê jînê di nava xwe de legem û haş bikira. Dema min çareya dudyan li ber xwe didît, gerek bû ku ez wek xwe bimama ta ku min qebûlki-

rina mirina xwe, di îhtîmala yekemîn de mumkintir bidîta. Dema ez bi ser diketim, min saetek bêhnfirehî ji xwe re peyda dikir û ew bi ser ketin, ew saeta aramiyê ne tiştekî hindik bû.

Di bêhnikeke wilo de keşê rêber xwest carek din bihata serlêdana min û min wê carê jî got na. Min xwe dirêj kiribû û ji regnê asamanê ku bi ser boze ve diçû, nas kir ku êvar nêzîk bûbû. Min di serê xwe de wê gavê digot ku daxwaza min ya bexşînê hatibû avêtin û xwîna min hêdîka, bê helkehelk, di laşê min de digeriya. Min ê çi bikira ji hatina keşe? Ew cara pêşîn bû piştî demeke dirêj ku Marie dihat bîra min. Ji demeke dirêj ve namên wê nedihatin. Wê êvara hanê, min ji xwe re got ku belkî wê nema dixwest xwe bêtir dostika mirovekî bi gerdenbirrînê hukmkirî bidîta. Min ji xwe re jî got ku belkî ew nexweş bû an jî miribû. Ew tiştên hanê ne pir dûrî aqilan bûn. Ma min ê çawa bizanîbûya çi bi serê wê hatibû ger ji bilî wan herdu gewdeyên me ên anuha ji hev veqetiyayî tu pêwendiyine din me bi hev re girênedidan, tu dengên din em nêzîkî hev nedikirin. Ji wê gavê û pê de, min bi rastî nema guh li Marie kir û nema bêriya wê kir. Piştî mirina xwe, Marie nema ji bo min tiştek bû. Min didît ku ew tiştekî xwezayî bû ku min piştî mirina wê ew ji bîr bikira, wek ku di eynî wextê de, min xwezayî jî didît ku piştî mirina min dost û nasan ê ez ji bîr bikirama. Mirinê tu pêwendî di navbera zindewar û miriyan de nedihişt û piştî mirina çima karê zindewaran ê bi min bimaya? Gava min bi wî awayî li tiştan dinêrî, min nikarîbû bigota ku ew fikra hanê bi min zehmet an nexweş bû. Mirov dawiya dawî bi rastî hînî her fikrê dibe û nema xema min bû.

Min wilo ji xwe re digot gava keşê rêber buhurî hundir. Dema ez çav li wî ketim, ez hinekî di cihê xwe de lerziyam. Wî ew yek dît û ji min re got metirse. Min jê re got ku li gor adetê gerek ew di wexteke din de bihata. Wî li min vegerand ku serlêdana wî ya hevaltî û xêrxwaziyê bû û got Xwedêgiravî hayê wî yekcar jê tunebû ku min nedixwest ew bihata dîtina min. Ew ne ji ber wê yekê hatibû û li ser ciyê min rûnişt û xwest ez li kêleka wî rûniştama. Min bi ya wî ne-

kir, tevî ku min li ser rûyê wî nîşanên dilnazikbûyînê dît.

Wî bazbendên destên xwe danî ser ejnûyên xwe, serê xwe xist ber xwe û li destên xwe nêrî. Ew demeke dirêj wilo ma û min bala xwe dayê ku herdu destên wî hem nazik û hem xurt bûn û wan destan ji min re mîna du lawirên çalak û lewend xuya kirin. Wî hêdîka ew di ser hev re dibirin. Paşê wî serê xwe xist ber xwe û ew demeke pir dirêj ma. Min bîstikekê bawer kir ku min hebûna wî li wê derê ji bîr kiribû lê wî ji nişkê ve serê xwe rakir, rûyê xwe ber bi rûyê min ve kir û got: "çima, çima te nedixwest min bibînî?" Min lê vegerand çunki baweriya min bi Xwedê nedihat. Wî pirsî çawa min dikarîbû bigota ku ez ji wê yekê ji sedî sed serrast bûm û min vegerand ku min ji binî ew pirs ji xwe nedikir ji ber ku hebûn an nebûna Xwedê ji bo min tiştekî vala bû, pirsek bêrûmet bû. Wî wê gavê defa sînga xwe rast kir, pişta xwe da dîwêr, herdu destên xwe vekirin û danîn ser rahnên xwe. Wek ku wî ji yekî din re û ne ji min re behs bikira wî rave kir ku gelek caran mirov dikare bawer bike ku ew ji tiştekî pir bawer e lê bi rastî ew baweriya hanê ne wiqasî xurt e. Min tiştek lê venegerand. Wî li min nêrî û pirsî: "Ma ne wilo ye?" Min lê vegerand ku ew yek mumkin bû lêbelê eger ez ne bi temamî bawer bûma ji tiştên ku bala min dikişandin, min xweş dizanîbû çi bala min nedikişand. Pirsa wî ji min dikir yek bû ji wan pirsên ku bala min nedikişandin û min serê xwe bi wê tu carî nediêşand.

Wî awirên xwe ji rûyê min birrîn û, bê ku hawê rûniştina xwe biguheranda, ji min re got ku belkî min ew gotin dikirin çunkî min xwe bêhêvî didît. Min jê re rave kir ku ne rast bû û ku min xwe winda û bêhêvî nedidît. Ez tenê ditirsiyam û ew tirsa min helbet di cihê xwe de bû. Wî got: "Xwedê wê alîkariya te bike. Min gelek kesên di rewşa te de dîtin û wan gişan berê xwe ber bi wî ve dikirin." Min vegerand ku mafên wan kesan hebû ew tişt bikirana û vê yekê jî nîşan dida ku bi kêmanî wextê wan ji bo Xwedê hebû, ne yê min. Min bi xwe alîkariya tu kesî nedixwest û bi ser de jî, wextê min pir kêm bû. Wî tiştî bala min nedikişand û min nedixwest wextê xwe yê

mayî bi derewa winda bikira.

Wê gavê ji liva destên wî min nas kir ku keşe di nava xwe de hinekî bêhnteng dibû. Lê wî bersînga xwe rast kir, destê xwe di ser kirasê xwe re bir û qermîçokên wî rast kir. Paşê wî di nav gotinan de ji min re got: "hevalê min". Wî wilo bang min kir, ne ji ber ku biryarnameya gerdenbirrîne di derheqa min de derketitû lê çi ye ne çi ye ji ber ku ew hukmê mirinê li ser eniya me gişan hatibû nivisîn. Min wê gavê gotina wî birrî û got ku dawiya me herduyan ne wekhev bû û hebûna mirinê li pêşiya me giştan nikarîbû di ber dilê min de bida. Wî heq da min û gotina xwe berdomand: "Belê rast e, lê eger tu di demeke nêzîk de nemirî tê derengtir bimirî. Kesek nikare ji ber mirinê bireve. Ma tu vê dawiya pir dijwar çawa dibînî?" Min lê vegerand ku mirin çi anuha çi paşê ew bi xwe ji bo min tiştekî wekhev bû, ew tiştekî bêrûmet bû.

Bi gotinên min keşe ji ciyê xwe pekiya û çavên xwe zuq xistin çavên min. Min bi wê lîstikê xweş dizanîbû. Min bi Emmanuel an bi Céleste re dilîst û bi awakî giştî min zora wan gişan dibir û dihişt ku wan awirên xwe biqurmiçandana. Min di cîh de nas kir ku keşe jî xweş bi wê lîstikê dizanîbû ji ber ku awir û mijankên wî nediliviyan. Wî çavên xwe xist çavên min û got: "Na xwe wilo tu bêhêvî dijî û bawer dikî ku piştî mirinê tu jiyanên din li peşiya mirovan tunene?" Min vegerand û got: "Erê".

Wê gavê wî serê xwe xwar kir, awirên xwe birrîn û dîsa rûnişt. Wî ji min re got ku gunehê wî bi min dihat. Wî got ku wî nizanîbû çawa bawer bikira ku mirovekî dikarîbû wilo bifikiriya. Lê eger wî dizanîbû an nizanîbû ev ne karê min bû û min tenê dizanîbû ku wî dest pê kiribû bêhna min teng dikir. Min jî awirên xwe ji wî şikendandin, berê xwe da paceya odê û milê xwe da dîwêr. Min xweş lê guhdarî nekir dema wî dest bi pirsên xwe kir, lê çunki dengê wî wilo melûl û lerzdar bûbû, min çêtir li wî guhdarî kir.

Wî xweş dizanîbû ku daxwaza min ya bexşînê ê bihata qebûl kirin, lêbelê barê gunehiyê li ser milên min herdem pir giran dima û

gerek min xwe jê pak bikira. Di dîtina wî de, dadmendiya mirovan ne tiştek bû, tenê ya Xwedê her tişt bû. Min bala xwe dayê ku ew cara yekemîn bû wî ez tawanbar kiribûm. Wî got ku ceza ku dadgeha mirovan di derheqa min de birrîbû nikarîbû gunehê min bişûşta. Min lê vegerand ku min nizanîbû guneh çi bû û ez li gor biryara dadgehê diçûm: ez tenê tawanbarek bûm û min ceza xwe xwaribû. Min deynê wê tawankariyê dida û qebûl nedikir tiştekî din ji min bihata xwestin. Ew bi bersiva min dîsa rabû ser xwe lê di wê selûla teng de ew ê bi kuderê biçûya? Wî tenê dikarîbû rabûya an rûnişta.

Min awirên xwe berdabûn ber xwe û zuq li erdê dinêrî. Wî tenê gavek ber bi min avêt û, weke ku nediwêrîbû nêzîktir bibûya, ew piştî wê gavê di ciyê xwe de rawestiya. Wî di nav sîşên pencereyê re li asmanan dinêrî û got: “ Tu şaş î lawê min dema tu bawer dikî ku tiştekî din ji te nayê xwestin. Ev tişt wê belkî ji te bê xwestin.” Min di cî de lê vegerand: “Ma çi wê ji min bê xwestin?” “Wê ji te bê xwestin ku tu bibînî.” “ Ma ez ê çi bibînim?”

Keşe li hawirdora xwe nêrî û berdomand. Min wê gavê bala xwe dayê ku dengê wî qels bûbû, te digot westiyayî bû: “Êş ji van hemû keviran tê xwarê, ez vê yekê xweş dizanim. Gava ez li van keviran dinerim, dilê min herdem teng û tije tirs dibe. Lê ez dizanim ku ta yê herî bêoxir jî di nav we de gava ji dilê dil dinêre, ew dibîne ku ji vê tarîtiyê rûyekî asmanî derdikeve. Wê ji te bê xwestin ku tu li vî rûyî binerî.”

Ez wê gavê hinekî germ bûm. Min got ku min bi mehan li kevirên wan dîwaran nêrîbû û pir xweş dizanîbû ku di wan de ne tişt û ne kes hebûn. Min belkî demeke dirêj berê li wan nêrîbû û di nava wan de ez li rûykî geriyabûm. Lêbelê ew rûyê ku ez lê digeriyam di rengê roka asmanan, di rengê agirê daxwaziyê de bû. Ew rûyê ku ez bêçare lê geriyabûm rûyê Marie bû û anuha ez ji wê gerê westiyabûm. Min nêrîbû lê nedîtibû tiştek ji xwêdana wan keviran pejiqî bû.

Keşe bi xemgînî li min mêze kir. Min anuha hemû pişta xwe da-

bû dîwêr û rohniya rokê di ser eniya min re dişemitî. Wî tiştine gotin lê ew tişt negihaştin guhên min. Wî bi lez û coşecan ji min xwest ka wî dikarîbû ez maç bikirama. Min got: "Na". Wê gavê ew zîvirî û ber bi dîwar ve çû. Wî bi giranî destê xwe di ser wî dîwarî re bir û di ber xwe de bi dengekî nizim ji min pirsî: "Na xwe tu wiqasî ji vê axa hanê hez dikî?" Min dengê xwe nekir.

Wî pişta xwe bi min ve kir û demeke dirêj wilo bêdeng ma. Hebûna wî li bal min bêhna min teng dikir. Min ê jê bixwesta ku wî dev ji min berdaya bi rêya xwe de biçûya dema wî ji nişkê ve berê xwe bi min ve kir û bi dengekî bilind got: " Na, ez ji te bawer nakim. Ez xweş bawer im ku te di temenê xwe de carinan di dilê xwe de xwestiye ku piştî vê jiyanê jiyaneke din hebe." Min lê vegerand ku ew yek helbet rast bû, lê min ew tişt dixwest wek ku min gelek tiştên din jî dixwestin. Wek nimûne, min dixwest ku ez têr û dewletmend bûma, bi avjeniyê bezatir bûma, min dixwest ku devê min bi awakî bêtir lihevhatî bûya. Erê xwestina jiyaneke din û van hemû tiştên din ji bo min wekhev bûn. Lê wî nehişt ku min bidomanda û pirsî ka min ew jiyana din çawa didît. Min bi qîrîn wê gavê lê vegerand: "Ew jiyaneke ku ez di wê de vê jiyana hanê bi bîra xwe tînim." Min jê re jî got ku bes bû, min nema dixwest lê guhdarî bikira. Wî dixwest hêna ji min re behsa Xwedê bikira lê ez nêzîkî wî bûm û min xwest ji bo cara dawîn ew liberxista ku wextê min pir hindik bû û min nedixwest ew wextê hanê bi Xwedêmedê re winda bikira. Wî wê gavê xwest şêweya axiftinê biguherîne û ji min pirsî çima min jê re digot "Monsieur, axa" û ne "Bavê min". Vê yekê bêhna min teng kir û min lê vegerand ku ew belkî bavê kesên din bû lê ne yê min bû.

– Na lawê min, wî got û destê xwe danî ser milê min. Tu ji ber korbûna dilê xwe nizanî ku ez bi te re me. Ez bi te re me û ez ê ji bo te dua bikim.

Ez nizanim wê gavê çi bi min hat lê wek ku tiştek di nava min de biteqiya dunya li ber çavên min sor bû. Min dest pê kir ta ku ji min

hat bi qîrîn hemû gotinên pîs jê re kirin. Min got ku şewat çêtir bû ji windabûnê. Min bi situkra cuba wî girtibû û hemû qehra nava min wek pêlan bi kêfxweşî ji hinava min pijiqîn û dilê min hênik kir. Baş bû, ma ne wî wilo dixwest ji min re diyar bikira ku ew ji baweriyên xwe gelekî serrast bû? Lê hemû baweriyên wî nehêjabûn mûyekî ji serê jinekê. Wî bi ser de jî nikarîbû bigota ku ew bi rastî mirovekî zende bû ji ber ku jiyana wî wek ya miriyekî di gorê de ramidandî bû. Erê, ji wî werê ku ez destvala bûm û ji tiştekî ne serrast bûm. Lê ev ne rast bû. Ez ji xwe û ji her tiştî serrast û bawer bûm û baweriya min ji ya wî bi sed taqî bêtir dihat bi wê jiyana ku ez dijiyam û bi wê mirina ku di demeke nêzîk de ê bihata. Ev rastiya hanê ya min bû û eger ew ne tiştekî wilo pir mezin bûya jî lê xwîna min û wê bûbûn yek. Min berê rast gotibû û hêna jî û herdem min rast digot. Min jiyana xwe bi awakî derbas kiribû wek ku dibû ku min ew bi awakî din derbas bikira. Min ev yek kiribû û ne ya din. Min ew tiştê hanê nekiribû lê di şûnê de ev tiştê din û paşê çima na? Rastî di kêlikekê de, di şefeqa rojekê de ê bi gewde û berbiçav bûbûya wek ku min di hemû salên jiyana xwe de min xwe li bendî wê kêlîkê, wê şefeqê ragirtibû. Di hemû jiyana xwe de min tu carî bi rastî rûmeteke wilo mezin nedabû tutişî û min dizanîbû çima. Wî bi xwe jî dizanîbû çima. Ji kezeba salên li ber min, ji dawiya rojên min herdem ber bi min ve bayek nediyar dihat û wî bayî di meh û salên jiyana min ya pûç û bêmane de her tiştên ji min re diqewimîn li ber çavên min wekhev û şayik dikirin. Wî bayî, wê hilmê nedihişt ku min rûmeteke zêde bida tiştekî ji wan tiştên ku ji min dihatin xwestin û min nikarîbû bigota ku salên min yên buhurî rastir bûn ji wan salên min ên ku hêna li pêşiya min bûn. Ma çi rûmeta mirina kesên din, hezkirina dayikekê, çi rûmeta xwedayê wî, jiyanên ku mirov ji xwe re dixwazin, qederên ku mirov ji xwe re heldibijêrin ji bo min hebûn? Erê çi rûmeta van tiştan ji bo min hebû eger ji roja roj de qederekê min wek milyarên kesên din ku wî keşeyî bang wan dikir "birayên min" helbijartibû? Çi rûmeta van tiştan gişan hebû eger

tenê dawiyek li pêşiya min bû? Ma ew di vê yekê digihaşt, ma ew di vê yekê digihaşt? Herkes hatibû bijartin û mirovên ne bijarte li ser rûyê erdê tunebûn. Ên din jî rojekê ê bihatana tawanbar û hukumkirin. Ew ê bi xwe jî bihata hukumkirin û wilo jî wê çi rûmeta wê yekê hebûya eger wî mirovek bikûşta û paşê bihata ceza kirin bi rastî ne bi vê kuştinê lê ji ber ku roja veşartina diya xwe ew negiriyabû? Rûmeta kuçikê Salamano ne kêmî rûmeta jina wî bû. Ew jinika wek mekînakê diliviya tawanbar bû, jina Masson ya parîsî jî tawanbar bû û wê Mariya ku dixwest min ew bianiya jî tawanbar bû. Celeste ji Raymond çêtir bû lê çi rûmeta wê yekê hebû eger Raymond jî bûbûya hevalê min? çi rûmeta wê yekî jî ê ji bo min hebûya eger îro Marie devê xwe bida mirovekî din, eger wê lêvên xwe dirêjî lêvên Meursaultekî din bikira? Ma vî mehkûmê hanê nas dikir ku ji dawiya temenê min, ji kezeba musteqbek û ayendeya min... û ez wilo bi ser de diqîriyam û bêhna min diçikiya. Min hêna gotinên xwe ji keşe re temam nekiribûn dema dergevanan ew ji nav lepên min derxistin û xwe rakişandine min. Lê keşe ew haş kirin û paşê bêdeng demekê li min nêrî. Min bala xwe dayê çavên wî mişt hêsir bûbûn. Wî serê xwe xwar kir û ji ber çavên min ket.

Dema ew derket bêhna min dîsa hate ber min. Ez pir westiyabûm û min xwe avêt ser textê xwe. Ez bawer dikim ez di xew re çûm ji ber ku dema ez şiyar bûm, stêrikan asmanê ber rûyê min dagirtibûn. Dengên hawîrdorên gundan ber min ve hildikişiyan. Bêhna şevê, bêhna erdê û xwê cênîkên min hênik dikirin. Aşitiya dilnişîn ya vê havîna di xew de mîna ava deryayekê bilind dibû û derbasî hinava min dibû. Di wê gavê de û di tixûbên şevê de dengê keştiyan gihaştine min, wan kirin tûtîn. Ew sûtîn û tûtînên hanê nîşanên çûyînên gemiyan ber bi dunyayeke din bûn, dunyayeke ku ji binî ve min anuha nema guh lê dikir. Dayê ji bo cara pêşîn piştî demeke pir dirêj hate bîra min. Min bawer kir ku min dizanîbû çima dawî emir wê ji xwe re "dergîstiyek" dîtibû, çima wê xwestibû ji nû ve dest bi jiyanê bikira. Li wê derê jî, li hawîrdora wê wargeha ku jiyan lê ve-

dimirîn, li wê derê jî êvar mîna bêhnikekê ji aşîtiyek xemgîn bû. Wilo nêzîkî mirinê, dayê bêguman xwe azad û amade didît ta ku her tişt ji nû ve bikira û bijiya. Mafê kesekî, mafê tu kesî tunebû li ser wê bigiriya. Min jî dît xwe amade dît ta ku ji nû ve min dest bi hertiştî bikira. Wek ku wê qehra mezin hinava min ji napakiyê bişûşta, canê min ji hêviyê vala bikira, min deriyê dilê xwe vekir. Di rûyê wê şeva mişt nîşan û sitêrik de, min deriyê dilê xwe vekir û xwe berda nava sersariya dilovan ya dunyayê. Dema min ew wiqasî nêzîkî xwe, mîna birakî nêzîkî xwe dît, min dît ku berê ez mirovekî bextewer bûm û min xwe hêna bextewer didît. Ta ku tişt nîvco nemana, ta ku min xwe gelekî bi tenha serê xwe nedîta, hêviya min ya dawîn ew bû ku roja gerdenbirrîna min gelek mirov ê bihatana temaşekirinê. Hêviya min ew bû ku gava di roja kuştina min de ew ê çav li min biketana, wan ê bi nifret bikirana qîrîn.

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ❖ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ ◆ **Celadet Bedir-Xan** / Gramer
- ❖ DÊ Û DÊMARÎ ◆ **Egîdê Xudo** / Roman
- ❖ KESKESOR ◆ **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- ❖ DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN ◆ **Rohat** / Lêkolîn
- ❖ HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ ◆ **Mehmed Uzun** / Essay (Ceribandin)
- ❖ MÎRZA MEHEME ◆ **Medenî Ferho** / Roman
- ❖ MILKÊ EVÎNÊ ◆ **Rojen Barnas** / Şiîr
- ❖ BIYANÎ ◆ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Hesên** / Roman
- ❖ ŞEVÊN SPÎ ◆ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ❖ MIŞK Û MIROV ◆ **John Steinbeck** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ❖ BEXÇEYÊ VÎŞNE ◆ **Çexov** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- ❖ LI BENDA GODOT ◆ **Samuel Beckett** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- ❖ GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforisma
- ❖ GIRTÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok
- ❖ KEVOKA SPÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok